# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

NRLS

NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

KOVAREKE DEMSALÎ JI NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK TÊ DERXISTIN HEJMAR 4 ZIVISTANA 2021-2022



- BÎRDOZIYA ŞER LI CEM KURDAN
- DÎROKA TEVGERA SIYASÎ YA KURDÎ LI SÛRIYA
- RIKBERIYA SÛRIYEYÊ
- KOÇBERIYA PÊKHATE Û NETEWEYAN BER BI REQAYÊ VE
- SIYASETA BEREVANIYÊ YA RIKBERIYA ISLAMÎ YA SÛRIYÊ
- KOMARA ISLAMÎ YA ÎRAN

KOVAREK DEMSALÎ JI NAENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATÊJÎK VE TÊ DERXISTIN - HEJMAR 4 ZIVISTAN 2021

Sernivîser: **Ednan Mistefa**

Edîtorê nivîserê: **Taha Xelîl**

Desteya nivîser:

**Hejar Şakir - Rakan Şêxî**

Nexşedan: **Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastiye**

**Hejmara (4 ) Zivistana – 2021-2022**

## NAVEROK


**Bîrdoziya Şer Li Cem Kurdan ............................................................ 6**

**Dîroka tevgera siyasî ya kurdî li Sûriya................................................ 17**

**Rikberiya Sûriyeyê ........................................................................ 31**

**Koçberiya pêkhate û neteweyan ber bi Reqayê ve ............................... 63**

Mihemed Elizo: Rêveberê muzexaneya Niştimanî li Reqayê.............................

**Siyaseta Berevaniyê Ya Rikberiya Islamî Ya Sûriyê................................ 69**

**Komara islamî ya Îranî.................................................................... 89**

## Gotina hejmarê

Ev jimara em pêşkêş dikin, bi berdewamiya mijara "Bîrdoziya Şer li cem Kurdan" dest pê dikin, di vê beşê de bingeha şer, karîger, hêmanên bîrdoziyê şer li cem Kurdan dê werin ziman.

Mijara duyem jî beşa çarem û ya dawî ya "Dîroka tevgera siyasî ya kurdî li Sûriya", di vê beşê de rêxistinên siyasî yên kurdî li Rojavayî Kurdistanê û encama lêkolînê radixe ber çav.

Di nivîsara "Rikberiya Sûriyê" de, mijarên rewşa siyasî û leşkerî, rola di berdewamiya aloziya Sûriyê de û sibroja rikberiya Sûriyê; digire dest.

Mijarên weke rewşa Reqayê di dema Osmaniyan de û rewşa pêkhateyên Reqayê yên lê niştecihbûne di nivîsara bi navê "Koçberiya pêkhate û neteweyan ber bi Reqayê ve" têne ziman.

Di nivîsara pêncan a bi navê "Siyaseta Berevaniyê Ya  Rikberiya Islamî Ya Sûriyê" de, têgeha siyaseta bervaniyê, bingeha rêxistinî û yên siyaseta berevaniyê û nêzîkatiyên beşên rikberiya Islamî li ser rewşa derve û ya nevxweyî, lêkolîn dike.

Di nivîsara dawî de "Komara Islamî Ya Îranî", bi gelek beşan werin weşandin, di vê beûê de mijarên girêdayî erdnîgarî û dîroka Îranê, şoreşa Îranê, wîlayetûlfeqîh, siyaseta Îranê û doseya wê ya navokî têne pêşkêşkirin.

**Sernivîser**

# Bîrdoziya Şer Li Cem Kurdan

## (B 2)

### Duyem – bîrdoziya şer li cem bav û kalên kurdan - kurtî

- **Bingeha şerê kurdan.**

Piraniya çavkanî û lêvegerên ku lêkolînerên payabilind ên ku bi dîroka kurdan re eleqedar in, diyar dikin ku kurd niştecihên resen yên rojhilat û bakurê Hîlala Berhemdar in û wan weke gelê şervan wesif dikin, heta navê Horî ku yek ji bav û kalên wan in ji peyva (Xuredî) ku tê wateya leşkerê şiyar hatiye. Dibe ku sedema vê yekê jî cihê jeopolîtîk û stratejîk ê welatê wan be, ku bala bi dehan dagirkerên çavbirçî û dizên çand û gencîneyan kişandiye û hê jî dikişîne ser xwe. Xuya ye ku erdnîgariya leşkerî ya Kurdistanê, ku ji deşt, çiya û çeman pêk tê, di vê çarçoveyê de xwedî roleke stratejîk e. Ev yek bandor li ser bîrdoziya şer li cem bav û kalên Kurdan kir, ku di serî de li ser bingeha parastinê bû, û tê de çiya weke kelehên xwezayî cihekî stratejîk girtibûn, bi taybet ji ber ku çiya ji bo Kurdan xwedî semboleke pîroz in, wek mînak, Avesta diyar dike ku çiya di heman dema êrîşa xwedayê xerabiyê Ehrîman li ser rûyê erdê de çêbûne û gelê Kurdistanê gelek caran ji ber êrîşên dijminan û dagîrkeriya biyaniyan, yan jî karesatên xwezayî berê xwe daye çiyayên bilind. Wek mînak dema du artêşên ku ji sedhezaran leşker pêk tên li ser axa Kurdistanê bên ber hev, helbet mêrg, zevî, gund û bajar dê werin talankirin, û dibe ku ev rewş zêdetirî salekê berdewam bike, ji ber wê jî kurd neçar man koçî çiyayan bibin û li aliyê din jî kesên ku li deşt, gund û bajaran mane jî bi êş û azarên mezin re rûbirû mane; Loma jî lêkolînerê dîrokî Minorsky dibêje ku kurd û çiya ji hev nayên veqetandin, ji ber ku hestên azadî û serxwebûnê di nav kurdan de xurt in û ji hêmanên hebûna kurdan in. Dema ku em çavkanîyên curbecur ên dîrokî dişopînin, em dibînin ku pevçûn û şerên ku li ser axa Kurdistanê qewimîne, beşeke girîng a arşîva dîrokî ya Kurdan e.

Şerê çiyan xwedî xwezayeke taybet e, girêdayî xwezaya çiyan bi xwe ye, ku rê û rêbazên şerê xwe ferz dike, ji ber ku qada teng a dîtin û şopandinê ji ber zêdebûna zevî û hinareyên nebatî yên qalind, hin caran, digel hejmareke zêde ya ajalên nêçîrê û jehrî, li ser kurdan ferz kirin ku di cihekî biçûk de bijîn û bi vî awayî neçar man ku hertim sazgeheke leşkerî ya parastinê ava bikin. Her weha general Klawvîts (Clausewitz) di şerê çiyan de destnîşan dike ku divê her kes xwe bispêre xwe; ji ber rêber nikare hemû hêzên xwe kontrol bike, ji ber ku serkêşiya hêzên wî li gorî şert û mercên deştan tiştekî ku ji hêza wî mezintir e, û li Klawvîts xwezaya xakê bandoreke mezin di warê taktîkî de dike û bandorên wê li ser stratejiyê jî xuya dike; ku ew bandorê li ser tevgera leşkerî bi sê taybetmendiyên dike: Ew mîna bendekê li pêş pêşveçûnê ye, taybetmendiyên wê jî dîtinê asteng dikin, û parastina ku li hember bandora çekan peyda dike. Cihên bilind ên erdnîgariyê jî bandoreke mezin li ser hestên mirov dike, ev yek jî bi riya afirandina hestên serkeftin û ewlehiyê li ba kesê ku li jor çiyê dimîne û dijmin li ber lingên xwe dibîne, û li ba kesên ku li jêr çiyê dimînin jî hestên qelsî û xemxweriyê çêdike. Her weha çiya asta parastinê zêdeyî ya êrîşê xurt dike. Li gorî Lêkolîner Mînorsky, xeteriya mayînde ya li ser erdnîgariya Kurdistanê di nav kurdan de cesaret, sivikiya zêde û hişyariya berdewam diafirandiye û bandora xwe li ser serhişkî, hêrsbûn, hestiyarî û tundiya tolhildanê kiriye. Lewra dijminên wan gelek caran xwe spartin xayîntî, qurnazî û xapandinê da ku serokên kurdan bixapînin û wan ji holê rakin.

Li gorî pirtûka pîroz a ola Zerdeştî Avestayê civaka Arî ya ku bav û kalên gelê Kurd beşeke sereke ya wê ne, li ser sê çînên sereke hatine dabeşkirin: çîna kahînan, çîna şervanan û ya cotkaran. Her çînek ji wan jî erkên wê yên taybet ku pîroz in hene, erka çîna şervanan parastin, ewlehî û aramiya welat û axa xwe bû. Lê li aliyê di Lêkoler Mînorsky eşîra kurdan ya îroj li ser du çînan dabeş dike: Ya yekem şervan in, ku serkirde, axa, xwediyên erdan û xizmetkarên wan, cerdevanên gund û mêrgan in, û ya duyem jî cotkar in, ku wek nîv koleyên erdê ne. Lê li aliyê din kurdên medenî xwedî xwezayiyeke civakî taybet bûn.

Wisa xuya ye ku tiştê li jor hatiye şîrove kirin faktora bingehîn ya bîrdoziya şer li cem bav û kalên Kurdan e. Her eşîreke Kurdan herêmên bi

sînorên diyar û li ser wan li lihevkirn e kontrol dikirin. Mîrasa çanda kurdî kêm caran bûye şahidê destanên êrîş û şerên li ser mêrg, zevî û kaniyên avê, dibe ku ev yek ji ber dewlemendiya herêmê be, xwediyê terşan jî bi zêdebûna hejmara terşên wan re, her dem ji bo peydakirina mêrgan hewcedar bûn ku zeviyên xwe berfireh bikin, ji ber vê yekê ew neçar bûn ku bikevin erdên eşîreyên din, û Pirsgirêkên di vî warî de derdiketin jî pir caran bi peymanê dihatin çareser kirin. Gelek caran ev eşîr bi hevdu re dibûn yek û pêkhateyên nû bi şêweya padîşahiyan an mîrnişînan ava dikirin û ji nav wan serokek destnîşan dikirin da ku rêberiya wan bike, ev mînak em di Federasyona Eşîrên Zagros Kutiyan de û piştî wan Hurîyan de dibînin, û piştî nêzîkî hezar salan jî nimûneya Mediyan û piştî wê Kardûk, û hîn jî ev sîstem di serdema nûjen de heye, wek yekgirtina Baban, Bahdînan, Bûtan, Milan, Zîlan, Gharzan û hwd, ku hin ji wan jî beşdarî damezrandina çend mîrnişînên Kurdan bûne, wek Mîrnişînên Erdelan, Hekarî, Bahdînan, Soran û Bûtan, a ku bi berxwedaniya li hember êrîşên eşîrên Turkmen bi her du dûndehên xwe Aq Qoyunlu û Qere Quinlu di çarçoveya armankirina kurdan û dagirkirina xaka wan de, navdar bû. Rola vê yekê di derketina çîna şervana li cem wan yekgirtinan de, digel hêzên sivîl ên bi navê Kara di serdema Medyayê de hebû, û dema ku bi xetereyên mezin re rûbirû dibûn bang li wan dihate kirin. Wisa xuya ye ku ev sîstem bi rêya hêzên Parastina Civakê HPC li Rojava û Hêzên Parastina Cewherî li Bakurê Kurdistanê ji nû ve zindî bûye. Serkirdeyan ji bo parastina berjewendiyên pêkhateyên xwe hewldana serdestî an parastina debasgeh û rêyên karwanên bazirganiyê yên ku dar, maden, kevirên nirxdar, terş (dewar), dexl û hwd, dikirin. Ji ber ku têkçûna dijminan, dabînkirina berjewendiyên milet, zêdekirina dewlemendiya eşîrê û liberxwedana li hember desthilatdariya dagîrkeran, ji bo mîr û serokeşîran dibû sedema rûmta kesane û ji bo vê yekê jî handanek ji bo şer bû, tevî vê yekê jî serkirdeyên kurdan nikarîbûn bibin rêberên stratejî yên miletê kurd. Ji ber vê yekê jî, gelek ramyarên leşkerî yên kurd, sedema nekarîna kurdan di avakirina pêkhateyeke siyasî ya berfireh de, bi nebûna rêberên wan yên stratejîk ve rave dikin.

Bav û kalên gelê Kurd rastî gelek êrîşan ji aliyê piraniya padîşahiyên welatên ku li Rojhilata Navîn ji beriya zayînê bi 3000 sal û vir ve derketine, hatin, piraniya wan êrîşan jî bi awayekî hovane bi armanca dagîrkirina axa

wan, talankirina mal û milkên wan û bindestkirina wan piştî têkbirina şervanên wan, kolekirina wan û ferzkirina bacê li ser wan bi awayekî ku rê li ber her şoreşê bigire, pêk hatin. Lê ev yek nebû asteng ku bav û kalên kurdan her carê rêzên xwe ji nû ve birêxistin bikin û xwe ji bindestiya van padîşahan rizgar bikin, di vî warî de Kutiyan (hevbendiyek ji eşîrên Zagrosan) karîbûn ji Împeratoriya Akadê xwe rizgar bikin, Kasîta (Kaşiyan) û Hûriyan jî karîbûn dewleta Babîlê hilweşînin, serkeftina şoreşa Mediyan (hevbendiyeke ji eşîrên Zagros û Torosê yên Kurdistanî) di rizgarkirina ji dagirkeriya Îskît û Asûriyan de û bidawîkirina Împeratoriya Asûriyan; Ji ber ku sîyaseta zordarî û terorîstî ya padîşahên van welatan nikarîbû gelên kevnar ên Kurdistanê bindest bike, wek mînak, yek ji nivîsan behsa êrîşa padîşahê Aşûrî “Aşûr Nasir Abîlî yê duyamîn” li ser welatê Nêrbo dike yê çiyayê Bradost li başûrê Kurdistanê di nav xwe de digre û dikeve ser sînorê Nînewayê, paytexta Asûriyan, piştî ku neştecihên wî welayî li dijî padîşah serî hildan. **“...Ew nehatin ba min û li ber lingên min çok nexistin û piştî dorpêç û şer û pevçûnan, ez ketim bajêr û 3000 mêr ji şervanên wan di bin şûrê min de bûn û min ji wan dîl, ga û terş (dewar) birin, min gelek dîlgirtên wan şewitandin, min gelek şervan dîl girtin, milên hinan ji wan û destên hinên din jêkirin, poz û guhên wan jêkirin, ji yên din jî organên wan ên ku xuya dikin jêkirin, çavên gelek leşkeran jêkirin, dûvre komek laş û komek serî min çêkirin, serê wan bi darên li derdora bajêr ve daliqandin, nuciwanên (sinêle) ji kurên wan şewitandin, bajar bi erdê ve kir yek, min bajarên welatê Nêrbo wêran kir û dîwarên wan ên bi hêz hilweşandin...".** Wisa xuya ye ku dîrok di serdemên din de jî xwe dubare dike. Jiyanê kurd hîn kiririn e “cîhan para mêrxas û wêrekan e” weke ku lêkolîner Basîl Niktin dibêje. Li li aliyê din lêkolîner Lazarev dibîne ku wêrekiya şervanên Kurd di qadên şer de di pratîkî de ji aliyê hemû împaratorî û dûndanên serdest ên ku Kurd li derdora wan bûn, dibû sedema xwestina wan. Sultan Silêmanê osmanî hêza eşîrên kurdan bi vî awayî vedibêje "...Wan (eşîrên kurdan) li rêzê danîne wek kelehên meydanî ku ji Gurcistanê heta Bexdayê dirêj dibin... dijmin nikare bikeve hundirê Dewleta Îslamî ji ber van kelehan...".

Di dîroka îroj de, malbat weke şaneya herî biçûk a civakî, bûye kevirê bingehîn ê têkiliyên civakî yên kurdan, her malbateke kurd xwe wekî dirêjahiya eşîrên mezin dibîne û bi wan serbilind e, gelek ji wan şêwaza

çanda eşîrtî di hin aliyên jiyana xwe ya civakî de dişopînin. Ji aliyê din ve, dibe ku li bajarekî yan jî çend bajaran, zêdetirî malbatekê ji yek eşîrê bin, lê tê dîtin ku her malbatek taybetmendiya xwe diparêze û dûrî desthilatdariya yek seroktiyê kar û barên xwe birêve dibe. Ev şêwaza civakî ya nû di nav kurdan de (civaka medenî) ji ber bandora çend faktorên subjektîf û objektîv e, yên herî girîng:

- Zêdebûna berdewam a eşîran û nakokiyên wan, ku gelek malbat belav bûn û ji eşîrên xwe hatin veqetandin û êdî têkiliyek fîzîkî di navbera wan de nema.
- Kêmbûna baranê li gelek deverên deştê ku aboriya çandiniyê nekarî pêdiviyên jiyanê peyda bike.
- Siyaseta bindestiyê ya desthilatdaran li hember civakên Kurd ên li gundan û hewldana xizankirina wan di warê aborî de, yan jî koçberkirina wan, nemaze piştî têbirina şoreş û serhildanên gel an jî dagîrkirina deverên wan.
- Daxwaza rizgarbûna ji desthilatdariya axayan bi riya bidestxistina kar û pîşeyên nû, ligel zêdebûna hişmendiya zanyarî di nav kurdan de.
- Qalîteya xizmetên ku li bajêr têne pêşkêş kirin berevajî ya gundan.
- Encamên aborî û siyasî yên Şerê Cîhanê yê Duyem.

Wisa xuya dike ku piraniya kurdên çar parçeyên Kurdistanê berê xwe didin civakeke bajarî û medenî, ji ber ku piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, derketina vê şêwaza civakî di heman dema lawazbûna şêwaza jiyana civakî ya eşîrtî û lawazbûna desthilatdariya oldaran zêde bû. Civaka medenî (bajarî) di navbera sê çînên sereke de dabeş bû: dewlemend, kedkar û burokrat, her weha hin cureyên kesên ku wek nîv-gundahî û nîv-bajarî dihatin binavkirin jî hebûn, ango li gundan bi cih bûne yan jî têkiliya xwe bi gund re qut nekirine, lê bi pergala aborî ya bajêr ve girêdayî ye û jiyana xwe ya aborî li gorî wê birêve bibe. Hema bêje beşeke mezin a Kurdan di têkiliyên civakî û aborî de berê xwe didin vê şêwaza jiyanê, bi taybetî li Rojava û Bakurê Kurdistanê; ji ber ku ev sîstem rê dide her malbatekê ku rewşa xwe ya aborî baştir bike û ewlehiya jiyanê bi dest bixe, bêyî jêdera wê ya civakî û hêza wê hijmarî. Wisa xuya ye ku pêwîstî bi gelek lêkolînan di vê nimûneya civakî ya di nav Kurdên ku ji ber rewşa aborî ya sîstematîk ji aliyê desthilatdarên gendel ên ku wan bindest dikin de heye. Di derbarê rewşa bîrdoziya şer a vê nimûneya civakî de, di serî de

li ser parastina malbatê, parastina rûmeta wê û parastina wê ji belengaziyê dizivire, û dema komek ji malbatan rastî xeteriyekê werin ew bi hevre dibin yek, têgeha xweparastina civakî jî bi şêweyekî sereke vê nimûneyê vedibêj e, nimûneya herî berçav jî civaka Rojava ye, weke mînak, dema ku bajarên Rojava rastî êrîşên hovane yên piştî sala 2011'an ji aliyê milîsên girêdayî Îxwan Muslimîn û El-Qaîde ve bi piştgiriya dewleta Tirk hatin, bi dehan ciwanên xwedî giyanê şerker û ji malbatên cuda tevlî nava refên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) bûn, bêyî ku tu motîvên olî an maddî hebin, gelek qurbanî hatin dayîn û gorên şehîdan ên ku li herêmê belav bûne jî nîşan vê yekê ne.

### Hêmanên bîrdoziya şer li cem kurdan

Hezkirina şer ji aliyê kurdan ve weke sûc nayê dîtin, lê belê sembola mêranî û qehremaniyê ye, ku bi prensîbên exlaqî û çandî tê rêxistinkirin. Wisa xuya ye ku ji bo mayîna wan şertekî bingehîn e. Komeke ji hêmanên aktîv di avakirina bîrdoziya şer ya li cem Kurdan de hene, mirov dikare van hêmanên bi riya motîvên ku kurdan handanî şer dikin hîs bike, dibe ku yek an jî zêdetir li ba kurdan derkevin. Em dikarin taybetmendiyên wê yên herî girîng wiha destnîşan bikin:

**1.Pabendbûna bi vîna azad û berxwedana li hemberî desthilatdar û dagirkeran.**

Ji ber ku Kurd her tim rastî êrîşên padîşahiyan cîran dihatin, bîrdoziya wan a sereke ya şer di çarçoveya parastina xaka xwe de bû, ji ber ku gorên bav û kalan hebûn, ku olên Kurdan ên kevnar bi jiyana piştî mirinê bawer dikirin. Erd (xak) di heman demê de çavkaniya ku jiyana malbat û eşîrê misoger dike ye. Kurd dizane ku armanca her dagirkerekî ew e ku wî û malbata wî bikuje, yan jî wan bike kole û mal û milkên wan talan bike, yan jî wan neçar bike ku bacê bidin û xizmetên leşkerî û aborî pêşkêşî şahên dagirker bikin. Ev yek ji bo Kurdan bû sedemek ku ji bo parastina vîna xwe ya azad, zihniyeta eşîrî derbas bikin neteweyî û hewl bidin ku hevgirtinên eşîrî ava bikin, weke di azmûna Medya de. Dibe ku hevbendiya bi hin welatan re ji bo parastina sînorên herêmên eşîran ji êrîşên welatên cîran jî, di sedsalên borî de ketiba nav bîrdoziya leşkerî ya Kurdan, wek eşîrên li ser sînorên siyasî yên di navbera Osmanî û Sefewiyan de û berê jî di

navbera Pers û Rûmanan de. Ji ber vê yekê, parastina hebûnê hêmaneke girîng a bîrdoziya şer a kurdan e, û mîtolojiya Kawa El-Heddad û rêbertiya wî ji kurdan re û şoreşa li dijî Azdehak (padîşahê zordar û dehbe) gelek wateyên dîrokî û çandî yên vê bîrdoziyê ne. Armancên tolhildanê ji dagirkeran, parastina xakê, rizgariya ji dagirkeran û bi dawî anîna xeteriya dijminan jî, hêmanên sereke di avakirina bîrdoziyeke nû ya şer a bav û kalên Kurdan de bûn, ev yek di nimûneya artêşa Medyayê de ya ku ji aliyê lehengê neteweyî yê kurd, Kyaxsar / Kayxosro ve, li derdora sala 615 B.Z hatibû damezrandin tê dîtin, piştî ku wî sîstema hêzên têkel ên ku li gorî şêwazên şer ên her eşîrekê bi awayekî nerêkûpêk şer dikirin bi dawî kir û hêzên leşkerî li gorî cureya çekan dabeş kirin, mînak, Çekdarên peya, rim û siwar, û ew bi hestên bilind hatin piştgirî kirin ji ber ku ew leşkerên xwedayê dilovan Ahura Mazda temsîl dikin. Di têkçûna Împeratoriya Asûriyan de, ku di wê serdemê de împaratoriya herî bi hêz û tirsnak dihat pejirandin, rola vê rêxistinbûnê ya sereke hebû. Ev yek di şoreşên cuda yên Kurdan de ji sed salan heta serdema nûjen bi awayekî rêjeyî dubare dibe.

**2-Nijadperesiya di kevneşopî û adetên eşîrtî de.**

Ji hêmanên din ên şer li cem kurdan li gorî hin lêkolînerên bi civaknasiya kurdî re eleqedar in, tolhildana xwînê, dijminatiyên eşîrtî; meyla talankirin û êrîşên ser gund û eşîrên ku ne di çarçoveya peymana wan a civakî de ne, parastina milkên xwe mîna zevî û mêrgên û parastina kesên ku li wan digrin li gor qanûna devkî ya şerefê, ev yek jî li gor lêkolîner Arshak Safristiyan destnîşan dike ye. Di heyama komkujiyên hovane yên ku ji aliyê Osmaniyan ve li ser Xirîstiyanan hatin kirin û tevî fetwayeke olî ji aliyê sultan ve, beşeke mezin ji Kurdên Misilman bersiva wê nedan, lê belê parastina kesên ku xwe spartin wan kirin, ta radeya ku gelekan li dijî leşkerên sultan ji bo parastina kesên bêguneh şer kirin, gelek ji wan hatin dardekirin. Her weha serhildana li dijî desthilatdarên gendel li herêmên kurdî ji ber xizanî, gendelî, zordariya deshilatdaran li ser sivîlan, talankirina zad û alavên wan, û leşkeriya bi darê zorê di şerên ku Kurdan têkildar nake de. Çiya jî ji bo gelek serhildêran bû cihê ewle, lewra şoreşa li hemberî zordaran jî beşek bingehîn a bîrdoziya şer li cem Kurdan e.

**3-Nijadperesiya di baweriyên giyanî de.**

Digel van tiştên li jor, kurd jî wek gelên din ên rojhilatî bi hestên olî ya xurt tên naskirin, dibe ku sedema vê yekê ji ber nekarîna berxwedana wî ya li hember diyardeyên sereke yên xwezayî û hewa yên ku li welatê wan diqewmîn be, mîna berf û barana zêde, lehî, erdhej, rûxîna eraziyê, şewata daristanan û hwd. Mîtolojiya newroz û Kawa ya kurdî desnîşana vê rastiyê dike, Ku bandora xwe li ser dualîtiya qencî û xerabiyê di nav bav û kalên gelê Kurd de û beriya derketina olên Îbrahîmî hebû; ku xwedayê qencî û ronahîyê û xwedayê xerabî û tariyê heye. Di olên mezdî, zerdeştî û olên din de weke kurtejiyanên bawerîyên olî yên kevnar ên kurdan, avakirina perestgehan ji bo perestinê û pêşkêşkirina qurbanên nebatî û heywanan ji xwedayan re, ji bo bidestxistina razîbûna wan û rizgarbûna ji xezeba wan. Wisa xuya ye ku vê yekê roleke mezin di pêkhatina bîrdoziya şer ya Kurdan de lîstiye, wek mînak, Zerdeştî daxwaz dikir ku li pey Xwedayê qenc Ahûramazda şer bike û şerê Xwedayê xerab Ehrîman bike. Gelek caran jî dagirkeran perestge xerab dikirin û êrîşî pîrozbahiyan dikirin, ji ber vê yekê bawermend neçar diman ku ji bo parastina pîroziyên xwe şer bikin. Ji aliyê din ve ol di şerê Kurdan de rola xwe lîstiye, wek mînak, hin ji Kurdan mezhebên cûdayî Zerdeştiyê dişopandin, ku Împaratoriya Sasaniyan desthilatdariya xwe weke oleke fermî bikar anîbû. hinek ji van baweriyan jî Manî, Mazdakîtî û Xirîstiyanî. Baweriya xiristiyaniyê li ba piraniya bawermendên bav û kalên Kurdan û cîranên wan ên Suryanî jî, di ravekirina sêyîtiya pîroz de di bin bandora Aryenîzmê û baweriyên din ên nêzî baweriyên Îslamî de bûn. Ev bawerî di gelek rewşan de li dijî kilîseya Rojavayî bû. Digel çewsandina kurdên xiristiyan ji aliyê padîşahên Sasaniyan ve di hin deman de ji ber şerên ku wan li dijî Bîzansiyan dikirin. Wisa xuya ye ku bandoreke exlaqî ya girîng a vê mijarê hebû di dûrxistina hinek kurdan ji şerê de navbera faris û erebên misilman de, ji ber ku El-Waqidî di pirtûka xwe ya bi navê (Dîroka fethên Cizîr, Xabûr, Diyarbekir (Amed) û Îraqê) de behsa tevlîbûna gelek Xirîstiyanan nav refên artêşa Îyad Bin Xanem û rola wan a diyarker di rûxandina kelehan û dagîrkirina herêmên cizîr ku wê demê di bin destê Împeratoriya Bîzansê de bûn; herêmên giravê yên ku di bin destê Împeratoriya Bîzans de bûn. Ji ber vê yekê, dema ku hêzên îslamî hatin, Kurdistan ji şerên dijwar ên di navbera Bîzans û Farisan de westiya bû û bû gelek nakokiyên

bîrdozî hebûn. Piraniya neştecihan jî ne xwedî moral û vîna pêwîst ji bo berxwedan û seferberiya li dijî dagirkeran bûn û piraniya berxwedanên ku derketin holê jî di çarçoveya parastina mal û milkên madî û manewî û parastina malbatan da ku nebin xenîmet de bûn.

Bi şopandina piraniya kurdan ji baweriya îslamê re ji ber gelek sedeman, cîhad bû handana sereke ya şer li cem kurdan ên ku di navbera mezhebên îslamiyetê yên cuda de hatin belavkirin, û li ser bingeha vê yekê dijmin, dost û hincetên şer dihatin diyar kirin. Wisa Xuya ye ku vê yekê nikarî nijadpersiya eşîretî ya di nav eşîrên kurdan de rake, tevî ku hin ji wan di şerên dijwar de di xizmeta sultanên şîe û sunî de bûn leşker jî, lê vê yekê rê li ber hin hewlên avakirina pêkhateyên Kurd ên dûrî desthilata neteweyên din negirt. Hin eşîrên kurdan karîn çend dewletok û mîrnişînan ava bikin, wek Dewleta Dostekî (Merwanî), Mîrnişîna Şedadî, Dewleta Eyûbî, Mîrnişîna Bûtanê û hwd, lê negihîştin asta dewleta olî - neteweyî, mîna dewletên faris, tirk û ereban. Tiştên ku hatine behs kirin nîşan didin ku motîva bîrdozî hêmaneke sereke ya bîrdoziya şer li cem Kurdan e. bîrdoziya leşkerî ya kurdî bi dagîrkirina Kurdistanê ji aliyê artêşên îslamî ve rastî guhertinên mezin hat, ku bandora wê li ser avakirina bîrdoziyeke nû ya şer ji bo piraniya kurdan hebû, piştî ku mêtingeriya farisî bi ya ereb hate veguherîn. Debe ku ev yek ji sedemên bawerîpêkirina kurdan a bi lez bi îslamê bû ji bo ki li hemberî êrîşên Roman û Bîzansan bisekinin, weke ku Ramyar Ocelan dibêje, Ku di nav Ereban de hêzeke leşkerî dîtin ku dikatin pê re hevalbendiyê bikin, û wisa xuya ye ku ev tecrûbe bi hin Tirkên Misilman ên ku Kurdistan dagir kirine, mîna Selçûkî û Osmaniyan jî dubare bûye. Em dikarin bîrdoziya leşkerî ya Kurdan a ku li ser bingeha hevbendiyê bi gelên din re hatiye avakirin, bi çanda wê ya kevnar ve rave bikin, ku sîstemeke weke federasyonên leşkerî yên bi hezaran salan li Kurdistanê ji bo xweparastina civakên Kurdistanî vebijarkeke stratejîk bû. Xuya ye jî ku bawerîpêkirina kurdan bi îslamê û siyaseta îdarî ya Dewleta Xîlafetiyê di wê serdemê de, ku di nav civakên kurd ên misilman de bûne deverek xweser an mîna xweseriyê hiştiye, ku bi demê re derbas nav çanda kurdî bû, lê belê li gorî wan veguherînên ku di nexşeya siyasî de, di erdnîgariya çandî ya Kurdistanê de nekarî guhertinên bingehîn pêk bîne. Ji ber ku kurdan ziman, mîrata çandî û pergala xwe ya civakî parastiye, Îslamê bandor li zihniyeta şervanê Kurd ê Misilman kiriye, hest û reftarên

wî li ser bingehên bîrdoziya cîhadê ji nû ve dorpêç kiriye û ev yek bi awayekî eşkere di eşîrên Kurdan de yên ku bersiva banga cîhadê ya Selahedîn Eyûbî di sala 1187an de ji bo li dijî artêşên xaçparêzan li bakur û rojavayê Şamê şer bikin xuya bû. Hevrikiyên mezhebî yên di navbera Kurdan de jî bandora xwe li ser bîrdoziya şer a Kurdan kir, weke mînak, cudahiyên olî û mezhebî yên di navbera Kurdên Sunî û elewiyan de bûn sedema têkçûna şoreşa Kojkarî ya sala 1921-an û şoreşa Şêx Seîd a sala 1925-an. Tevî vê yekê jî lêkolîner Minorsky dibîne ku hestên dilsoziya bi malbat, eşîr an qebîleyê li cem Kurdan ji hestên mezhebî û netewî bihêztir in, ji ber ku ew di wan de hêza berdewamkirina hebûna xwe dibîne û ji ber vê yekê Kurd bi awayekî wêrek wan diparêze. Ev nerîn tê baweriya ku bîrdoziya şer li cem Kurdan li gorî bîrdoziya serokên wan e.

### 1. Hestên neteweyî.

Di dawiya sedsala nozdehen de, hestên neteweyî ligel ên olî bûn yek ji faktorên sereke yên ku bandor li bîrdoziya şer a kurdan kir, ku di çarçoveya bidestxistina mafên neteweyî, xweserî û pêkanîna şerîeta îslamî de bû, ev yek jî piştî ku şêxan serweriya xwe li ser rêbertiya tevgera neteweyî ya Kurd kirin, piştî ku Kurdistanê di serhildanên li dijî Împaratoriya Osmanî de gelek serokên eşîran winda kirin bû. Dibê bê zanîn ku gelek şervanên eşîrên Kurd di çarçoveya beşdarbûna wan di şerên Împaratoriya Osmanî yên bi Rûsyaya re, şerên Balkanan û Şerê Cîhanê yê Yekem de, ligel tevlîbûna gelek kurên lîderan nav dibistana eşîran (1891 P.Z) û lîwayên Hemîdiyê, gelek tecrûbeyên şer girtin. Ev hesta (Olî-Neteweyî) di şoreşên kurdî li Kurdistan de, ji şoreşa Ubeydullahê Nehrî ya sala 1880-an heta sala 1984-an P.Z ve, ku tê de avakirineke nû ya bîrdoziya şer li cem beşeke mezin ji kurdan derketiye holê, bi awayekî eşkere diyar bû. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, sîstema eşîrî ya Kurdan di bin bandora pêşketina teknolojîk di qada çandiniyê de, hêdî hêdî dest bi hilweşînê kir, lê cotkaran şêwaza jiyana eşîran domand. Piştî salên şêstî bîrdoziya neteweyî û wekheviya bi neteweyên din re bûn hêmana herî diyar a bîrdoziya şer a kurdî.

### 2. Xweparastina civakî.

Piştî dagîrkirina Padîşahiya wan a Medya ji aliyê Farisan ve, beşeke mezin ji bav û kalên Kurdan karîbûn taybetmendiyên xwe yên siyasî, aborî

û civakî biparêzin. Wan karîbûn koalîsyoneke yekgirtî li çiyayên navîn di navbera Zagros û Torosê de, ku jê re digotin Çiyayên Kardûk, ava bikin û li gorî çêrokên fermandarê leşkerî yê Yewnanî Xenphon / Zînfon, bîrdoziya wan a şerkerinê di çarçoveya parastina herêmên wan de bû, Zînfon kurdan weke gelên mêrxas ên şerker û ne bindestê padîşahê farisan bi nav dike, û dibêje ku herêmên wan hişk bûn û wan nehiştin ku kes bê destûra wan bikeve nav gund û warên wan ên ku mêrgên terşên (dewar) wan peyda dikin. Xenphon / Zînfon her weha didomîne û dibêje ku kurdan artêşeke mezin a farisan ku dixwest wan bindest bike têkbirin û çeka wan a sereke ya parastinê kevir û tîr bûn; ew kevanên wan bi qasî nîv metre ji zilamekî mezin dirêjtir wesif dike û mertal û Serparêzan qul dike, di heman demê de mezinahiya kevirên ku bi şengê dihatin avêtin di navbera yên mezin û piçûk de cûda dike. Li herêmên deştî jî, gundên xwe di asta di bin ruyê erdê de û bi tunelan bi hev re girêdayî bûn ava dikirin. Xweparastina civakên Kurdan û neketina bin desthilatdariya biyaniyan, ku hin ramyarên leşkerî yên kurd îroj jê re dibêjin “xweparastina civakî”, di bîrdoziya şerê Kurdan de hêmaneke bi bandor bû. Destana Keleha Dumdimê mînakeke diyar a vê taybetmendiyê, her wiha şoreşên kurdan ên li dijî desthilatdariya Emewiyan, Ebasiyan û Osmaniyan ên ku daxwaza wekheviya civakî dikirin, û bi hovane hatin çewsandin jî, di vî warî de mînak in. wisa xuya ye ku ev yek taybetmendiyeke cihêreng a civakên çiyayî ye, ku cîh û hewa li hember avakirina desthilateke navendî ya ku tevahiya herêmê kontrol dike asteng in, nemaze bi hebûna penageh, av û xwarinê, ku tê de her komek serxwebûn û xwebirêvebirina xwe diparêze û dema ku metirsî wan tehdîd dike dibin yek. Berevajî civakên rûbarî, yên ku di dîrokê de pir pîrozî û bindestî ji serdestên xwe re dikirin, ji ber ku bi hebûna zozanên hişk, jiyan tenê li nêzî çeman dibe û dema ku serwerî li ser were kirin hêsane gel were bindest kirin, an dê guh bide desthilatdar an jî dê ji birçîna re bimre, ji ber ku zehmete cihekî din peyda bike da ku jê re bibe penageh û av û xwarinê peyda bike. Ev yek di çavdêriya me ji şaristaniyên cîhana kevnar re xuya kir.

# Dîroka tevgera siyasî ya kurdî li Sûriya

**(B 4)**

## Rêxistinên siyasî yên kurdî li Rojavayî Kurdistanê

Piraniya van rêxistinan hatin jevxistin an jî tu xebatên wê tune bûn. Ev lîste jî partî û rêxistinên ku heyanî sala 2008 û 2009 lêkolîn li ser hatin kirin. Sala 2008 ji gelek rêxistinan re saleke xebatê bû. Lê ji gelek rêxistinên biçûk re jî sala qelsbûna rêxistinî bû; di vê lîsteyê de berztirîn rêxistinên Kurdî li derve ev bûn:

**1-Encûmana Niştîmanî ya Kurdistanî- Sûriya:**

Ew li Brûkselê di 29'ê gulana 2006'an de bi seokatiya Şêrgo Ebas (serokê Kongreya Kurdî li bakurê Emerîka )hate damezrandin, ev encûman daxwaza federaliyê ji kurdên Sûriya re dike, berztirîn xebatên wê:

- Pêkanîna hevdîtinan bi endamên Kongresa Emerîkî re di 2006'an de, her wiha daxwaza zagona rizgarkirina Sûriya û piştgiriya dijbertiya Sûrî, kir.

- Pêkanîna hevdîtinan bi hin endamên Perlemana Kenedî re di 2006'an de bo ku ji rewşa Kurdan li Sûriyê agahdar bin.

- Beşdarbûn di damezrandina Komeleya Hevalbendiya Emerîkî-Kurdistanî di 2007'an de.

- Alîkarîkirin di dayîna serokê Emerîkî Boş ji daxuyaniyekê der barê kuştina ciwanên Kurd li Qamişlo di adara 2008'an de.

**2-Hikûmeta rojavayê Kurdistanê li derve:**

Ev hikûmet li bajarê Hêrta li Elmanya di 25'ê nîsana 2004'an de bi serokatiya Dr.Cewad Mele hate damezrandin û pênc wezaret di nav xwe de dihewand “ya karûbarên derve, karûbarên hundirîn, ragihandin, ewlehiya navneteweyî û petrolê”. Her wiha banga serxwebûna rojavayê Kurdistanê dikir.

**Berztirîn destkeftiyên vê hikûmetê:**

- Pêkanîna hevdîtinekê bi serok wezîrê Birîtanî yê berê Tony Blêr re, her wiha “ala başurê Kurdistanê” û nameyek bo şîrovekirina doza kurdî redestî wî kir.

- Vekirina yekem radoyaya kurdî bi navê Radyoya “Rojavayê Kurdistanê” ya peykî di 11'ê adara 2005'an de.

- Vekirina Mûzeya Kurdistanê ya Kelepûra Kurdî li Lundunê.

**3-Tevgera Rojavayê Kurdistanê:**

Ew li Lundunê di 1997'an de ji hêla Dr.Cewad Mele ve hate damezrandin.

**4-Tevgera Azadîxwazên Rojavayê Kurdistanê:**

Di gulana 2007'an de hate damezrandin, banga pêkanîna federaliyetê ji bo kurdên Sûriya dike, di dawiya sala 2007'an de ji xwe re navendek li başurê Kurdistanê vekir.

Di 10'ê adara 2008'an de, operasyoneke çekdarî dijî yek ji qereqolên rêjîma Sûrî li kantona Cizîrê pêk hat û “Tevgera Azadiya Kurdistanê” ew operasyon li xwe girt, her wiha tevgera “Azadîxwazên Rojavayê Kurdistanê” daxuyaniyek piştevanî da vê tevgera nenas. Piştî ragihandina pêkanîna operasyonê, Partiya Pêşverû /Ebdilhemîd Hac Derwîş/ di cih de daxuyaniyek da bi îxanetkirina her rêxistinekê ku hizira çalakiyên çekdarî li xwe digire. Di dawiya tîrmeha 2008'an de, navgînên ragihandinê nûçeyek der barê “şandina rêjîma Sûrî nûnerekî xwe yê ewlehî li Herêma Kurdistanê”weşand. Di encama hevdîtinê ev bû ku Hikûmeta Herêma kurdistanê pabend bû bi çavdêkirina çalakiyên Tevgera Azadîxwazên Rojavayê Kurdistanê yê ku hizira çalakiyên çekdarî li Sûriyê ji xwe re esas digire. Di cih de vê tevgerê hebûna tu endamên xwe li herêmê neyînî kir.

**5-El-Partî Demokratîk a Kurdistanî –Sûriya:**

Ev partî li Elmaniya di 14'ê hezîrana 2000'an de bi serokatiya Tewfîq Himêdaş, hate damezrandin . Di 2004'an de Dr.Hisên Sado jê veqetiya û di 2007'an de Salih Heyder jê veqetiya, her wiha berztirîn damezrînerê wê “Can Kurd- Ibrahîm Hemo” jî jê veqetiyan. Lewre jî Tewfîq Himêdaş neçar

ma partiyê jev bixe û bi Partiya Modernîte û Demokrasiya Sûrî ya ku Firas Qesas serokê wê ye, bibe yek partî.

Têbinî: Gelek têbînî ji hêla gelek serokên El-Partî Demokratîk a Kurdistanî hatin şandin ku jevxistina partiyê neyînî dike.

**6-Kombûna dijber a Kurdî:**

Dr.Hisên Sadûn di 2004'an de ev partî damezrand piştî ku ji El-Partî Demokratîk a Kurdistanî-Sûriya veqetiya.

**7- Partiya Libêral a Kurdistanî –Sûriya:**

Ev partî di hezîrana 2006'an de ji hêla Ebdilbaqî Kolo ve hatiye damezrandin (ew berê berpirsyarê rêxistina Kurdistan ya Partiya Azadî bû û piştre bû nûnerê Şepêla Pêşerojê di Kongreya Brûkselê de), piştre Ebdilbaqî Kolo istîfaya xwe da û Botan Zêbarî bû serokê wê. Tê texmînkirin ku xebatên vê partiyê ji gulana 2007'an ve sekinîne.

**8-Tevgera 12'ê Adarê ya Niştîmanî ya Kurdî ya Sûrî:**

Ebdilbaqî Kolo ev tevger damezrand piştî derketina wî ji Partiya Lîberal di nîsana 2007'an de.

**9-Tevgera Guhertina Demokratîk a Kurdistanî:**

Ev partî li başurê Kurdistanê di 2005'an de hate damezrandin bi serokatiya Dr.Rêzgar Qasim (yê ku tê texmînkirin ku nêzî Selah Bedredîn, lê Dr. Rêzgar ev yek neyînî kir û tekez kir ku partî li Ewropa hate damezrandin).

**10- Partiya Şarestanî ya Demokratîk a Sûrî:** Serokê wê Heso Emerîko ye.

**11- Partiya Demokratîk a Êzîdî:** Serokê wê Kerîm Ecem e.

**12- Yekîtiya Karê Niştîmanî ya Kurdên Sûriyê:**Serokê wê Ibarhîm Derwîş e, yê ku malpera “Kurd Sûriya” bi rê ve dibe. Ew rêxistina îslamî ya tekane li Rojava ye.

**13-Mecilsa Piştevaniya Demokratîk a Kurdî – Kurdistana Sûriya:** Li Elmaniya di gulana 2005'an de hate damezrandin.

**14-Saziya Sema Kurd ya Çand û Hunerê:** Di havîna 2004'an de ji hêla Ferîd Saidon û çend nivîskaran ve hate damezrandin bi piştgiriya diravî ya

karsazê kurd Arif Remedan. Rêdanan xwe ji dewleta Îmaratên Erebî yên Yekbûyî wergirt, berztirîn xebatên wê:

*Lidarxistina hevdîtina çandî ya Kurdî-Erebî li El-Şarîqa.

*Bidestxistina bursên xwendinê li zanîngehên Herêma Kurdistanê.

*Lidarxistina pêşengehên hunerî.

*Çapkirina pirtûkan.

* Dayîna perwerdeyên li ser zimanê Kurdî.

*Pêşwazîkirina kesayetên rewşenbîr di navenda xwe de li Dûbayî.

*Beşdarbûn di damezrandina kanala Vîn ya peykî.

**15-Desteya Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê:**

Li Ewropa di 2005'an de hate damezrandin, malpera wê li ser internêtê (Rojava) heye. Di adara 2006'an de kampaniya sedhezar îmze bo itîrafkirina fermî bi zimanê kurdî li Sûriyê li dar xist, da ku wan radestî Rêxistina UNESCO ya girêdayî Neteweyên yekbûyî bike.

**16-Rêxistina Rojnemavanên Bê Rojname:**

Di 2007'an de hate damezrandin, serokê wê Cîhad Salih e, hin ji endamên wê:Mesûd Hamid/ berpirsyarê rêxistinê li Parîs, Xalid Elî/berpirsyarê rêxistinê li Herêma Kurdistan û Serwan Qiço.

**17-Komeleya Kawa ya Çanda Kurdî:**

Li Beyrûtê ji hêla Selah Bedredîn ve di niviyê salên notî ji sedsala bîstan de hate damezrandin. Ev komele pirtûkên nirxhêja der barê kurdan de çap dike.

**18- Komeleya Kaniya Spî ya Candî û Civakî:**

Di 1993'an de, komek ji rewşenbîrên Êzîdî Komîteya Kaniya Spî ya Çandê damezrand. Di 2004'an de bername û rêzikname jê re hate danîn û navê wê hate guhertin û bû “Komeleya Kaniya Spî ya Çandî û Civakî”. Di dawiya 2005'an de, navê xwe di lîsteya komeleyên li Elmaniya de tomar kir.

Armanca vê komeleyê parastina mafên kurdên Êzîdî û belavkirina çanda Êzîdahî bû.

**19-Partiya Yekîtiya Niştîmanî ya Azad-Sûriya:**

Di 17'ê nîsana 2008'an de hate damezrandin û çalakiyên wê nehatine naskirin.

**20-Tevgera Azadiya Kurdistanê:**

Di 2007'an de ji hêla Hoşeng Derwîş ve hate damezrandin û navendek ji xwe re li Herêma Kurdistana Îraq di 2007'an de vekir. Ev yek jî hişt ku gelek rexne di nava partiyên kurdî derkevin nemaze piştî ku çend operasyonên çekdarî li Cizîrê dijî qereqolên leşkerî li Sûriyê li xwe girtin (di bîranîna serhildana 12'ê Adarê û kuştina Şêx Maşûq Xeznewî de).

**Hejmara partiyên siyasî li Rojavayê kurdistanê:**

Di riya vê lêkolînê re me karîbû navê 33 partiyên li Rojava tomar bikin, tevî ku hejmareke mezin ji tevger û rêxistinan li qada siyasî ya kurdî li Rojava heye ku hejmara wan dughêje 40 rêxistinên siyasî. Ev hejmar jî ber bi zêdebûnê ve diçe, tevî ku hejmara partiyên navdar li Rojava heyanî 2010'an li gorî ku di hawîrdora gelerî de belav bûbû “li ser erdê Rojava 12 partiyên kurdî yên berz hene”. Lê piştre, partiyên kurdî zêde bûn û 30 derbas kir. Hejayî bi bîrxistinê ye ku gelek partî ji vê lîsteyê pêvajoya yekbûnê pêk anîn ku jê Partiya Demokratîk a Kurdistanî –Sûriya hate avakirin û hejmareke kêm ji wan partiyan di Encûmana Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê de ma. Her wiha partiyên mayî jî tevlî pêvajoya Rêveberiya Xweser a Demokratîk li Rojava bû û hejmareke kêm jî derveyî her du aliyan ma.

**Lîsteya Partiyên Kurdî li Rojava:**

1-Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî)/ Ebdilhekîm Beşar.

2-Partiya Demokratîk a Kurdî ya Sûrî/ Cemal Şêx Baqî.

3-Partiya Yekîtiya Demokratîk/ Salih Mislim, Asya Ebdelah.

4-Partiya El-Partî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê/ Mihemed Saîd El-Wadî, Ebdilrehman Elûcî.

5-El-Partî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê/ Ebdilkerîm Siko Ebû Ciwan.

6-Partiya Demokratîk a Niştîmanî ya Kurdî/ Tahir Sfûk.

7-Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî) / Nesredîn Berhek.

8-Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê/ Ebdilhemîd Derwîş.

9-Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (Yekîtî) / Mihyadîn Şêx Alî.

10- Partiya Yekîtîya Kurdî/ Ibrlahîm Biro.

11- Partiya Yekîtiya Kurdistanî/ Ebdilbasit Hemo.

12- Partiya Azadî ya Kurdî li Sûriyê/ Mistefa Oso.

13- Partiya Azadî ya Kurdî li Sûriyê/ Mistefa Cûma.

14- Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê/ Mihemed Mûsa.

15- Partiya Çep a Demokratîk a Kurdî li Sûriyê / Salih Gedo.

16-Partiya Çep a Kurdî (Şepêla Çaksaziyê)/ Mihemed Masûm Omerî.

17- Tevgera Guhertin û Çaksaziyê/ Feysel Yûsif.

18- Partiya Wekheviya Demokratîk a Kurdî/ Nimaat Dawûd.

19- Partiya Rêkeftin a Kurdî/ Neşaat Mihemed.

20- Partiya Rêkeftin a Kurdistanî/ Omer Dawûd.

21- Şepêla Pêşerojê a Kurdî/ Rêzan Şexmûs.

22- Inîsyatîfa Niştîmanî ya Kurdên Sûrî/ Omar osê.

23- Partiya Kombûna Demokratîk a Niştîmanî ya Kurdî/ Mihemed Ebas Ebû Şêro.

24- Partiya Lîberal a Kurdistanî/ Dr. Ferhad Têlo.

25- Partiya Demokratîk a Kurdistanî/ Tewfîq Himêdaş.

26-Kongreya Niştîmanî a Kurdistanî/ Cewad Mele.

27-Partiya Yekîtiya Gelerî ya Kurdî/ Hesen Alûka.

28-Partiya Aşîtiya Demokratîk/ Telal Mihemed.

29-Şepêla Niştîmanî ya Kurdî/ Heybet ebû Helebçe.

30-Partiya Pêşengtiya Kurdsitanî/ Ismaîl Esaf.

31-Partiya Komînîst a Kurdistanî/ Necmedîn Mele Omar.

32-Partiya Guhertina Demokratîk a Kurdistanî/ Dr. Kamîran Hisên, Mizgîn Zêdan.

33-Tevgera Nûjenkirina Kurdistanî – Sûriya / Dr. Rêzgar Qasim.

**Encam:**

Rewşa siyasî ya giştî li gel piraniya partiyên tevgera siyasî ya kurdî li Rojava girêdayê tewereyên derveyî ne, girîngtirîn wan tewereyan

Kurdistanî ne. Ev yek jî rê li pêşiya veqetîbûn û parçebûna van partiyan vekir ji ber ew dikevin di bin bandora serweriya van partiyan nemaze yên li başurê Kurdistanê.

Berztirîn partiyên li Rojava heyanî sala 2010'an de der dorê 12 partiyên sereke bûn, lê gelek parçebûn tê de çêdibûn, her wiha partiyên ku nû çêdibûn heman nav radikirin nemaze jî peyva “El-Partî û demokratîk”di piraniya navên partiyên nû de dihatin dubarekirin. Li asta ku êdî lêkolînvan zehmetî dikşand di naskirina van partiyan, rêbaz û rêziknameya wan de, yên ku di cewherê xwe de ne zelal in û nagihêje asta rêziknameya El-Partî ya ku Apê Osamn di 1956'an de damezrand. Her wiha di gelek rewşan de heke nakokî di partiyeke siyasî ya kurdî de çêdibû, her du partî (ya mak û ya veqetiyayî) li ser navê resen ya partiya mak û mafê kî ji wan e ku navê resen yê partiyê hilde, pev diçûn. Lewre jî her du partî (ya mak û ya veqetiyayî) li ser heman navê dimîne lê navê kesayeta berz li ser dawiya navê partiyê zêde dike ji bo ku ji hev bêne naskirin.

Hejayî gotinê ye ku di dirêjahiya dîroka tevgera siyasî ya kurdî li Rojava de tu rol yan jî rgihandina damezrandina partiyeke siyasî Îslamî ya kurdî ango “partiyên Îslama siyasî” tune bû, berevajî parçeyên din ên kurdistanê û heta dewletên dagirkerên Kurdistanê jî.

Qada siyasî ya kurdî li Rojava hema tu kombûn û tevgerên Îslamî yên kurdîtî tê de tune bûn û taybetmendiya herî berz ya partiyên kurdî sekuler bû.

Tevî rola girîng ya terîqetên olî û sofî di çalakirin û aktîvkirina tevgera siyasî li Rojava di destpêka derketina tevgera siyasî ya kurdî de, lê tu niyaz bo veguhertin ber bi rêxistineke siyasî ya Îslamî kurdî di dirêjahiya sedsala bîstan de û hetanî niha nehatiye dîtin. Her wiha tu çalakiyên wan ên siyasî her wekî tevger û rêxistinên îslama siyasî yên li dewletîn Rojhilata Navîn de belav bûne, nehatiye dîtin. Ev yek jî vedigere hestên neteweyî yên kurdî li gel çîna meleyên kurd ku heyanî niha jî bi ser hestên olî yên “îslama siyasê”dikevin.

Li aliyekî din, di dema destpêka damezrandina yekem partiyeke siyasî li Rojava û tevî ku têkoşer Osman Sebrî bernameya wê ya siyasî bi zimanê kurdî danî, lê partî wek xwe ma û bi awaya ku tê xwestin bi pêş neket;

zimanê kurdî di merasîm û belavokên siyasî û partîtî de bi kar netanî, tevî ku 90% ji gelê kurd bi zimanê erebî nizanin. Lewre jî em dibînin ku piraniya serokên van partiyan zimanê kurdî ya fermî di xebatên xwe yên siyasî de heta niha jî bi kar nayînin, tevî ku gel bi zimanê dayîkê dijî û xebatên xwe pê dimeşîne. Ev yek jî bû kelem û nikarîbû dijî siyaseta erebkirinê ya ku hikûmetên Sûrî yên lipeyhevhatî dijî zimanê kurdî li Rojava û Sûriya bi kar anîn, bisekine.

Piraniya van partiyan hest kir ku rol û rewatiya wan di nav gelê kurd li Rojava de lawaz bû, lewre jî dest bi lêgerîna rewatiya xwe li derve kir. Hinekan hewl da rewatiya xwe di riya tewereyên derveyî biçesipînin. Her wekî Şepêla Çep ya ku hewl da hebûna xwe di riya Markisî-Lînînî de îsbat bike, tevî ku ev hizir wê demê dûrî rewşa kurdî bû. Hin partiyên din jî mîrasa Berzanî ji xwe re rêbaz girt bo rewakirina hebûna xwe. Lê bêyî tu girînî bidin rastiya ku gelê kurd dijiya ku diviyabû di xebatên xwe yên siyasî di nava  gelê Rojava de guhertinan çêkin. Hîna jî ev hizir bi her du aliyên xwe yê Çep û Rast bi vê rêbazê berdewam e, rêbaza îsbatkirina rewatiya xwe di nav gel de di riya xwespartin li ser rêbaza malbata Berzanî.

Beşeke din ji van partiyan dixwestin Rojava bikin navend û kerîdor ji van tewereyên cur bi cur re û bi hizira hebûna gelê kurd ku bi dîrok û erdnîgariya xwe di herêmê de kokdar e, ne bawer bûn, her wekî şepêla Rsatgiran.

Tişta balkêş di van partiyên klasîk de ku ew di destpêka xwe de nemaze piştî xurtbûna kampaniyên çewsandin û binçavkirinê armanc û rêbazên xwe yên resen “yekbûn û rizgarkirina Kurdistanê” vedişartin û tenê daxwaza mafên çandî û civakî li gorî pêwîstiyên qonaxa heyî dikirin. Ev yek jî hişt ku ev hizir û rêxistinên siyasî tevlîheviyê bi xwe re bînin û gihaşte asta ku ji xeta xwe ya partîtî derkevin û ber bi bazirganiya siyasî ve biçin. Piştî lawazbûna kampaniya çewsandin û binçavkirinê û di van mercên ku Rojhilata Navîn bi giştî û Sûriya bi taybet tê re derbas dibin, ji serhildanên dijî rêjîmên desthilatdar û zêdebûna derfetan ji van partiyên klasîk re ji bo ku xwe ji nû ve vejîn bikin û bi eşkere tevger bikin bo pêkanîna armancên xwe yên siyasî ku di salên pêncî de nehînî bûn, em dibînin ku ev partî di heman çarçoveyê de man mîna ku hîn di wê qonaxê de dijîn. Dibe ku sedema vê qelsiyê jî ji xwendina wan a siyasî ya şaş ji guhertinên ku li

Rojhilata Navîn diqewimin. Lewre jî em dibînin ku ev partî newêrin armancên xwe di pêkanîna destkeftiyên rasteqîn ji bo gelê Kurd li Rojava zelal bikin, li asta ku mirov dibêje qey ew di rastiya heyî de najîn, her wiha tektîkên berê yên ku "bi sedema mercên ewlehî yên zehmet" dihatin bikaranîn, bû stratejiya van partiyan.

Her çi qas bingeha gelerî ya partiyên tevgera siyasî li Rojava berfireh dibe ji destpêka damezrandina yekem partiya siyasî partiya Apê Osman û hetanî niha, pirsgirêkek heye rastî piraniya van partiyan tê, ew jî nepêşxistina rêzikname û bernameya wan a siyasî ji bo ku ji zêdebûna hejmara kesên nû tevlîbûyî re bibe bersive. Ew jî di riya danîna bernameyên perwerdehî û ronakbîrê yên îdyolojîk û hizirî ji wan alîgir û kesên nû tevlîbûyî re.

Ji ber Rojava rastî destwerdanên dezgehên ewlehî di hemû warên jiyanî yên gel bi giştî û yên partiyan bi taybet dihat û dezgehên ewlehî hewl da prensîpa "parçe bike û hikum bike" di nav van partiyan de bi cih bikin, piraniya nifşên nû û nemaze katêgoriya ciwanan dûrî rêxitinê man li asta ku dûrketin ji tevlîbûna li rêxistinan bû rastiyeke ferizkirî û bicihkirî di hişmendiya kesayeta kurdî li Rojavayê Kurdistanê de, her wiha nasnameya serbixwe bû şêwe û îdyolojiya herî belavbûyî di nav nifşê nû de.

Bi vê yekê kalbûn (pîrbûn) û dubarebûna serokên temen mezin di cihên herî bilind de û bo dehên salan li asta ku rekord şikandin, bû diyardeya herî balkêş di partiyên Kurdî de. Bi vê yekê serkêşên serwer rê li ber derketina serkêşên ciwan, serkêşn pêşerojê yên ku li ser milên wan welat têne avakirin, girt. Tenê mirin dibe sedema sereke ku serkreterên van partiyan têne guherin.

Li aliyekî din, em dikarin bibêjin ku 90% ji partiyên kurdî li Rojava, diyardeya dûrxistina rola jinê ji peywir û cihên rêveberî tê de heye . Yek ji sedemên wê jî ku di makezagona Sûrî de, heta piştî derxistina zagona partiyan li Sûriyê di 2011'an de, tu madeya ku rê bide jinê ji bo ku rêveberiya partiyan bike tune bû. Lê ji bo partiyên kurdî ev nabe bihane ku jin ji rêveberiya partiyan bê drxistin, ji ber ev partî di bingeha xwe de qedexekirî û rênedayî ne û ne mumkin e rêdanê bi dest bixe. Sedema herî sereke ji vê yekê jî hişmendiya zilam ya desthilatdar ya ku di Rojhilata Navîn

de belav bûye û li gorî têgîn û prensîpên wê nahêlin jin bigihêjin cihên bilind di van partiyan de.

Li kêleka wê jî, partiyên siyasî li Rojava tevlîheviyeke mezin jiyan dikin bi sedema nebûna lêvegereke sabit ku di dema nakokiyan de lê vegerin. Ew lêveger jî her tim aliyeke derveyî ye û pirî caran ew di heman demê de aliyê piştgir û peredayî van partiyan e.

Partiyên kurdî bi giştî karîbûn ji destpêka damezrandina xwe ve gelê kurd bi girseyî ber bi xwe ve bîne. Lê bi sedema ku serkêş û kadirên partîtî nekarîbûn berjewemdî û nakokiyên xwe yên kesane bidin alîkî, ev yek gelek caran hişt ku wek bertek yan jî bi sedema nakokiyên civakî yên biçûk, parçebûn ji partiyên mak çêbibin. Di encamê de navên wekhev ji partiya nû re tên lêkirin beriya ku rêzikname, bernameya siyasî û kadirên wê bêne amadekirin û bi nehazirbûna tam ji damezrîner û rêbazê siyasî ya partiyê, ku di çarçoveya tevlihevoyeke partîtî ku di Rojava de diqewme pêk tê û dibe sedem ji reşkirina wêneya tevgera siyasî ji kesê ku ji derve de lê dinêre.

Tişta herî berz di vê lêkolînê de ku serdema “Partiyên klasîk li Rojava” û li cîhanê jî lawaz dibe û bi paş ve diçe û êdî cîhan ber bi kûrkirina rola saziyên sivîl û yên civakî û sîstema komeleyên sivîl li kêleka partiyan ve diçe.

Lewre jî jevketina van partiyan di pêşeroja de êdî pir diyar e, her wiha hewldan veguhertin ji partî bo rêxistin, sazî yan jî komele dê gaveke binketî be heke armanca wê xapandina gel be, ji ber rola herî berz ji sazî û komeleyan ew e ku têkiliya rasteraste bi gel re bo peydakirirnapêdiviyên rojane nemaze ji hêla xizmetguzarî de, ev sazî her tim de rewşa hevrikiyeke dayîm e bo bidestxistina piştgiriya dengê gel di hilbijartinan deû her kesê ku xebat dike bo ku daxwazên gel peyda bike û gel jî ji hêla xwe ve dengê xwe dide wan, lewre jî wan tê xwestin ku şev û roj bixetên da ku gel razî bikin û dengên wan bi dest bixin.

Bo vê yekê, serdema sazîbûnê çareya tekane yeû ya herî serkeftî ye ji Rojva re bo ku xwe ji diyardeya kmbûnên partîtî rizgar bikin.

Di dawî de em dikarin bibêjin ku Apê Osman dijî gelek şepêlan sekinî û di şerekî dayîm dijî têgînên berjewendîyî û kesayetên ne welatparêz de bû, lewre jî dijminên wî lê kom bûn bo ku tesfiya wî ya siyasî bikin û hêviyên wî

di avakirina rêxistineke siyasî ji kurdan li rojavayê Kurdistanê reku wan ji zilm û zora çîna beg û axan "bûrciwazî û feodalên ........" yên kurd û hikûmet û serweriyên şovînîst biparêze û destkeftiyên siyasî û neteweyî ji doza kurdî, têk bibin; lewre jî dev ji jiyana siyasî berda.

Gelo em dikarin bibêjin ku dijminên Apê Osman wê demê bi ser wî ketin ji ber ku ew bi tenê bû? Gelo ew heman dijmin zêde bûn û partiyên nû dan çêkirinû ew bi xwe îro heman kiryaran dijî her rêxistinek yan jî projeyekê ku parastin û mafên rewa ji gelê kurd li rojavayê Kurdistan û Sûriya re misoger dikin, pêk tînin; nemaze îro ew derfetê zêrîn ku bi dest ketiye nayê dubarekirin?

Gelo em dikaroin bibêjin ku ev partî yên ku dijî Apê Osman derdiketin niha kêm bûne û neviyên Apê Osman bi sedhezaran bûne û ne pêkan e ku careke din hêvî, xeyal û xewna yekemîn a Apê di "xelaskirina çîna karker û cotkararan jidestên beg, feoda û birjwazên nû", bê beravêtin û ku xeta Apê Osman di berxwedan, şoreş û têkoşîna bo bidestxistina azadî, çarenûsî û mafên rwea ji gelê kurd re bi ser ketû niha jî bûye rastiyek li rojavayê Kurdistanê û gel li ser wê xetê heyanî dawî dimeşe?

**Belge**:

Belgeyên ku me di vê lêkolînê de der barê tevgera siaysî ya kurdî li Rojava weşandine ev in:

-Hin belgeyên dîrokî der barê yekem partiya siyasî ya kurdî li Rojava.

-Hin wêneyên kesayetn siyasî yên ku xebatên siyasî yên kurdî li rojava dimeşandin.

-Belgeya zagona rêdana partiyên siyasî ya ku ji hêla Rêveberiya xweser a Demokratîkya Kantona Cizîrê hatiye derxistin.

-Wêneyên kesayetên partîtî yên ku tevlî projeya Rêveberiya xweser a Demokratîk bûn.

Rêziknameya Partiya demokratîkên Kurd li Sûriyê P.D.K.S ya ku Apê Osman bi destê xwe û bi zimanê Kurdî ya fermî nivîsandîbû di sala 1956'an de:[(1)]

---

[1] Çavkaniya vê belgeyê mamoste Dilawerê Zengî ye.

-RÊZNAME YA BINGEHÎ

P. K. D. S

**RÊZNAME ya BINGEHÎ**

1) Heya iro tinebûna rêyeke rast û durust li pêş kurdên Sûriyê. ew ji hevxistine û ji hemi heqên siyasi, civaki u zanisti bêpar hiştine. Li pêş vê rastiya tehl u dijwar ‹ hin kurdên welatparêz ji bo parastina birayên xwe ên Sûriyê ji şaşi, sitem û windabûne.bi navê” partiya kurdên demoqratên sûri" komelek anine pê

2)” P.K.D.S” partiyeke azadiperist u pêşveruye ji lewre ji bo welatê xwe suriye rêzaneke demoqrat u gelêr çak dibîne. ji bo pêkanin u danina rêzaneke holê u parastin u firehkirina serbestiyên demoqrasi bi hemi kes u partiyên pêşveru re tevkariyê digire ser xwe

3)” P.K.D.S” ji bo welatê xwe sûriye serxwebûneke tikûz dixwaze. di vê rê de parti bi navê kurdên Suriye şerrê kolidar u nokerên wi dike.

4) çi gava siya kolidar ji ser welatê me Suriye bi dûrkeve u rêya têkiliyên derve bête birrîn,” P.K.D.S” ji bo /400, 000/ kurdên ku li cizire, kaniya ereban u çiyayê kurmênc dijîn, dê” rêzaneke xas” bixwaze. da ku pê heqên wan ên siyasi, civaki u zanisti di nav welatê suriye de bên parastin

5)” P.K.D.S” xebata kurdên Tirkiye, Iran, Iraq u hemi gelên bindest di rêya felat u azahiya welêt u şerrê kolidar de piroz dike. ji bo gihana wan a azadiyê ji tu xêrxwaziyan bi şunde namine.

6) hikûmeta Tirk di welatê xwe u kurdistana bakurr de hin rawestekên leşkeri dane kolidarê şerrxwaz u bi dagirtina aletên ceng ew erd kiriye çeper u asêgehek cenga cihanv ji ber ku bûna cengeke holv dikare kambaxiyeke giran bi ser gelê kurd u welatê ereban de bine.”P.K.D.S" hişyar kirina kurdên tirkiye ji vê rastiya han u bi alikariya birayên xwe ên Ereb hilweşandina wê asegeha kambaxker ji xwere armanceke mezin dinase.

7)” P.K.D.S” di xebata xwe ya komeli de, pişta xwe dide hemi kurdên welatparêz demoqrat u azadixwazên bi rûmet.

8)”P.K.D.S"hemi welat u dewletên hevgel u gelêr u aştixwaz, ji gelê kurd re, yar u xêrxwaz u alikar dinase. ji lewra di hemi xebatên xwe de bê dudili dikare destê xwe bide wan.

9)” P.K.D.S” di cenga alemi de, ji bo cihanê, nemaze ji bo gelên bicuk u bindest ‹ boblat u kambaxiyek mezin dibine. ji lewra bi dil u can digel hemi gelên astixwaz doza astiyê dike. ji ber vê ye ku partiyê, neyariya hemi peymanên leskeri ên şerrxwaz ji xwe re kiriye armanceke bingehi.

10) ji ber ku gelê kurd ji demeke direj ve bindest maye, gelek ramanên vaca di seri bal u baweriyên wi de weki nexweşiyeke cih girtine u ew ji taw xistiye. parti dixwaze bi belavkirina, xwendin, nivisandin, ziman, ramanên hêja u vejandina ruçikên çak u sinçiyên bilind, van nexweşiyan ji canê gelê kurd bi derxîne u rêyeke nuh u taze ji bo peşendeyeke hêja li peş wi veke.

11) beri gihana armanca xwe a bilind, partiyê ji bo pêşvebirina kurdên suriyê di warên civaki u zanisti de, kirina xebatên jêrin daye çav xwe :

DI WARÊ ZANISTI DE

a – çêkirina encumenên zanisti di herêmên kurdi de. b- bi derxistina kitêb, kovar û rojnameyên kurdi ji bo belavkirin, peşvebirin u yekitiya zaravên kurdi.

c – guhertina kitêb u nivasarên biyani ên hêja ji zimanê kurdi re.

c – bideste hikumetê di herêmên kurdi de pirrkirina dibistanan.

DI WARÊN CIVAKÎ DE

a- ji bo pêşvebirina awayê çandin u parastina çandini u dar u ber ji nexweşiyan her rêberiya cotkaran kirin.

b- ji bo ku cotkarên belegaz nekevin nav lepên giravxuran, bi destê hikumetê ji bengên welêt ji wan re deyn pêkanin.

c- ji cihê ku mikun be vekirina xestxane u sêwixanan ji hikumetê xwestin, an bi alikariya dewlemendên xêrxwaz ev celeb kir pêkanin.

ç- ji şagirdên ku ji belengazi nikarin xwendina xwe temam kin li nik xêrxwazan ji wan re alikari pêkanin.

**capxana kerem 1956**

---

## Çavkanî û jêder:

***1-Lîsteya kesên ku hevpeyvînên dengî û vîdeyo bi wan re hatin çêkirin:***

-*Hevpeyvîn bi birêz Cemal Şêx Baqî (Partiya Demokratîk a Kurdî a Sûrî).*

-*Hevpeyvîn bi birêz Mihemed Salih Ebdo (partiya Çep a Kurdî li Sûriyê).*

-*Hevpeyvîn bi birêz Mihemed Ebas (Partiya Kombûn a Niştîmanî a Kurdistanî).*

-*Hevpeyvîn bi birêz Ebdilhemîd Hac Derwîş ku rojnamevan Lalî Xan pê re çêkiribû.*

-*Hevpeyvîn bi birêz Yûsif Dîbo (Çepa Kurdî).*

-*Hevpeyvîn bi birêz Hilal Xelef ya ku bi navê Hilalo tê naskirin.*

-*Hevpeyvîn bi birêz Ebdilrehmen Hisên Bavê Kîm, endamê Partiya Yekîtiya Gel û endamê Komîteya herêmî ya bajarê helebê di navbera 1975-1985'an de, ew endeziyarekî sivîl e û berêrêveberê Saziya Rodko bû / teqwît bû.*

-*Lêkolîna "Nexşeya Siyasî Û Rêxistinî Li Kurdistana Sûriya Di 2008'an De"/ Dilşad Murad.*

-*Lêkolîna "Nexşeya Rêxistinên Kurdî Li Sûriyê Di 2009'an De"/ Dilşad Murad.*

-*Lêkolîna "Rêxistinên Siyasî Yên Kurdî Li Sûriyê Ji Sala 1956'an Heyanî 1986'an" / Ferec Nimir.*

-

***2- Pirtûk û çavkaniyên ku di vê lêkolînê de em lêvegeriyan:***

-*Dilawerê Zengî (Etyaf El-Madî).*

-*Dilawerê Zengî pirtûka Osman sebrî "jiyan, têkoşîn û berhemên wî yên wêjeyî" (1905-1993).*

-*Tevgera neteweyî ya kurdî li Kurdistana Sûriya (1946-1870)/ nivîskar Elî Salih Mêranî.*

-*Kurd û Kurdistan di belgeyên berîtanî de / Dr. Elî Hemîdî.*

-*Pirtûka "peline ji Dîroka Tevgera Rizgarkirina Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê (yan jî dîroka El-Partî)" / Mihemed Mele Ehmed.*

-

***3- Sîteyên elektronîk:***

-*Hevdîtin bi rehmetî Reşîd Hemo bi navê "Hevpeyvîn bi bîranîn re bi çar xelekên wê bi mamosteyî rehemtî Reşîd Hemo re", ku mamoste Hisên Îso pê re çêkiribû.*

-*Navenda Karîngî ya Rojhilata Navîn.*

-*Malperên elektronîk yên fermî yên partiyên kurdî li rojavayê Kurdistanê.*

## Rikberiya Sûriyeyê

Ji salên şêstî yên sedsala bûrî ve, Sûriye di nava rewşeke civakî û siyasî ya tevlîhev de dijî. Sedemên vê yekê jî vedigerin rastiya rêjîma desthilatdar a ku di çareserkirin û belavkirina hemû şerên siyasî û tevgerên ku daxwaza guhartinan di siyaset û binyata desthilata wê de dikirin, hêz û çewisandin bi kar dianî. Ev rewşa siyasî ya tevlîhev ku ev pêncî sal in heye û tunebûna rêgezên demokrasiyê û serweriya olîgarşiyan li ser jiyana siyasî û civakî, her wiha raperînên welatên derdorê ku çêbûn, hişt ku di adara sala 2011'an de alozî biteqe. Li gorî wê jî êdî gelê Sûriyeyê dîwarê tirsê ruxand û li dijî rêjîma desthilatdar rabû li ser piyan. Piştî deh salan ji vê aloziyê û ji ber ku rikberiya Sûriyeyê mîna beriya aloziyê, jihevketî bû; êdî ti daxwazên gelê Sûriyeyê pêk nehatin. Her wiha ev rikberî ne di wê asta birêvebirina miletekî ku dixwaze di welatê xwe de guhartinê pêk bîne de bû û nikaribû hevpeymaneke niştimanî ji Sûriyeya siberojê re ku mafên azadî, rûmet û wekheviyê ji hemû pêkhateyan re misoger bike, damezirîne.

Ev jihvketina di nava komên rikberiyê de û cihêrengiya ajenda û projeyên wan ên siberojê, li kêleka wê jî serweriya rikberiya Islamî ya tundrew ku bi ser rêxistina cîhanî ya Ixwanûlmuslimîn ve ye û alîgirên rêjîma Erdogan e û ajendayên xwe bi ser yên gelê Sûriyeyê re dîtin, alozî zehmetir kir. Dema ku li rewşa siyasî, leşkerî û aborî tê nêrîn, tê xuyakirin ku piştî deh salan ji şerê di navbera hêzên xwecihî, herêmî û navdewletî de, êdî welat di rewşeke xirab de ye. Li kêleka vê jî, hîn mijarên wêranbûna binesaziyê, jihevketina siyasî, dagirkirina hin parçeyan ji welêt û guhartina demografîk; çi ji aliyê dewleta Tirk ve û çi jî ji aliyê rêjîma Sûriyeyê ve, her wiha belavbûna gelek baragehên leşkerî li ser xaknîgariya Sûriyeyê û rewşa aborî ya xirab ku xelkên Sûriyeyê tê de derbas dibin, berdewam in.

Li gorî van faktorên objektîv û subjektîv, tê xuyakirin ku ti hêviyên çareseriyeke siyasî ji aloziya Sûriyeyê re xuya nakin û çareseriya leşkerî, koçberkirin û wêrankirin ji çareseriya siyasî bêhtir têne hezkirin. Anku li pêşiya gelê Sûriyeyê yê ku niha nîvê wî derbider e û nîvê din jî birçî ye,

kuştin û wêraniyeke mezintir hene. Di van rewşên niha yên xirab de êdî jiyaneke aram û birûmet ji bo gelê Sûriyeyê, xewnek û xeyalek e.

Pêdivî bi nirxandina rikberiya Sûriyeyê bi hemû aliyên wê û nêrînên ve, bi rêya rola wê ya di berdewamkirina aloziyê de ku piştre bû parçeyek ji aloziyê, heye. Nemaze siyasetên wê yên ku bûn sedema zêdebûna fetisandin, jihevxistin û bêbaweriya ku di nava pêkhateyên Sûrî de pêk anîne, her wiha helwestên wan ên dijberî gelê Kurd û doza wî. Ev yek bi xwespartina şopandina bûyerên siyasî, hin serjimêrî û raporên mafnasî yên têkildarî aloziyê, her wiha hin nêrînên kesayetên ku ketine nava xebatên siyasî yên vê aloziyê de, pêk tê.

Lewre jî dê ev lêkolîn dabeşî du beşan bibe. Beşa yekem dê hewl bide ku nêrîneke giştî li ser rewşa siyasî û leşkerî ya hêzên rikberiya Sûriyeyê zelal bike. Dê ev beş mîna amadekariyekê ji bo beşa duyem be ku tê de dê çalakî û xebatên rikberiya Sûriyeyê ji destpêka aloziyê ve heyanî ku digihêje siberoja rikberiyê di rewşa tunebûna yek nêrîna çareseriyê de, binirxîne.

## Beşa yekem – Nêrîneke giştî li ser rewşa siyasî û leşkerî ya rikberiya Sûriyeyê.

### Rewşa siyasî ya rikberiya sûriyeyê:

Bê guman aloziya Sûriyeyê di encama siyasetên şaş ku ji piştî serxwebûna Sûriyeyê ve welat pê hatiye birêvebirin de, pêk hatiye; anku darbeyên leşkerî, paşguhkirina rêgezên demokrasiyê û tundrewbûna di baweriyên neteweyî û olî de. Şerê li ser desthilatdariyê ji piştî veqetandina ji Misirê di sala 1961’ê de bêhtir zêde bû. Piştî ku pariya Bas’ê bi darbeyekê dest danî li ser desthiatdariyê, êdî yasaya awarteyê di sala 1963’an de pêş xist û welat li gorî wê bi rê ve bir. Vê yasayê rê da desthilatdariyê ku destwerdanê di nava hemû hûrgiliyên jiyana hemwealtiyê Sûrî de bike û di bin navê girtina parêzî de, bi awayekî bêzagon ew didane girtin. Her wiha hemû karên siyasî û rojnamegerî qedexe kirin û xistin destên alîgirên vê partiyê tenê û  hemû endamên ku rikberiya desthilatdariyê dikirin, bi hemû rengên wan dane girtin. Her wiha tevgera hemû partiyên siyasî yên ku li dijî rêbaza partiya Bas’ê bûn, bi rêya avakirina Eniya Niştimanî Ya Pêşverû ku di nava xwe de gelek partiyên cihêreng dihewandin, felc kir. Bi rêya vê eniyê êdî destilata navendî wiha xwe da diyarkirin ku di rêvebirina vî welatî de

pirengiya siyasî heye. Vê eniyê di nava xwe de Partiya Komunist, Paritya Yekîtiya Sosyalîst, Partiya Yekîtîparêzên Sosyalîst, Tevgera Sosyalîstên Ereb û ji bilî wan jî dihewand û li gorî madeya heştan a makezagona Sûriyeyê ku partiya Bas'ê mîna partiya rêber ji civak û dewletê re dibîne, yekser di bin serweriya partiya Bas'ê de bûn. Êdî nikaribû ti atmosfêreke siyasî pêk bîne ku bi xwe re demokrasî û dadmendiyê mîna ku di axaftinên xwe yên îdolojîk de digot, bîne.

Van siyasetan komek ji pirsgirêkên hundirîn bi xwe re anîn, ji wan jî yên berztirîn ev bûn: Şerê xwînî yên di navbera her du xetên neteweyî û olî de (di navbera Basî û Ixwanûlmuslimîn e)[1], lewaziya nasnameya niştimanî ya hinek pêkhateyên Sûrî yên ne Ereb ku ji ber siyaseta çewisandinê ya desthilata navendî ya der barê mafên mirovan û tunebûna demokrasî û dadmendiyê di birêvebirina welêt de, pêk hatin. Her wiha gendeliya darayî û rêveberî di saziyên dewletê de. Li kêleka wê jî derketina hin komikên rikberiya li dijî desthilata navendî ku her yekê ji wan rêbazeke taybet da meşandin. Ev komikên rikberiyê nebûn yek û nikaribûn pêşketin û geşedanê di welat de pêk bînin, piraniya wan mîna bertekekê li desthilata stemkar û kiryarên wê bûn, her wiha her yekê ji wan dixwest ku li gorî nêrîn û rêbaza xwe, xwe bigihîne desthilatê.

Piştî ku rêjîma niha di sala 2000;î de hat li ser desthilatê, êdî qonaxeke ku ji derve ve bi lêvebûna siyasî dihat diyarkirin dest pê kirin û bi nermahiyeke sînordar hin tevgerên siyasî yên rikber bi ser xwe ve kişandin û hin çalakikiyên xwe yên siyasî eşkere kirin. Ji nava wan jî ya her berz tevgera bi navê "Buhara Şamê" bû. Ev tevger ji aliyê hin rewşenbîrên li Şamê yên mîna Kemal El-Libwanî, Arif Delîla, Riyad Seyf, Hisên El-Odat û ji bilî wan ve pêk hat. Di vê qonaxê de hin komcivînên nefermî pêk hatin, her wiha banga demokrasîkirina welat, tunekirina yasaya awarteyê, vekirina deriyê pirengiya siyasî û guherîna desthilatê, danîna sînorekî li pêşiya

[1] Şerê li ser desthilatdariyê yê di navbera Basî û Ixwan El-Mislimînan de bûyerin bixwîn ku bandora wê bi awayekî neyînî li ser welêt çêbû û nasnameya niştimanî lewaz kir, bi xwe re anîn. Di sala 1980'î de desthilata navendî yasaya nimre 49 ku dibêje hemû kesên di nava Ixwan El-Mislimîn de divê werin îdamkirin, derxist. Lutkeya vî şerî di sala 1982'an di şerê Hemayê de bû, piştre êdî Ixwan El-Mislimîn lewaz bûn. Lê belê ev yek ne bû sedem ku ev kom dîsa xwe rêxistin neke, nemaze piştî ku fermandarên wê yên mayî derketin derveyî welêt.

desterseriya partiya Bas'ê ya li ser desthilatê û vejandina civaka sivîl û ji bilî wan, derketin pêş. Ev yek bi rêya daxuyaniya bi navê "Daxuyaniya 99'an" ku li gorî hejmara beşdariyên di daxuyaniyê de nav lê hat kirin û piştre jî daxuyaniya bi navê "Daxuyaniya 1000'î" ku tê de daxwazin girantir ji bo pirengiya siyasî hebûn, pêk hat. Lê belê ev çalakî û komcivînên siyasî yên vekirî rastî stemkarî û çewisandina desthilata navendî hat ku piştre jî dethilat dîsa vegeriya siyasetên xwe yên çewisandinê yên berê. Bi tevî lihevkirina rikberiyê ya di sala 2006'an de li ser hevpeymana yekîtiyê, lê belê dîsa jî belav û jihevketî ma. Êdî rewşa siyasî ya welat wiha ma.

Piştî teqandina raperîna gel a li dijî rêjîmê di sala 2011'an de, êdî rikberiya Sûriyeyê ya ku rêbaza Islama tundrew dimeşîne, livûtevgera gel ji xwe re bi kar anî û xwe wek nûnerê gel dît. Hinek ji wan jî berê xwe dane şerê çekdarî da ku Sûriyeyê veguherînin qadeke şerê siyasî û leşkerî yê di navbera rikberiyê xwe bi xwe de ji aliyekî ve û ji aliyê din ve jî di navbera rikberiyê û rêjîmê de. Êdî aliyên şer nikaribûn hevpeymaneke niştimanî ku hemû pêkhate û xetên siyasî bîne cem hev, ava bikin, her wiha nikaribûn xwe bixin xizmeta gel û welêt. Lê belê bûn mîna çeteyên siyasî di destên hin hêzên herêmî û navdewletî de yên ku ji bo desthilatên di herêmê de, di nava pevçûnan de ne. Van pevçûn û nakokiyan gelek komên siyasî yên rikberiya Sûriyeyê derxistin. Em ê hinek ji van koman ên ku di dema aloziya Sûriyeyê de pêk hatine û bi awayekî serbixweyî koma din dixebitin û nêrîneke wan a cuda ji bo çareseriyê heye, bînin ziman. Êdî em li pêşberî gelek komên rikberiya li dijî desthilata navendî ne. Di heman demê de jî ev rikberî di nava xwe de li dijî hev in; lewre jî dê azarên hemwelatiyên Sûriyeyî û tevlîheviya di welat de, di demeke kurt de bi dawî nebin. Ji van koman jî yên berztirîn ev in:

**Komên siyasî yên di bin serweriya Ixwanûlmuslimîn de:**

Koalisyona Niştimanî ya hêzên şoreşê û rikberiya Sûriyeyê ya ku di mijdara 2012'an de li paytexta Qeterê Dewhayê hat avakirin û Tirkiye ji xwe re kiriye biryargeh, berzirtirîn komên siyasî ye. Ev koalisyon, di nava xwe de encumena niştimanî Sûrî, desteya giştî ya şoreşê, komîteyên hevrêziyê, encumena niştimanî Kurdî û ji bilî wan jî, dihewîne. Herî dawî jî gerînegndeya serbixweyên Kurd û encumena êlên Sûriyeyê ku bi ser rêjîma Erdogan ve ne, tev li wan bûn. Koalisyon ji destpêka xwe ve, ji ber

pragmatiyên xwe di gelek guhertinan de derbas bûye û ji ber nakokiyên tund ên di navbera wan de, gelek kesayetan dev jê berdan û jê veqetiyan. Her wiha gelek nakokiyên wan bi mase û hêzên din ên rikberiyê re hene, mîna Maseya Moskova û Qahirê, Desteya Hevrêziyê ya Niştimanî û Meclisa Sûriyaya Demokratîk. Her wiha beşdarî gelek civînên navdewletî û herêmî yên der barê Sûriyeyê de bûye û wek berztirîn pêkhateyên Desteya Bilind a Danûstandinan e. Di sala 2013'an de, Koalisyonê bi destekdayîna dewleta Tirk ji bo birêvebirina herêmên di bin serweriya milîsên wê yên çekdar de ne, hin sazî dane avakirin û navê "Hukûmeta Demkî ya Sûriyeyê" lê kir. Lê belê wê ti herêmeke rizgarbûyî bi rê ve nebir; hemû herêmên di bin dagirkeriya Tirkiyeyê de, bi rê ve birin. Raporeke ku ji aliyê peymangeha Xizmeta Lêkolînên Kongrêsê ve derketiye, hukûmeta demkî wiha da nasîn:" Hukûmeta Demkî ya Sûriyeyê bi awayekî fermî desthilata ku herêmên di bin serweriya komên çekdar ên ji aliyê Tirkiyeyê ve têne destekirin û biçekirin e. Nemaze herêma Mertala Firatê ku herêmên bakur û bakur-rojhilatê Helebê digire nava, herêma Şaxê Zeytûnê ku Efrînê bakur-rojavayê Helebê digire nava û herêma Kaniya Aşitiyê ku herî dawî xist bin serweriya xwe. Lê ji aliyê pratîkî ve Tirk van herêman bi rêya wekîlên xwe yên ji komên çekdar û sivîlan ên cihêreng, bi rê ve dibe."[2] Lewre jî gengaz e ku koalisyon û komên siyasî û çekdarî yên bi ser wê ve, wek çeteyên siyasî û leşkerî li cem dewleta Tirk ji bo pêkanîna berjewendiyên wê û planên wê yên kevin ên der barê welêt de, werin dîtin. Di nava stratejiya wê de ev jî hene: Têkbirina rêveberiya xweser a bakur û rojhilatê Sûriyeyê û hêzên wê (QSD), niştecihkirina malbatên çeteyên Daiş'ê û komên Tirkmen di bajarok û gundên Kurdan ên dagirkirî de; mîna berdewamkirina projeya çaksaziya rojhilat (1925) û kemera Erebî (1965), her wiha belavkirina hebûna Kurdî bi rêya koçberkirina bizorê û guhertina demografîk û geşkirina çanda dijminatiyê di navbera pêkhateya Kurd û Ereb de. Li kêleka vê jî hewldanên wê yên ji bo gihandina alîgirên xwe li ser desthilata siyasî û leşkerî ku dê di siberojê de welat bi rê ve bibin. Diyar e ku çarenûsa koalisyonê bi hebûna Tirkan a li herêmê ve girêdayî ye.

[2] Congressional Research Service- Armed Conflict in Syria: Overview and U.S. Response- Updated July 27, 2020- p21- https://fas.org/sgp/crs/mideast/RL33487.pdf

**Komên siyasî yên bi ser El-Qaidê ve:**

Desteya Rizgarkirina Şamê (Heyet Tehrîr El-Şam) anku bi navê xwe yê berê Cebhet El-Nusra, şaxek ji şaxên El-Qaidê ye û dikaribû di aloziya Sûriyeyê cihekî girîng bi dest bixe. Her wiha ji aliyê dewletên rojava û di serî de Amerîka ve ketiye lîsteya terorê de ku her demekê Amerîka cihên wan ên li Idlibê bombebaran dike. Ji bo ku cihê xwe di pêvajoya siyasî de bigire, di dawiya sala 2017'an de di bin navê "Hukûmeta Rizgarkirinê" de hinek saziyên rajeguzariyê dane avakirin; ku li herêma Idlibê û hin cihin ji gungdewarên Hema û Helebê, dibistanan û hêzên ewlekariya hundirîn bi rê ve dibin. Ev hukûmet danpêdanê bi koalisyona Sûriyeyê û hukûmeta wê ya demkî nake û di gelek boneyan de jî hin nivîsgehên bi ser wê ve yên li di herêmên xwe de, girtin. Li vê herêmê di navbera wan û koma Ixwanûlmuslimîn de ji bo desthilatdariya li ser niştecihên ku ji berê ve di encama bombebaran artêşa Sûriye û Rûsiyayê de di rewşeke xirab de ye, pêşbazî heye. Ev hukûmet di siyaseta xwe ya rêvebirinê de dike armanc ku hemû herêmên di bin serweriya xwe de di demeke kurt de, bi rêya pêkanîna şerîheta Islamî ya ku li gorî xwe dide meşandin û neguhdana bi yasayên sivîl û rêgezên demokrasiyê, bike mîrnişîneke Islamî. Ji xwe bi hêzên siyasî yên çalak û bi taybetî rêveberiya xweser re, di nava şer û nakokiyan de ye. Bi gelemperî çarenûsa desteyê û hukûmeta wê bi lihevkirinên di navbera Tirkiye û Rûsiyayê de yên ku di her demekê de bazaran li gorî berjewendiyên xwe li ser xaka Sûriyeyê çêdikin ve, girêdayî ye.

**Komên siyasî yên li bakur û rojhilatê Sûriyeyê:**

Rêveberiya xweser a bakur û rojhilatê Sûriyeyê ku di 21'ê çileya 2014'an de hat avakirin û Meclisa Sûriyaya Demokratîk ku li Dêrikê di 8.9-12-2015'an de hat avakirin, berztirîn komên siyasî yên li herêmê ne. Di nava xwe de bi dehan komên siyasî û leşkerî yên xwecihî dihewînin. Her wiha rêveberiya xweser ji wan nimûneyên nûjen e ku rê ji gel re vedike da ku bi rêya komîn û şaredariyan rajeguzariya xwe bikin. Her wiha rê dide rola jinê û ciwanan di beşdarî jiyana siyasî, aborî û leşkerî bibin. Ev yek ne li gorî hesabên rêjîmê û rikberiya bi ser Ixwanan ve ku xwedî hişmendiyeke nijadperest in, tê. Lewre jî vê rêveberiyê ji bo projeyên xwe yên siyasî, neteweyî û olî mîna metirsiyekê dibînin; çi ku projeya dewleta demokrat ku

hemû pêkhateyan di nava xwe de dihewîne, dide pêş. Her wiha ji ber ku vê rêveberiyê dikaribû ewlehiyê ji derdora pênc milyon nişteihî re peyda bike, hemû pêkhate li derdora wê civiyane, rêgezên demokrasî û zanistperweriyê ku di ti demekê de li vî welatî peyda nebûne peyda dike, rêxistina Daiş'ê têk bir, gelek hevpeyman bi Neteweyên Yekbûyî re girê dane û nûnertiyên xwe li derve vekirine, rêjîm û rikberî wê ji xwe re dijberekî siyasî, leşkerî û aborî dibînin. Rikberiya niha û nemaze koalisyona Ixwanî, mîna bendekê li beramberî hemû projeyên demokrasiyê li Sûriyeyê radiwestin. Lewre jî bi tundî li dijî rêvberiya xweser derdikevin; çi ku vê rêveberiyê ne rêbazên wan û ne jî proje û duruşmeyên wan ên der barê aloziyê de, nedane meşandin.

Meclisa Sûriyaya Demokratîk sîwan û lêvegera siyasî ya rêveberiya xweser a bakur û rojhilatê Sûriyeyê û Hêzên Sûriyaya Demokratîk e û ew xwedî maf e ku beşdarî hemû pêvajoyên danûsatndinê yên derve bibe. Li gorî rêziknameya mecilsê[3], bijardeya çareseriya siyasî ya bi rêya danûsatndinan, rêya tekane ya rizgarkirina welêt e. Her wiha ev meclis xwe digihîne hemû aliyên rikberiya niştimanî ku berê xwe didin çaeseriya siyasî. Meclis, ezmûna rêveberiya xweser wek nimûneya çareseriyê ji bo tevahiya Sûiryeyê, dide pêş û dike armanc ku Sûriyeyeke demokrat û nenavendî ava bibe û makezagoneke nû jê re were danîn ku mafên hemû pêkhateyan winda neke. Ji aliyekî din ve jî hewl dide ku rê li pêşiya hemû hêzên rikberiyê paqij bike û hemû nêrînên siyasî bike yek[4]; tişta ku van hewldanên wê tekez dike, îmzekirina nameya lihevkirinê bi partiya Vîna Gelêrî (maseya Moskovayê), her wiha lihevkirina li ser pênc xalan ji bo dawîanîna li aloziya Sûriyeyê, vekirina derfetên guftûgoyê bi desthilata navendî re û bangkirina hemû hêzên rikberiyê yên ku banga demokrasiyê dikin da ku bikevin nava guftûgoyan. Têkiliyên meclisê bi hin hêzên herêmî û navdewletî mîna Misir û Amerîkayê re xurt in û nûneriya wê li her du dewletan jî heye. Lê belê armancên meclisê rastî dijberiya koalisyona bi ser Tirkiyeyê û Qeterê ve, Heyet Tehrîr El-Şam û desthilata navendî tên û li gorî Vîtoya Tirkiyeyê ji gelek civînên ku der barê Sûriyeyê de pêk hatin, meclis hat dûrxistin. Lê

[3] Malpera fermî ya Meclisa Sûriyaya Demokratîk "Belgeya siyasî ya Meclisa Sûriyaya Demokratîk (MSD). Bê dîroka weşandinê. Link: https://m-syria-d.com/?page_id=8821

[4] Hevdîtinek bi rêzdar Sîhanok Dîbo re, nûnerê berê yê MSD li Misirê.

belê rêzeserdanên şandeyên Ewropî û rojavayî yên li bakur û rojhilatê Sûriyeyê amaje dikin ku ti dijberiyeke navdewletî ji projeya siyasî ya rêveberiya xweser re li herêmê, tune ye.

**Der barê deste û maseyên siyasî de:**

Li kêleka hêzên rikber ên sereke ku xwedî hêzên çekdar in, komek ji rêxistinên siyasî heye ku xwedî nêrînên taybet in der barê çareseriya siyasî ya aloziyê de, mîna deste û maseyan derdikevin pêş. Ji van rêxistinan ên berz ev in:

**Desteya Hevrêziyê ya Niştimanî:**

Desteya Hevrêziyê ya Niştimanî di sala 2011'an de hat avakirin û serokatiya wê jî Hesen Ebdilezîm e. Deste di nava xwe de hejmarek ji partiyên zanistperwer dihewîne, mîna partiya Yekîtî Sosyalîstî Erebî Demokrat, partiya Kar a Komunîstî Sûrî, partiya Yekîtiya Suryanî û ji bilî wan dihewîne[5], li kêleka wan jî hinek partiyên Kurdî mîna Partiya Yekîtiya Demokrat û Partiya Demkratî Kurdî jî hene, lê belê partiyên Kurdî ji ber helwesta neyînî ya desteyê ya der barê doza Kurdî de, jê vekişiyan. Nêrîneke taybet a desteyê der barê çareseriya aloziyê de heye; destwerdana derve û şerê çekdarî red dike, her wiha armanca wê ya dawîn ne hilweşandina rêjîmê ye, lê belê pêkanîna guherîneke demokratîk di welêt de ye. Têkiliyên desteyê, ji bilî koalisyona Sûrî, bi hemû maseyên siyasî û rikberiyan re heye. Her wiha ew mîna alternatîva zanistperwer ji koalisyona Sûrî re derdikeve pêş. Li beramberî wê jî koalisyona Sûrî wiha li desteyê dinêre ku alîgirê rêjîmê ye, ji ber ku xebatên xwe li Şamê dide meşandin. Bi tevî vê jî ew beşdarî gelek civînên ku der barê Sûriyeyê de pêk hatine, bûye û ew di maseya Riyadê de nûner e (Desteya Bilind a Danûstandinan).

**Maseya Qahirê:**

Maseya Qahirê di sala 2015'an de piştî kongreya Qahirê ya rikberiya Sûriyeyê hat damezirandin û navenda xebatên wê yên siyasî jî paytexta Misirê Qahire ye. Di nava xwe de gelek kesayetên siyasî û hunerî mîna

---

[5] Malpera desteya hevrêziyê ya niştimanî. Partiyên desteyê. Bê dîroka weşanê. Link: https://syrianncb.com/%d8%a3%d8%ad%d8%b2%d8%a7%d8%a8-%d8%a7%d9%84%d9%87%d9%8a%d8%a6%d8%a9/

lîstikvan Cemal Silêman, Cihad Meqdisî û Firas Xalid û ji bilî wan jî, dihewîne. Danûsatandina wê bi Meclisa Sûriyaya Demokrat û Desteya Hevrêziyê ya Niştimanî û ji bilî wan re jî, heye. Pê re jî endama maseya Riyadê ye (Desteya Bilind a Danûstandinan). Mase bi nêrîna siyasî ya Misirê û Kendavê (ji bilî Qeterê) re lihevkirî ye. Lê belê xebatên siyasî yên maseyê lewaz e; çi ku her kesek di maseyê de xwedî nêrîneke taybet e.

**Maseya Moskovayê:**

Maseya Moskovayê di sala 2014’an de li Rûsiyayê hat damezirandin û serokê wê, serokê partiya Vîna Gelêrî Qedrî Cemîl e. Têkiliyên maseyê bi rikberiyên din re hene û endama Desteya Bilind a Danûstandinan e jî. Serokê partiya Vîna Gelêrî Qedrî Cemîl di tebaxa 2020’an de bi Meclisa Sûriyaya Demokrat re nameya lihevkirinê ji bo dîtina çareseriyeke siyasî ji aloziya Sûriyeyê re bibînin, îmze kir. Ev mase bi nêrîna siyasî ya Rûsiyayê ya der barê aloziya Sûriyeyê re ye; lewre jî daxuyaniya Cinêvê **1** û biryara **2118** a ji bo avakirina hukûmeteke demkî û guhartina Beşar El-Esed, red dike.

**Maseya Riyadê:**

Maseya Riyadê (Desteya Bilind a Danûstandinan) piştî kongreya rikberiya Sûriyeyê li paytexta Siûdiyê Riyad di çileya 2015’an de, hat damezirandin. Di damezirandina desteyê de koalisyona Sûrî, hin komên çekdar, desteya hevrêziyê ya niştimanî û kesin serbixwe, beşdar bûn. Di sala 2017’an de piştî kongreya (Riyad 2) deste hat berfirehkirin; li gorî wê jî maseya Qahire û ya Mokovayê di nava xwe de hewandin. Ev yek li gorî destekdayîna hin hêzên herêmî pêk hat, di serî de Siûdiyê ku hewl da rikberiya Sûriyeyê di bin sîwanekê de bike yek da ku di danûstandinên bi rêjîmê re û di kongreyan de, bi tenê şandeyekê beşdar bibe. Ev deste (maseya Riyadê) beşdarî danûstandinê Cinêvê û yên komîteya destûrî ya niha, bû. Deste çend xalan dide pêş, ji wan jî parastina yekîtiya Sûriyeyê û avakirina pergaleke nû ku tê de cihê desthilata Şamê nebe, ne. Lê belê hemû hewldanên dewletên garantor bi bin ketin; çi ku deste ji destpêka damezirandina xwe ve di nava nakokî û aloziyan de bû. Gelek kesayet ji vê desteyê veqetiyan, mîna Suhêr El-Etasî, Riyad Hicab û ji bilî wan. Di dema niha de koalisyona Sûrî ya ku ji aliyê Tirkiyeyê ve tê destekirin, serweriya desteyê dike û endamê koalisyonê Enes El-Ebda serokatiya wê dike. Tê

zanîn ku di civîna erkdarkirina Enes El-Ebda de maseya Qahire, maseya Moskova û desteya hevrêziyê ya niştimanî beşdar nebûn û ew êdî nema beşdarî civînên rêxistinî yên desteyê dibin. Di encama van nakokiyên kûr de êdî wezareta karên derve ya Siûdiyê karê wan da rawestandin heyanî ku li ser yek nêrînê ji bo birêvebirina desteyê, li hev bikin.

Li kêleka van mase û desteyên siyasî yên ku me anîn ziman, hinek maseyên din hene, lê bandora wan pir tune ye. Mîna maseya Astanayê ku Renda Qesîs serkêşiya wê dike û di sala 2015'an de bi destekdayîna Kazaxistanê hat avakirin. Maseya Beyrûtê ku di sala 2017'an de hat avakirin û alîgirê rêjîma Sûriyeyê ye. Maseya Şamê ku di sala 2020'an de wek rikberiya hundirîn li dijî desthilatê, hat avakirin. Maseya Himêmîm ku di sala 2015'an de ji aliyê Rûsiyayê ve hat avakirin. Her wiha hin kesayetên serbixwe ku ti giraniyeke wan li ser xaka Sûriyeyê nemaye; ew jî ji ber binkeftina wan di birêvebirina rikberiya Siyasî de. Ji van maseyan re ti binyateke siyasî û leşkerî li ser xaka Sûriyeyê tune ye û bandora wan li ser guherînên di qada Sûriyeyê de, pir kêm e. Lê belê rewşa siyasî li derdora çend aliyan tê gerandin, mîna rêjîma Sûriyeyê, rêveberiya xweser a bakur û rojhilatê Sûriyeyê, koalisyona Sûrî ya Ixwanî û komên bi ser El-Qaidê ve.

Binkeftina hêzên rikberiyê ji bo dîtina çareseriyeke siyasî ji aloziya Sûriyeyê re, bû sedem ku bibin ew bi xwe asteng li pêşiya çareserkirina aloziyê. Ev yek dihêle ku mirov li sedemên ku rikberî gihandiye vê rewşa niha, bigere.

**Rewşa leşkerî ya rikberiya Sûriyeyê:**

Der barê rewşa rikberiya leşkerî de, di destpêkê de ev mijar têkildarî hin fermandarên mezin ên ku ji aliyê hin xetên siyasî ve dihatin destekirin, bû û li gorî wê jî rêzedarbeyên leşkerî pêk hatin. Lê belê piştî hatina Bas'ê li ser desthilatê û kontrolkirina li ser asrtêşê û hêzên çekdarî, ti rikberiyeke leşkerî nema. Tenê şerê çekdarî di navbera aliyê leşkerî yê Ixwanûlmuslimîn û desthilata Bas'ê de ma; ev yek bi binkeftina Ixwanan bi dawî bû. Li gorî vê jî bi temamî rikberiya leşkerî ya li dijî desthilata navendî, hat têkbirin. Lê belê vê aloziyê û piştî rêjîm û rikberiya tundrew karibûn raperîna gelêrî bikin leşkerî, êdî komek ji hêzên cihêreng ên rikerbiya leşkerî ya li dijî

desthilatê derketin holê û bi sedema wan xaknîgariya welêt di nava wan de hat parçekirin.

Vê demê erdnîgariya Sûriyeyê di navbera sê hêzên leşkerî de dabeş bûye. Hêzên Rêjîma Sûriyeyê piştî rêzoperasyonên leşkerî, bi piştgiriya Rûsya û Îranê 65% rûbera welatî kontrol kir û gelek dever ji destên Rikberiyê derxistin. Hêza duyem, Hêzên Sûriya Demokratîk e ya ku li deverên bakur û rojhilatê Sûriyeyê bi cih dibe û nêzî çaryeka welat di destên wê de ye. Hêzên Sûriya Demokratîk bi piştgiriya Hevpeymana Navneteweyî ya Şerê Terorê karî di adara sala 2019an de Rêxistina Daişê têk bibe. Ev hêzên han berdewam rastî gefên Tirkiyeyê û komikên bi ser wê ve tên ku Tirkiyeyê çend deverên QSDê dagir kirin. Hêza sêyem deverên din yên mayî ji welat kontrol dike. Hebûna vê hêzê li Idlibê û deverên ku Tirkiyeyê ew dagir kirine "Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî" sînordar dibe. Hêz li du koman belav dibe; komeke cîhadîst û radîkal ku di lîsteyên terorê de bi destê Amerîkayê, Yekîtiya Ewropayê û Neteweyên Yekbûyî hatiye rêzkirin. Her wekî Heyet Tehrîr-iŞam (li gor amarên Neteweyên Yekbûyî hejamra çekdarên vê hêzê 12-15 hezaran ye6) û Huras el-Dîn (hejmara endamên wê 3500-5000 çekdarî ye û nîvê wan biyanî ne) yên girêdayî el-Qayde. Koma din alîgira Tirkiyeyê ye û weke çete jê ra kar dike (halê hazir hemû di rêxistineke leşkerî de di bin navê Artêşa Niştimanî de hatine komkirin). Ev hêzên han bi taybet ji bo şerê QSDê û têkbirina Rêveberiya Xweser hatine sazkirin û di dagirkirina çend deverên navbihûrî de bûne alîkar. Lewre tu çalakî yan operasyonên leşkerî li dij hêzên Rêjîma Sûriyeyê li deverên ku ji destê Rikberiyê derketine pêk neanîne. Hevrikî û milmilane di navbera her du koman de heye, Tirkiye li gor girêbestên xwe bi Rûsyayê re dixwaze Cebhet el-Nesra jev bixe û bihelîne, lê komikên cîhadîst li hember helandinê li ber xwe didin. Di heman demê de Dagirkeriya Tirkiyeyê dibe sîwanek ji bo Cebhet el-Nesre ku pê re dibe alîkar ku Rêjîm û Rûsya êrîşî deverê bikin. Hêza dawîn ya mayî ya ku bi tenê li çend deverên biçûk dimîne, Rêxistina Daişê ye ku vê demê çalak bûye û êrîşên xwe li dij hem leşkerên Rêjîma Sûriyeyê hem QSDê pirtir kirine. Li gor amarên berpirsên

---

[6]Congressional Research Service- Armed Conflict in Syria: Overview and U.S. Response- Updated July 27, 2020- p16- https://fas.org/sgp/crs/mideast/RL33487.pdf

amerîkî, hejamara hêzên Daişê li Sûriye û Îraqê 14000-18000 şerkerî ye[7]). Li kêleka hêzên navbihûrî baregehên leşkerî yên Tirkiye, Rûsya, Îran û Amerîkayê li deverên belavbûna hêzên wan hene.

**Beşa duyem- Rola hêzên Rikberî û Koalisyonê di berdewamkirina kirîza sûriyeyê de**

Rikberiya Sûriyeyê, di serî de Koalisyon, hema hema wekî Rêjîma Sûriyeyê berpirsyariya domkirina êş û janên gelê Sûriyeyê seranserî deh salên bihûrî radike. Çimkî ji destpêka damezrandina wê ve, Rikberî di gelek qonaxên parçebûn û belavbûnê re derbas bûye, her wiha gelek nakokî û nelihevî di nav wê da çêbûne. Li kêleka vê yekê jî armancên wê yên siyasî ne zelal in. Lewre ji dêl ku Rikberî doza hemwelatiyên Sûriyeyê binimîne, nûnertiya ajandayên dewletên navneteweyî û herêmî li xaka Sûriyeyê kir. Bi vî awayî şer û pevçûn bûne beşek ji jiyana gelê Sûriyeyê û di encamê de bi hezaran kes der bi der bûn û hêviya vegera li deverên xwe ji dest dan. Bi giştî û li gor xalên navbihûrî, faktorên subjektîv û objektîv hene ku dibin sedemên berdewamiya kirîza Sûriyeyê.

**Faktorên subjektîv**

Ev faktor girêdayî du şopan in; şopa yekem: Têkiliyên hindirîn di navbera rikberiya siyasî de. Şopa duyem jî girêdayî helwesta wê ji doza kurdî ye.

**Têkiliyên hundirîn di navbera rikberiya siyasî de**

Xîtaba tîrebaz (taîfî) ya radîkal li nik gelek hêzên Rikberiya Sûriyeyê di ser nasnameya niştimanî û demokratîk re hat dîtin. Dixuya ku wan bi tenê xema guhartina stemkariya beisî bi radîkaliya Ixwanan dixwar. Ji despêka raperînê ve, ev xîtaba tîrebaz kir ku piraniya kurd, dirzî, elewiyên rikberê desthilatê û bi heta piraniya ereban tev li refên rikberiya siyasî û leşkerî nebin û bi vî awayî siloganên wê û projeya wê ya siyasî bi xwe negirtin. Ne tenê wiha, bi ser ve zêdetir vê xîtabê rajeya Rêjîma Sûriyeyê kir û bû sedem ku hin pêkhateyên civakê xwe bidin dora Rêjîmê, çimkî Rêjîmê karîbû wan bide qanikirin ku heke ew ji deshilatê rabe, dê pêkhate bi destê Ixwanan û komikên bi ser wan ve tûşî qirkirineke nijadî ya tîrebaz werin.

[7] Heman jêder

Nerîneke dûrûdirêj li nik Rikberiyê nebû û her tişt heta piştî ketina Rêjîma Beşar el-Esed taloq dikir, loma hemû pêkhate jê biguman bûn ku bikare şûna Rêjîma Sûriyeyê bigire û cihê piştgirêdanê be. Îdiyolojiyeke niştimanî û destnîşankirî, fermandariyeke xwedî karîzma û desteyeke birêxistî û navendî li bal Rikberiyê nebû, ji ber vê yekê gelek platform û laşên siyasî di hundirê Rikberiyê de saz bûn. Bi vî awayî Rikberî bi şandên cuda cuda û bi nerînên ciyawaz tev li her civîneke girêdayî Sûryeyê dibû, loma baweriya cîhanê, di serî de gelê Sûriyeyê bi Rikberiya Sûriyeyê nema. Xalên ku bûn sedem ku bi yek carî ev bawerî bişke ev in: Rikberî ji êş û janên sûriyan dûr û wan piştguh dike, gendeliya di Koalisyonê de, pereyên ku ji gelê Sûriyeyê re dihatin didizîn û li xwaringeh û xewgehan dixistin yanî ji dêl ku bi doza gel ve mijûl bibûya; gelê ku di bin topbaran û bombebarana Rêjîm û Rûsyayê de bû, Rikberî bi daneheva pereyan û xerçkirina milyarên dolaran li civînên vala vala mijûl dibû ku ev civîn bi sixêf, dijûn, nakokî û hevtewanbarkirina bi îxanet, tîrebazî û nijadiyê bi dawî dibûn.

Li milekî din, ji destpêka damezrandina Rikberiyê ve û heta roja îro her dem û gav aliyên Rikberiyê hevdu xayin dibînin. Her aliyek aliyê din bi îxanet û ajaniyê tewandbar dike û angaşt dike ku aliyê herî welatparêz ew bixwe ye û kesên din hemû alavên ajandayên dewletên derveyî ne. Her wiha xwe ji bo berjewendiyên niştimanî ji hev re danaxin. Mirov nikare bide medele ku hin hêzên Rikberiyê (Koalisyon û çeteyên wê) piştgirî û palpiştiya Tirkiyeyê kir ku deverên Sûriyeyê dagir bike; deverên ku biewle bûn û aştî û aramî li wan peyda bûn, ji Rêjîma Sûriyeyê hatibûn rizgarkirin û bi sedên hezaran xelk li wan rûdiniştin her wekî niştecihên resen û penaberên ku ji şerên di navbera Rêjîmê û Rikberiya wê de reviyabûn. Her wiha ev hêz bûn alîkar ku operasyonên guhartina demogirafîk û qirkirina çandî ya bizanebûn li deverên kurdî pêk werin.

Kêferata navxweyî û hevrikiya li ser şûnecihên bêqîmet, helwesta Rikberiyê lawaz û qels kir. Kêferata di navbera aliyên Rikberiyê de ji kêferata wê bi Rêjîma Sûriyeyê re gurtir bû. Li kêleka vê yekê jî, wan heta niha nekariye Rêveberiya Xweser û Meclisa Sûriya Demokratîk bibin rexê xwe. Dibe ku sedema wê yekê ew be ku Rikberî di rewşine objektîv de saz nebûye ku bikare siyaseta xwe destnîşan bike û biryarên ku ji bo gelê Sûriyeyê guncav dibîne bistîne.

Ji bo Meclisa Sûriya Demokratîk, tevî ku heta astekê ewlehî ji bo gelên bakur û rojhilatê Sûriyeyê dabîn kiriye, nasnameya niştimanî û yekîtiya welat ji parçebûnê parastiye û heta astekê çend destkeftî di gelek biwarên siyasî û leşkerî de bi dest xistine jî, lê ji ber ku ev meclis beşa siyasî ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyeyê ye diviyabû kedeke mezintir bidaya û xwe weke hêzeke siyasî û sereke li deverê bidaya pêş û tev li civînên girêdayî Sûriyeyê bibûya û bêhtir sûd ji serkeftinên leşkerî yên QSDê bikira anku wekî nimûne bikariya danpêdaneke siyasî bi Rêveberiya Xweser bi dest bixista. Li kêleka vê yekê jî, heta niha nekariye rikberên welatperêz (tevî ku kêm in) li jêr yek sîwanê kom bike ku armanca wê peydakirina çareseriyeke siyasî ji kirîzê re be. Her wiha nekariye projeya Rêvberiya Xweser ji sînorê deverên bakur û rojhilata Sûriyeyê derxe û derbasî deverên din bike. Çimkî wekî nimûne gelek caran devera Siwêdayê ragihandiye ku ew tecrubeya Rêvberiya Xweser dicibîne. Li aliyekî din diviyabû MSDê kedeke siyasî zêdetir bidaya da ku Tirkiyeyê êrîş nekira û dever dagir nekira. Ev mijarên navbihûrî faktorên nerastrast yên domkirina kirîzê bûn.

Rikberiya leşkerî jî wekî rikberiya siyasî nikarîbû xwe di yek statuyê de bi yek bike û nekarî stratejiya xwe ya leşkerî destnîşan bike, her wiha nekarî bibe artêşeke niştimanî ji bo parastina gelê Sûriyeyê. Li kêleka vê yekê jî hin komik derketin pêş ku wekî komikên terorîst tên wesfkirin nola Daişê û Heyet Tehrîr el-Şam. Vê gavê barê rikberiya leşkerî girantir kir ya ku jixwe di navbera kesên laîk û kesên îslamî de hatibû parçekirin û tu nerînek li ser lihevkirî ji bo delwleta paşerojê li nik nebû. Ajanda û siyasetên komikên çekdar jev cuda û ciyawaz bûn, hem di sirûşt û armancên şer de hem jî di nerîna wan li hember dozên demokrasî, azadî û pirrengiyê û pergala siyasî ya nû de ciyawazî hebû. Lewre li komikên cuda cuda parçe bûn ku hin komik cîhadîst, hin radîkal, hin navînî û hin jî laîk bûn û bi vî awayî hejmara wan gihişte nêzî hezar komikî ku her yek ji wan xwedî îdiyolojî û ajandayeke serbixwe bû. Hin komik hewl didin mîrnişîneke îsalmî damezrînin, komikine din avakirina dewleteke îslamî ji xwe re armanc girtine û hinên din jî daxwaza dewleteke xwedî desthilata navendî dikin … û hwd. Ji dêl ku rêyên biewle ji gel ra peyda bikin û şert û mercên jiyanê dabîn bikin, dest bi cîbicîkirina hikmên şeriî (weke birîna destan) li ser gel kirin. Pirbûna komikên çekdar bû sedem ku ajandayên wan li hev bikevin û ji dêl ku şerê

Rêjîmê bikin, van komikan şerê hev dikir; çimkî her komikek li desthilatê digeriya ku bike destê xwe tenê bê ku komikên din beşdar bibin (anku hewl didan heman karê Rêjîmê bikin ku Rêjîm desthilat bi kesên din re parve nedikir). Loma cîhanê êdî hew bawerî bi wan anî û Amerîkaya ku hin komikên Rikberiyê perwerde dikirin, piştî ku îdiyolojî û alîgirtinên wan nas kirin û piştî ku Rikberî nekarî komikên xwe li jêr sîwanekê kom bike, piştgiriya gelek komikan rawestand.

Gelek komikên çekdar nekarî civakên Sûriyeyê bînin rexê xwe û wan hogirî xwe bikin, ne tenê wiha lê belê hin komikan êrîşê deverên rizgarkirî û biewle kir û sûc û binpêkirinên xirab kirin. Nimûneya vê yekê li Tilhasil û Tileranê çêbû; dema ku zêdeyî 50 hemweltiyên kurd şehîd xistin û 350 kesên din[8] bin çav kirin û heta niha jî çarenûsa wan ne diyar e. Tê zanîn ku Cebhet el-Ekrad ya ku wê demê di Rikberiyê de bû her du deverên navbihûrî ji Rêjîmê rizgar kiribûn. Piştre jî sala 2012an êrîşî Serê Kaniyê kirin û bi dewleta tirk re bûne alîkar ku hin deverên bakurê welêt dagir bikin.

Dêmek, êdiyolojiya radîkal ya piraniya rêxistinên leşkerî û bixwegirtina van rêxistinan ji şer û pevçûnên dîrokî re ku ev şer bixwe li ser şerekî tîrebaz ava bûne, bû sedem ku stratejiyên wan ên leşkerî lawaz bibin û rajeya nerîna Rêjîmê kir ya ku ev kom wekî komikên terorîst didîtin. Li milekî din, ji ber ku van rêxistinan xwe nesparte hêza xwe û pişta xwe bi piştgiriya derveyî xurt kirin, bûne çeteyên Tirkiyeyê û ajandayên wê yên dagirkirinê cîbicî anîn; mîlîsên Artêşa Niştimanî ya bi ser Tirkiyeyê ve nimûneya vê yekê ne. Her wiha van rêxistinan çarenûsa xwe bi hevtêgihiştinên Tirkiye û Rûsyayê ve girê da, loma gelek deverên di destê wan de ji bin kontrola wan derketin û ketin destê Rêjîmê. Halê hazir ew bi piştgiriya Tirkiyeyê deverên rizgarkirî dagir dikin. Bi vî rengî û piştî van kiryaran, em tê derdixin ku ev ne xwedî projeyeke niştimanî sûrî bûn, lê belê tevger, şepêl, lordên şer û berdewamiya hêzên herêmî û navdewletî bûn.

### 2.Helwesta Rikberiyê li hember doza kurdî

Kurd jî wekî hemû hêzên siyasî yên parçebûyî, di krîza Sûriyeyê de bûn du şepêl. Şepêla yekem tev li refên Koalisyona Ixwanan bû û nerîn û

[8] Naveda Belgekirina Binpêkirinan li bakurê Sûriyeyê, komkujiya Tîrmehê li bajarê Tileran û Tilhasil, 29ê tîrmeha 2019an, link: https://vdc-nsy.com/archives/21449

projeya wê ya siyasî ji bo paşeroja Sûriyeyê bi xwe girt. Şepêla duyem deverên xwe ji şer û pevçûna heyî parastin û bi pêkhateyên din re peymaneke civakî saz kir, di encamê de Rêveberiya Xweser hat avakirin. Helwestên cuda cuda yên rêxistinên Rikberiyê li hember kurdan û Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyeyê hebûn, lê helwesta herî tund ya Koalisyona ixwanî ya bi ser Tirkiyeyê ve bû. Li jêr em ê helwesta Rikberiyê bi giştî li hember kurdan û rêxistinên wan yên siyasî bi rêz bikin.

**Nerîna Rikberiyê ji bo Encumena Niştimanî ya Kurdî "ENKS"**

Encumena Niştimanî ya Kurdî di heyama kirîza Sûriyeyê de di 26ê çiriya pêşîn sala 2011an li Hewlêrê hat damezrandin. Tevî ku Koalisyonê daxwaza ENKSê ya nenavendiya siyasî red kir û li ser navendiya rêveberî rijd bû, lê di 27.08.2013 de ENKS li gor belgeyekê di navbera wê û Koalisyonê de tev lê bû. Ji hingê ve ENKSê ketiye bin hegemoniya Ixwan-ilmislimîn ku Koalisyonê bi tena serê xwe biryar distandin û nûnertiya ENKSê pir lawaz bû. Hema hema mirov dikare bibêje ku Encumen beşdarî civînên navdewletî nedibû û beşdarbûna wê tenê bi nav bû. Koalisyonê rê neda Encumenê ku bi rola xwe ya siyasî rabe, lewre hin kesayet û şepêl jê vekişiyan, lê heta roja îro jî hêj ENKSê hevpişka Koalisyonê ye.

ENKSya ku angaşt dikir ku ew nûnertiya gelê kurd dike û êş û janên wî yên ji destê desthilata Beisê dîtin digihîne civînên navdewletî, tu armancên xwe yên siyasî pêk neanîn û tu destkeftiyên siyasî ji beşdarbûna xwe di koalisyonê de bi dest nexistin. Lê tersî wê, gelek caran bi rêya beşdariya daxuyaniyên Koalisyonê yên li dij Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyeyê û kurdan dibû kelem li pêş doza kurdî. ENKSê dikarî bibe rikberiyeke niştimanî ji Rêveberiya Xweser re û dikarî ji dêl ku dijminatiya wê bike, şaşiyên wê destnîşan û sererast bike. Li kêleka vê yekê jî Encumenê tu helwestên zelal li hember dagirkirina deverên kurdî nîşan nedan, bi ser ve jî seredana wan bajarên dagirkirî yên di destê komikên çete yên bi ser Tirkiyeyê ve kir. Koalisyon ketiye destê koma Ixwan-ilmislimîn ya ku fermanên xwe ji Tirkiyeyê distîne, loma nerîna wan ji bo kurdan bi giştî ew e ku derfteke tenê jî nedin wan ku daxwaza mafên xwe bikin; ne niha ne jî dûvre. Ixwan Encumenê wekî Hespê Troyê bi kar tînin da ku xwe li pêş raya giştî ya cîhanî demokratîk bidin nîşandan ku bi doz û

mafên kurdan re ne. Koalisyon Encumenê bi kar tîne heta ku Rêveberiya Xweser têk bibe da ku dûvre xwe ji Encumenê jî xilas bike.

Helwesta Koalisyonê ji diyaloga kurdî-kurdî ya ku ji du salan ve bi destpêşxeriya QSDê û bi serperiştiya dewletên rojavayî dest pê kiriye, zelal e. Helwest jî ew e ku bi rêya sepandina şert û mercên xwe li ser Encumenê vê diyalogê bi bin bixe. Dibe ku sedema sereke ya rawestina diyalogê Koalisyon bixwe be, nemaze piştî ku seredana Herêma Kurdistanê kir û ew bêhtir li Rêveberiya Xweser sor kir, her wiha kir ku Encumen mercên xwe yên berê zêdetir û asêtir bike da ku diyalog têk biçe û parçbûna siyasî ya kurdan dom bike.

Tevî vê siyaseta koalisyonê û çeteyên wê li hember kurdan bi giştî û li dij deverên dagirkirî bi taybet ku bûne çeteyên Tirkiyeyê, heta niha jî Encumena Niştimanî ya Kurdî di Koalisyonê de cih digire û pê re ber bi armanceke nenas ve diçe. Tê zanîn ku piraniya dewletên rojavayî û erebî Koalisyon avêtine û baweriya wan pê nemaye

**Nerîna Rikberiyê ji bo kurdên Rêveberiya Xweser**

Ji destpêka avabûna Rêveberiya Xweser ve weke statuyeke siyasî li bakur û rojhilatê Sûriyeyê ku dan bi mafên hemû pêkhatiyan dide, piraniya şepêlên Rikberiya Sûriyeyê Rêveberî nepejirand; bi taybet Koalisyon ku xwe kire dijmina Rêveberiyê. Çimkî Rikberî kurdên di Rêveberiya Xweser de bi kesên cudaxwaz û alîgirên Rêjîma Sûriyeyê tewanbar kir, her wiha ew weke gawir û milhid bi nav kirin. Lewre Koalisyon stratejiya Tirkiye û Ixwanan bi xwe digire; stratejiya ku hebûna kurdan li deverê armanc digire û li dij her projeya ku mafên kurdan misoger dike, radiweste. Ji bo ku van gavan pêk bîne, bi piştgiriya Tirkiyeyê rêzêrîş li dij deverê pêk anîn û Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî dagir kirin û dest bi guherîna demografîk li van deveran kirin ku dê encamên wê di paşerojê de kambax bin.

Koalisyon û komikên girêdayî wê tu carî ne dudil bûn ku bi piştgirya Rêjîma Erdogan êrîşî kurdan û Rêveberiyê bikin ku şofîniya wan li dij doza kurdî û Rêvberiya Xweser şofîniya Rêjîma Beisê derbas kir. Koalisyonê dikarî Rêveberiya Xweser weke hevbendekî stratejîk li deverê bibe rexê xwe da ku her du bi hev re rajeya berjewendiya niştimanî ya Sûriyeyê bikin û guhartina armanckirî pêk bînin, lê mixabin wiha nekir. Helwesta platformên

din yên Rikberiyê ji Rêveberiya Xweser û kurdan weke helwesta wan dewletan e yên ku piştgiriya wan dikin. Têkiliyên baş yên Rikberiya hundir weke Heyet el-Tensîq el-Weteniye bi Rêveberiya Xweser re hene, lê ev têkilî negihiştine wê astê ku dan bi Rêveberiyê bidin; lê dibe ku berdewamiya van têkiliyan bibe sedem ku di dema pêş de hevtêgihiştinên nû di navbera wan de çêbin.

Tevî helwesta Koalisyonê ya şofînî li hember Rêvebriya Xweser û kurdan ku alîkariya Tikriyeyê kir da ku deverên wê dagir bike, MSDê çend caran ew vexwendin ku li hev rûnin û pirsgirêkan çareser bikin û bi hev re deverê bi rê ve bibin. Lê ev vexwendin ji aliyê Koalisyonê ve hat redkirin; ji aliyê wê û aliyê Erdogan ve yê ku nahêle ku hemû rêxistinên siyasî yên di bin kontrola wî de serederiyê bi Rêveberiya Xweser re bikin, çimkî ditirisin ku gelê kurd bigihe mafên xwe yên rewa. Tirkiye hewl dide lihevkirinekê bi Rêjîma Sûriyeyê re saz bike da ku bi rêya hevkariya istixbaratî û hevbendên xwe yên çete tevliheviyê li deverên Rêvberiya Xweser çêke. Her wiha tevî ku kurdên li bakurê Sûriyeyê tu ziyanê nagihînin Tirkiyeyê û gefan lê naxwin jî Tirkiye heta jê tê hewl dide ku kurd û Rêveberiya Xweser li Sûriyeyê aşartinê bi dest nexin.

**Faktorên objektîv**

Gelek hêzên mezin ketine şerê Sûriyeyê û her hêzek xwedî bejewendî, ajanda û projeyên stratejîk yên ciyawaz e, lewre du şop van faktoran kontrol dikin; şopek girêdayî çalakiyên van hêzan e li erdnîgariya deverê û şopa din girêdayî hevtêgihiştin û girêbestên navdewletî ye.

**Çalakiyên van hêzan li erdnîgariya deverê**

Bê guman desttêwerdanên derveyî di kirîza Sûriyeyê de, sedema sereke ya asêbûn û domkirina wê ye. Çimkî her hêzekê hewl dida hêza din ya hevrik tesfiye bike; çi bi riya desttêwerdana yekser çi jî bi rêya ajan û komikên xwe yên çekdar. Bi vî awayî Sûriye di navbera dewletên herêmî û navdewletî de bû qadeke şer. Nimûne, Tirkiye hewl dide Peymana Milî vejîne anku hin deveran ji bakurê Sûriye û Îraqê (ji Helebê heta Mûsilê) dagir bike û tev li xaka Tirkiyeyê bike. Her wiha projeya Îslah el-Şerq (Çakkirina Rojhilatê) ya sala 1925an berdewam bike; projeya ku hewl dide operasyonên paqijkirina nijadî û guherîna demogirafîk li dij kurd, ereb û

xiristiyanên deverê pêk bîne, piştî ku heman proje li dij eremn û suryanan di sedsala bihûrî de pêk anî. Tirkiye dixwaze koma Ixwan-ilmislimîn desthilata Sûriyeyê bi dest bixe da ku Sûriye bibe alayeke girêdayî Enqereyê.

Îran hewl dide eniyekê ava bike da ku rajeya milmilaneya wê ya îdiyolojî bi dewletên rojavayî re, bi taybet Israîl û Amerîka, bike. Her wiha dixwaze ramanên şîî li deverê belav bike û Rêjîma Sûriyeyê di desthilatê de bimîne da ku projeya wê xweş bi rê ve here û rê li avabûna statuyeke din bigire ku dibe ku mafên kurdan bide wan. Îran karî bi gihiştina benderên Deryaya Spî li Sûriye û Libnanê, dorpêçkirina li ser xwe bişkîne û piştgiriya hêzên alîgirê xwe bike. Lewre dijminatiya Rikberiyê dike û hewl dide wê lawaz û parçebûyî bihêle û rê nade Rêjîmê ku tu nihanan ji Rikberiyê re bike.

Rûsya jî weke Îranê hewl dide hêzdariya xwe li Rojhilata Navîn zêdetir bike û baregehên leşkerî yên stratejîk ava bike da ku bibin alîkar di şikandina dorpêçiya NATO`yê ji Rûsyayê re. Her wiha da ku li Deryaya Spî bimîne. Dixwaze Rêjîma nihayî di desthilatê de bimîne da ku ajandayê xwe misoger bike; bi taybet di warê malgirtina gaza ku ji bo bazarên Ewropayê tê hinardekirin de. Loma hewl dide her projeya di vî warî de hevrikiya wê bike û gefê li ewlekariya wê ya neteweyî bixwe asteng bike. Tu pirsgirêk li nik Rûsyayê nîne ku serikê Rêjîma nihayî were guhartin madem Rêjîma nihayî bi saziyên xwe yên fermî dimîne da ku rewatiya hebûna xwe li gor siyasetên navdewletî misoger bike. Çimkî wê rêkeftin bi desthilata xwedî rewatiya navdewletî û nûnertiya wê di saziyên Neteweyê Yekbûyî de heye girê daye. Lewre bi rêya girêbestên wê bi Erdogan re Rikberî parçe parçe kiriye û helwesta wê ji Rikberiyê weke helwesta Îranê ye, lê siyaseteke wê ya taybet di vê barê de heye.

Amerîka hewl dide ku hegemoniya xwe li deverê bi giştî û li Sûriyeyê bi taybet biparêze û rê li hêzên hevrik wekî Rûsya, Îran, Trikiye û Çînê bigire. Li kêleka wê jî dixwaze eniyekê ji bo parastina berjewendiyên xwe yên aborî û baragehên leşkerî li deverê ava bike. Her wiha hewl dide hevrikiya bi komikên radîkal re dûrî deverên ku berjewendiyên stratejîk yên Amerîkayê lê hene bibe. Dixuye ku parastina ewlehiya Îsraîlê û dijminatiya tevgerên çepgir hîn jî beşek ji stratejiya Amerîkayê ne, lewre guvaşê li Rikberî û Rêjîmê nake ku bigihin nerînên hevbeş. Her wiha hewl nade Rêveberiya

Xweser beşdarî civînên taybet bi kirîza Sûriyeyê bike. Dixuye ku ew jî weke Rûsya û Îranê sûdê ji berdewamiya kirîzê dibîne.

Îsraîl hewl dide hêzdariya Îranê sînordar bike û veguhastina çekên pêşketî ji bo Hizbela rawstîne. Her wiha rê nade Sûriye û Îsraîlê ku gefê li ewlkariyê wê bixwin. Lewre çavdêriya kiryarên Îranê dike û hema hema rojane bombeyan li mîlîsên îranî dibarîne. Di heman demê dixwaze şerê di navbera Rêjîm û Rikberiyê de berdewam be da ku her du lawaz bimînin.

Dewletên ereb hewl didin li pêş berfirhebûna Îran û Tirkiyeyê li deverê bi giştî û li Sûriyeyê bi taybet bisekinin. Vê dema dawîn û piştî ku nekarîn cihê Sûriyeyê di Komkara Erebî de bidin Rikberiyê, dewletên ereb hewl didin têkiliyên xwe bi Sûriyeyê re vegerînin û hin dewletan ji nû ve balyozxaneyên xwe vekirin. Dewletên ereb dixwazin çareseriyekê ji kirîza Sûriyeyê re li gor ewlekariya neteweyî ya erebî bibînin, lê hêzdariya Îran û Tirkiyeyê li pêş wan dibin asteng. Lewre serkeftina yek ji van her du hêzan ne di bercewendiya dewletên ereb de ye.

Bi giştî, nakokiyên îdiyolojî û stratejîk û berjewendiyên cuda û nelihev yên dewletên herêmî û navdewletî li deverê ji faktorên obejktîv in ku dihêlin kirîza Sûriyeyê dom bike. Her wiha ev faktor çareseriya kirîza Sûriyeyê asêtir dike û girêdayî lihevkirinên navdewletî û herêmî dihêle.

**2.Şopa girêdayî hevtêgihiştin û girêbestên navdewletî**

Gelek civîn û konfransên siyasî yên navdewletî bi serperiştiya hin hêzên navdewletî yan Neteweyên Yekbûyî ji bo Sûriyeyê hatin lidarxistin da ku bi rêya danûstandinên di navbera Rêjîm û Rikberiyê de kirîza Sûriyeyê bi dawî bikin. Lê yek ji wan civînan jî bi qasî serê derziyê sûd li pêşketina prosesa siyasî nekir û şer û pevçûna li Sûriyeyê ranewestand. Ne tenê wiha, hin civîn ji bo domkirina kirîzê û pê re jî êş û janên gelê Sûriyeyê dihatin lidarxistin, ew jî bi rêya bidûrxistina hin aliyan da ku alîne din ku têkiliyên aborî û stratejîk di navbera wan de hene razî bikin. Her wiha hin civîn li dar ketin bi tenê da ku deverên hêzdariya aliyê navdewletî û herêmî destnîşan bikin û Rikberiya Sûrî ji nav bibin; ku Rikberî bixwe beşdarî wan civînan dibû. Doza gelê Sûriyeyê di van civînan de dihat paşguhkirin; gelê ku ji bo jiyaneke azad rabû li ser piyan û serî li hember desthilata Beisê hilda.

Baş e ku hin ji van civîn û konfransan werin nirxandin. Di van civînan de bi zanebûn beşdarbûna tevgera siyasî ya kurdî ya serbixwe li Sûriyeyê, her weiha beşdarbûna Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyeyê dihat redkirin. Li vir em ê behsa civînên herî girîng bikin:

**Ji bo diyalogên Cinêvê:**

Di hezîrana 2012an de, rêjîma Sûriyeyê û rikberî beşdarî danûstandinên ku bi rêya NY hatin lidarxistin, bûn. Ew jî di çarçoveya daxuyaniya Cinêvê ya ku Amerîka û Rûsiya ew pesend kiribû. Daxuyanî doz dike ku desteyeke hukm a demkî were damezirandin ku xwedî karînên cîbicîanê yên giştî be. Li gorî belgeyê, ev hikûmet dikare endamên hikûmeta heyî, rikberî û komên din bihewîne û ev hikûmet dê bi awayekî ku tev li ser li hev bikin, were damezirandin. Lê belê danûstaninên piştî wê hatin, tu pêşketin pêk neanîn. Her du aliyan şîroveyên cûr bi cûr der barê rêkeftinê de girtin xwe; weke mînak, rikberî dibîne ku çi hikûmeteke nû were damezirandin, gerek e rêjîma Beşar bi dûr bixe. Di heman demê de rêjîm tekez dike ku Esed bi rêya hilbijartinan di sala 2014an de careke din hat ser desthilatê û da diyarkirin ku daxuyaniya Cinêvê doza istîfaya wî nake bi awayekî eşkere.

Rikberiya ku beşdarî van diyalogan bû, tu tiştekî berbiçav pêk neanî, çimkî ew tevlîhev û belawela bû di babeta nûnertiya wê de; ne rêveberiyên leşkerî danpêdan bi yên siyasî dikir û ne jî yên siyasî danpêdan bi yên leşkerî dikir. Ji aliyekî din ve nakokiyên li ser wergirtina cih û nûnertiyê di navbera wan de her didoman û bê encam bûn. Ev nakokî girêdayî dewletên ku ew girêdayî wan bûn û piştgiriya wan dikirin û çawa dikarin bêtir nerîna wan dewletan pêşkêş bikin. Ji ber wê jî rikberî bi nerîn û şandeyên cuda dihatin Cinêvê. Rewşa wan wisa ma heya ku dewletên ku serpereştiya wan dikin ew di Desteya Bilind a Danûstandinan de kom kirin (jixwe berî niha em ev yek aniye ziman). Vê dawiyê ev deste tenê di dest Îtilafê de ma. Bi kurtasî, rola rikberiyê di danûstandinên Cinêvê de ew bû ku weke balyozan herin da ku nûnertiya nerîna aliyên ku wan dihewînin û piştgiriya wan dikin, pêşkêş bikin. Di encama van tiştan de, tiştekî bi navê rikberiya ku ji bo gelê Sûriyeyê danûstandinan dike nem, lê belê tenê rikberiyê jevketî ma ku tenê

ji bo hebûna xwe ya di cihên xwe de danûstandinan dike. Ev rikberî ji bo hûrguliyên biçûk tê kişandin, dûrî rêyên çareseriyê li Sûriyeyê.

Van danûstandinan ji destpêka wan heya niha tevî ku gelek bûn (9 car bûn), tu tiştekî berbiçav ji bo gelê Sûriyeyê nekir, lê belê li şûna wê, trajîdî û êş û azarên vî gelî bi qatan zêdetir kir. Heya niha jî hem rêjîm hem jî rikberî nerînên wan hişk in û tu tawîzan li ser maseya danûstandinan pêşkêş nakin. Heya niha jî danûstandinên Cinêvê di navbera rêjîm û rikberiyê de berdewam in, lê bêyî ku tu encamên berbiçav werin derketin. Ji ber wê û li gorî tiştên navborî, tu asoyên çareseriyê di van danûstandinan de naxuyin.

**Ji bo danûstandinên Astanayê:**

Ev danûstandin di navbera Rûsiya Tirkiya û Îranê de li paytexta Kazaxistanê de (Asetana) hatin lidarxistin. Di van danûstandinan de Rûsiya bi roleke sereke dilîze. Armanca van danûstandinan ew bû ku hevrêzî di navbera van dewletên navborî de li ser babetên operasyûnên şer li ser xaka Sûriyeyê were kirin û rê li ber şer di navbera wan de were girtin, nemaze piştî ku çend bûyer çêbûn ku  hindik mabû bibin sedema rûdana şer di navbera wan de. Debe ku bûyera herî berbiçav, rûxandina balafira rûsî ji hêla Tirkiyeyê ve bû (2015). Civîna vê danûstandinê cara pêşîn di 23- 24ê kanûna paşîn 2014an de hat lidarxistin. Tê de şandeyeke rêjîm û yeke rikberiyê û yeke komên çekdar hazir bû. Her wiha şandeyê navneteweyî yê berê ji bo Sûriye "Stîvan Dî Mistora" û Amerîka jî weke çavdêr, beşdarî vê civînê bûn. lê belê piştî hazirbûna di çend şotan de, Amerîka xwe vekişand. Di vê civînê de hat levkirin ku herêmên kêmkirina şer û rageşiyê li hejmarek herêmên Sûriyeyê  werin damezirandin û eniyên şer werin hedarkirin.

Lê belê ev danûstandin weke daveke kujer bû ji bo komên çekdar ên ku wê demê şerê rêjîmê dikirin. Ew jî bi rêya stratejîka rûsî ya ku dixwest herêmên şer ên di bin desteseriya Daişê de desteser bike û paşê xakên ku rêkeftina kêmkirina şer wan dihewîne, yek bi yek desteser bike. Da ku bi vî awayî jî di encama van danûstandinan de, rikberiya çekdar stûyê xwe bi yek carê bixe nav destê dewleta Tirk a dagirker de. Bi vî awayî dewleta Tirk karibe bi rêya girêbestên bi  Rûsiya re ajanên xwe pêk bîne û di heman demê de rikberî piraniya bajarên stratejîk ên ku di wan de xwe diparast, ji bo rêjîma Sûriyeyê ji dest bide û komên çekdar û sivîl bi otobîsên kesk ber

bi herêmên Îdlibê ve werin koçkirin. Di encamê de Îdilib bû mîna embareke mirovî ya pir tije û dagirtî û bû weke bumbeyeke ku ewlehiya mirovî û navneteweyî bixe bin metirsiyê. Ji bo sivîl û çekdarên ku biryar dan bi rêjîmê re li hev werin, jiyaneke bitirs ji ber girtin û çavdêriya ewlekatriyê dijîn, tevî ku Rûsiya misogerî jî dabû wan. kesên herî di van danûstandinan de bi ser ketin, rêjîm û Rûsya bûn, çimkî piştî hejmarek operasyonên leşkerî li dijî komên rikberiyê, wan rûberên berfereh ji Sûriyeyê kirin bin desteseriya xwe  bêyî ku tu tawîzên siyasî yên meizn bidin.

Ji encamên danûstandinên Asetanayê, dagirkirina hin herêmên Rêveberiya Xweser ê bakur û rojhilatê Sûriyeyê (Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî). Ev dagirkirin di encama levkirina rûsî, tirkî, îranî û sûrî pêk hat. tevan li hev kir ku niştecihên kurd werin koçkirin û malbatên çeteyan û koçberên Xûta Şerqî, Heleb û ji bilî wan li şûna wan werin bicihkirin, da ku guhertina demografîk li gorî ajanên tirkî li herêmê pêk were. Ev yek pêk hat bêyî ku civaka navneteweyî deng ji xwe bîne. Heya niha jî binpêkirin berdewam in û bi awayekî himbiz li dijî hebûna kurdî li herêmên dagirkirî pêk tê. Her wiha bobelateke mirovî li Îdlibê pêk hat, ji ber ku kamb bi mirovan gelekî hatin dagirtin. Xuya ye gef û êrîşên domdar ên dewleta Tirk bi ser Ên Îsa, Til Temir û ji bilî wan, xwevekişîna rûsî ya tektîkî ji hin baregehên leşkerî û paşê vegera wê li wan, qutkirina avê, reşkuştina der heqê niştecihên herêmê, fişarên li ser Rêveberiya Xweser û HSDê û mijara hebûna amerîkî li herêmê û nîqaşkirina rêbazên derxistina wê ji herêmê, tev mijarên ku di navbera dewletên serpereştiya danûstandinên Asetanayê dikin de tên nîqaşkirin. Jixwe hejmara carên ku Asetana hatiye lidarxistin 15 car in. Armanca wê di tevahî daxuyaniyên wê yên hevbeş de, ew e ku HSDê û Rêveberiya Xweser lawaz bikin. Wisa xuya ye ku Rêveberiya Xweser bûye dijminekî hevbeş di navbea van aliyên beşdar de.

Ev danûstandin di navbera van her sê dewletan de bi awayek domdar tên lidarxistin. Dibe ku ev dewlet li ser hin pilan û girêbestên nû der barê Sûriyeyê de li hev bikin, nemaze der barê Rêveberiya Xweser a bakur û rojhilatê Sûriyeyê de. Jixwe wan berî niha bi rêya fişara li ser Rêveberiya Xweser, ev yek kiriye da ku di encama girêbestine rûsî-tirkî yên nû de Rêveberiya Xweser tawîzan pêşkêş bike û wê neçar bikin da ku xwe ji hin herêman vekşîne.

**Ji bo kongira Sûtşî:**

Piştî ku Rûsiya û hevpeymana wê karîbûn danûstandinên Asetanayê ji aliyê leşkerî ve veber biînin; ew jî bi rêya vegerandina herêmine berfereh bo rêjîmê, Mosko di 30ê kanûna paşîn 2018 de, hkongira Sûtşî li dar xist da ku çareseriyeke siyasî li gorî stratejîka rûsî ji Sûriyeyê re bibîne. Gelek kesayet ji derve û hundirê Sûriyeyê beşdarî vê kongirê bûn (ji hundir: kesayetin ji perlemantoyê, yekîtiyên karkeran, endamine partiya Baas û ji bilî wan) (ji derve: kesên ku piştgiriya çareseriya rûsî ya ji bo aloziya sûrî dikin, her wekî Rinde Qisîs, Ehmed Cerba û Qedrî Cemîl). Her wiha nûnerê Tirkiye  û Îranê û şandeyên navneteweyî bo Sûriye 8Stîvan Dî Mistora) jî beşdarî vê kongirê bûn. Lê dewletên rojavayî yên ku ev kongir nedipejirandin çimkî ew ji derveyî sîwana NY ye û pabendî danûstandinên Cinêvê weke çareseriyeke tekane bo kirîza Sûriyeyê nabe, tê de beşdar nebûn.

Ji bo desteya bilind a danûstandinan a dijber, ew jî beşdarî vê kongirê nebû, lê belê Tirkiye li şûna wê beşdar bû û piştî ku kongir bi dawî bû,  wê encamnameya wê pejirand. Her wiha ji ber êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê bi ser Efrînê de û vekirina Rûsiya ya rê bo van êrîşan, Rêveberiya Xweser û nûnerên wê yên siyasî beşdarbûna di vê kongirê de nepejirand. Xuya ye Rûsiya ev kongir li dar xist da ku ji nû ve pêvajoya doplomasî li gorî rewşa leşkerî û siyasî ya nû damezirîne û destkefitiyeke siyasî piştî destkeftiyên wê û rêjîmê yên leşkerî bi dest bixe û xwest bi rêya vê kongirê peyamenkê bigihîne rikberiyê ku tiştekî wê yê mezin ku ji bo wê danûstandinan bike, nemaye. Ji ber wê jî ya baş ji bo wê, ew e ku bi çareseriyên rûsî haşt û razî be; her wekî avakirina hikûmeteke levkirinê bi hebûna rêjîma Esed. Her wiha Rûsiye dixwest bi rêya vê konfirê, dosyeyên ku gerek e li Cinêvê bihatina gotûbêjkirin, ber bi kongira Sûtşî ve biguhêze da ku nerîna xwe ya çareserkirina aloziya Sûriyeyê biçesipîne û Cinêvê vala derxîne.

Lê belê xebatên rûsî yên mezin ji bo biserxistina vê kongirê, encamên wê yên ku dixwestin, pêk neanîn. Her çi qasî Rûsiya di daxuyanên xwe de dabe diyarkirin ku danûstandin û kongirên ku Mosko wan li dar dixe ji bo xizmeta danûstandinên Cinêvê û biryara 2254 e, nemaze piştî dûrketina aliyên aktîv di aloziya Sûriyeyê de, lê  wê tu tiştekî berbiçav bi dest nexist, tenê wê karîbû komîteyekê ji bo nivîsîna destûra Sûriyeyê li Cinêvê pêk bîne.

**Ji bo Komîteya Destûrî ya Sûrî:**

Nivîsîna destûra sûrî, yek ji encamên danûstandinên Cinêvê ye. lê ji ber nakokiyên di navberarikberî û rêjîmê li ser xalên wê û ji bo windakirina demê da ku bi rêya leşkerî babet çareser bibe, ev destûr çend caran hat derengxistin. Lê belê bi rêya kongira Sûtşî ya ku ji hêla Rûsyayê ve hat lidarxistin, careke din destûr hat nivîsîn. Di encamê de, piştî ku dewletên rojavayî û erebî di bin serpereştiya NY de erê kir, di îlona 2019an de, komîteya ku ji bo destûrê hatibû avakirin, dest bi karê xwe kir.

Komîteya ku du salan dom kir heya hat damezirandin, ji van aliyan pêk tê: 150 nûneran; ji wan 50 nûnertiya rêjîmê dikin, 50 nûnertiya rikberiyê dikin (Desteya Bilind a Danûstandinan), 50 ji hêla NY ve hatin hilbijartin. Ew jî pisporên zagonî, endamên civaka sivîl, kesayetên serbixwe,siyasetmedar û hin pêşewayên êlan bûn. caran pêşîn di cotmeha 2019an de ev komîte li hev civiyan. Di encamê de komîteyeke nariştina destûrê ya biçûktir ku 45 kesan pêk tê, hat damezirandin. Piştî vîtoyeke tirkî Rêveberiya Xweser beşdarî vê komîteyê nebû. Tenê nûnerekî kurdan ku ew jî endamê ENKSê bû, beşdarî vê komîteyê bû. Ew jî ne ku nûnertiya doza kurdî li Sûriyeyê dike, lê belê di bin sîwana Îtîlafê de beşdar bû.

Weke wê weke civîn û danûstandinên din ên ku der barê aloziya Sûriyeyê de di van deh salên borî de hatine lidarxistin, Komîteya Destûrî ya Bilind jî tevî ku zêdeyî pênc caran civiyaye, tu encam bi dest nexist; ne tu çareseriyeke siyasî dît, ne jî tu madeyeke destûrî nîqaş kir. Di civînên wê de, gotûbêjên gewherî yên ku girêdayî rewş û trajediya Sûriyeyê ne, tune ne. Tevahî civînên wan di çarçoveya propogendayên ji bo rêjîn û rikberî û dewletên serpereştiya wan dikin de ne. Her wiha dewletên rojavayî vê komîteyê pişt guh dikin û nerazîbûna xwe ji ber hişkbûna helwestên wan didin diyarkirin.  Pêşveçûna vê komîteyê ya bi awayê heyî, bi nerîna rûsî re digunce. Rûsiya bi rêjîmê re li ser hin tektîkên danûstandinan tev digerin ku vê komîteyê di nav hûrguliyan de winda bikin û wê dûrî gerîna li destûreke nû ji bo Sûriyeyê bixin. Ji ber wê û li gorî binkeftinên ku civîn û kongirên borî rasî hatine, xuya ye karên Komîteya Destûrî dê ji hêla aliyên ku serpereştiya van civînan dikin ve werin pêşvebirin û dê wisa bidome heya bigihêjin rêyeke girtî û di encamê de jî karê vê komîteyê dê were rawestandin an jî komîre dê ji nû ve û bi beşdarbûna hin aliyên din ên aktîv

li ser xaka Sûriyeyê, dê were damezirandin. Ev jî heke dewlet û Neteweyên Yekbûyî bixwaze li ser rêya rast û durist bimeşin.

Tevî tevahî civîn, kongir û diyalogên ku di van salên aloziyê yên borî de hatin lidarxistin, van civînên navborî nikarîbûn atmosfereke siyasî ya aram di navbera hêzên aktîv li ser xaka Sûriyeyê peyda bikin da ku pêvajoyeke siyasî û leşkerî ya giştî li ser asta Sûriyeyê dest pê bike. Van civînan bi rêya tîmarkirina nakokiyan di navbera van aliyên beşdar de bêtir nakokî di navbera hêzên heyî de xurt dikir da ku werin lawazkirin. Her wiha hin hêzên siyasî bi cihêbûna ji Sûriyeyê û hewildana parçekirina wê hatin tuhmetbarkirin; her wekî ku di civînên Asetanayê de çêbû. Ji aliyekî din ve hêzên gewre ne cidî ne di peydakirina çareseriyekê ji bo aloziya Sûriyeyê. Ev yek ji van aliyan ve diyar dibe; bi rêya fişarên li ser  aliyên beşdar di van civînan de, nepeydabûna kongir an jî civîneke ku rewşa siyasî û leşkerî hinekî çareser bike û ew li xalên hevbeş ên erênî di navbera van hêzan de nagerin.

Civaka navneteweyî dikarî di civîn û diyalogên xwe yên der barê Sûriyeyê de, li ser çend xalan tekez bike da ku pêşerojeke mayînde ji bo Sûriye û herêmê dabîn bike. Ew xal jî girêdayî xwezaya desthilatê li Sûriyeyê ye, çimkî xwdî cihêrengiyeke etnîkî û çandî ya kêmpeyda ye û nivîsîna destûrê li gorî vê  cihêrengiyê. Gerek e tevahî aliyên aktîv ji desthilatê neyên dûrxistin. Her wiha gerek e çavkaniyên tundrewiyê werin miçiqandin bi rêya destekdayîna ji bo hêzên ku li dijî wan şer dikin. Ji aliyekî din ve gerek e dewleta Tirk were neçarkirin da ku ji herêmên dagirkirî xwe vekişîne û piştgiriya xwe ya ji bo komên tundrew rawestîne û  guhertina demografîk der heqê niştecihên herêmê bi taybet der heqê kurdan de rawestîne. Lê belê hêzên ku destwerdanê di aloziya Sûriyeyê de dikin, berjewendiyên xwe di ser berjewendiyên gelê sûrî re digirin.

Ji bo rikberiyê jî, rola wan weke rola nûnerên di sîrkûzeke mezin de windayî ne, heya niha bi rola xwe ya di van civînan de nizanin. Ji ber ku piraniya wan jî bextên xwe bi nirxekî arzan firotine Tirkiyeyê, Tirkiye berî her kongirekê civîn ji wan re çêdikirin da ku hevrêziyê bi wan re bikin û wan li gorî armanc û stratejîkên tirkî bişînin. Ji ber wê jî tu projeyeke wan a niştumanî ya zelal ku  civaka navneteweyî karibe xwe bispêriyê û wê bi pêş bixe tune bû.

**Siberoja rikberiya sûrî:**

Rikberiya sûrî piştî deha salan di ser kirîza Sûriyeyê re, binkeftineke pir xerab di nûnertiya doza gelê Sûriyeyê de bi bin ket û bi parçebûn û nakokiyên xwe, kirîzeke siyasî ya nû afirandin. Ji ber wê jî ew gunehkarê beşeke mezin a trajediya vî gelî ye. komên rikberiya sûrî ku piraniya wan li sirgûnê ne, nikarîbûn piran di hundir de ava bikin û nasnameyeke niştumanî ya hevgirtî pêk bînin. Rewş weke berê bi tevahî pirsgirêk, nakokî û îdyolojiyên xwe ma. Ev şaşîtiyên ku ji hêla aliyên dijber ên cûr bi cûr ve tên kirin û levnekirina wan li ser bernameyeke niştumanî, her wiha hişmendiya rêjîmê ya leşkerî û kilasîkî li pêşberî bûyerên ku diqewimin ku dijberên xwe armanc digire û nepejirandina wê ji tevahî cûreyên parvekirina desthilatê û xistina Sûriyeyê di çiraveke bêsînor de û derxistina wê ji desthilatê ji pêvajoya wê ya dîrokî û xwezayî, hişt ku gelê sûrî bi tevahî pêkhate û herêmên xwe berdêlê bidin.

Li gorî tiştên navborî, xuya ye çarenûsa rikberiya sûrî û pêşeroja wê, heya asteke mezin girêdayî çawaniya xwerizgarkirina wê ji hêzdariyên derveyîn e; bi taybet babeta pêrewiya wê ya olî bi awayekî giştî ya bi Tirkiyeyê re. Her wiha girêdayî qasiya guhertina helwest û nerînên xwe yên siyasî ye û avakirina nerîneke stratejîk a nû ku armanca wê danîna rêkeftinek niştumanî bi ajan û armancine sûrî be ku tevahî hêzên dijber bi tevahî pêrew û nerînên wan bihewîne û têkiliyên xwe bi komên islama siyasî û Qaîdeyê re qut bike û lihevcivîna bê şert û merc û bidawîkirina rêbazê xayînkirinê û avakirina lêvegereke siyasî ji tevahî Sûriyan. Eger aliyên siyasî xwestin li ser rêya durist bimeşin û çereseriyekê ji bo aloziya Sûriyeyê bibînin û armancên siyasî pêk bînin û ji nû ve hêvî û omîdên gelê sûrî werin vejandin, gerek e ev xalên li jor werin pêkanîn.

Wisa xuya ye ku hewileke MSDê di vê çarçoveyê de heye. Ew vê yekê bi rêya çalakiyên xwe yên deplomasî yên ku derdora birêxistinkirina kongireke berfereh ku tevahî dijberên niştumanî li hundir û derveyî welat bihewîne, pêk tîne. Armanca wê jî nêzîkkirina nerînan û avakirina dijberiyeke siyasî ya nûnertiya vîna gelê sûrî dike û hewil dide doza wan çareser bike. Eger ev kongir were damezirandin û laşekî siyasî yê nû hat avakirin, wê hingê eger mase û desteyên dijber bixwazin xwe ji desteseriya hêrmî û navneteweyî rizgar bikin, MSDê dikare li ser wan pêşinyar bike ku ofîsên xwe veguhêzin

herêmên li jêr desthilata MSDê û nimûneya Rêveberiya Xweser weke çareserî ji bo aloziya Sûriyeyê pêşinyar bike. Her wiha wê hingê Rêveberiya Xweser dikare pêşinyar û nerînên rikberiyê yên guhertina hin aliyên rêveberî û siyasî di Rêveberiya Xweser de bipejirîne, ku armanca wan nerînan xizmeta çareseriya li Sûriyeyê be û dûrî ajan û berjewendiyên navneteweyî û herêmî be. Pêwîstiya levkomkirina vê rikberiyê bi ked, derfet, pisporiyeke siyasî û xebatên gelekî mezin heye. Her wiha pêwîst e pêwendî bi tevahî pêkhateyan re (her pêkhateyekê bi nasnameya wê ya resen) were kirin.

Ji ber wê jî avabûna laşekî siyasî yê nû ku ne tudrew be û li ser danûstandinê vekirî be û destpêkirina bi çalakiyeke siyasî li herêmên Rêveberiya Xweser (çimkî ew herêmine biewleh û hedar in û eger em wê bidin ber herêmên di bin desteseriya rêjîm û îtilafa ixwanî, ew xwedî pîvanine demokratîk e), wê hingê rê bêtir li ber çalakiyên siyasî yên dijberên ku dixwazin vegerin. Ji aliyekî din ve Rêveberiya Xweser xwedî projeyeke siyasî,niştumanî ne cihêxwaz e. Ew proje pêkhateyên herêmê yên cihêreng dihewîne û ji bo danûstandina bi tevahî hêzan re vekirî ye û dikare welat ji aloziya ku tê de ye derxe. Her wiha ev herêm xwedî semboleke taybet e, çimkî ew cihê têkbirina Daişê bû ku ev binkeftin bi rêya HSDa ku pêkhateyên sûrî yên cihêreng dihewîne û ji hêla welatên rojavayî ve tê pejirandin û ew xwedî baregehên leşkerî ye li herêmên Rêveberiya Xweser, ev yek jî têkbirina Daişê dabîn dike û rê li ber vegera wê digire. Avakirina laşekî siyasî li vê herêmê, dê fişaran li ser rêjîma Sûriyeyê zêde bike. Rêjîm bixwe jî gihaştiye wê baweriyê ku rikberiya ku dikare guhertinê li Sûriyeyê pêk bîne û hêviyên gelê Sûriyeyê bi dest bixe, dê ji herêmên Rêveberiya Xweser derkeve, ne ji aliyê îtilafa ixwanî ve ku bûye kaxezeke fişarê di destê dewleta Tirk de bi rêya wê Tirkiye bandorê li rewşa siyasî ya Sûriyeyê dike. Ji ber wê jî rêjîm ji rikberiyê natirse, lê belê tevahî ked û xebatên xwe yên siyasî, leşkerî û aborî û çaapemenî bi kar tîne da ku rastiya projeya siyasî ya Rêveberiya Xweser pûç û vala derxîne û wê reş bike. Ji ber wê jî rêjîm Rêveberiya Xweser bi cihêbûna ji welat tewanbar dike da ku hestên neteweyî û olî li dijî gur bike. Hin ji rêbazên wê yên şerê taybet li dijî herêmê, ev in: hewildanên wê yên qetandina girêbesta civakî, tunekirina ewlehî û hedariyê li herêmê.

Her wiha ev laşê siyasî yê nû, dê ji hêla welatên rojavayî û erebî ve were pejirandin. Dibe ku dewletên erebî piştgiriya van destpêşxeriyan bikin, nemaze piştî ku piraniya laşên siyasî yên rikberiyê ji ber nakokiyên wan ên domdar, hatin piştguhkirin. Em vê yekê baş dibînin di desteya danûstandinan û madeya Qahîreyê û ji bilî wan de. Ev rikberî bi giştî ketiye rewşa tunebûn û jihevketinê û nema xwedî bingeheke gelêrî ye ne li hundir ne jî li derve û nema nûnertiya tu kesî dike ji bilî maseû desteyên xwe û ajanên piştgirê xwe. Li hemberî wê, binkeftina rikberiyê di yekkirina xwe di laşekî siyasî yê nû de, dê bihêle îtilafa ixwanî bêtir karibe deste û biryarên rikberiyê yên ku ne li gorî nerînên tirkî ne li herêmê, desteser bike. Ev yek jî dê ji bo pêşeroja herêmê ne baş be û dê rewşekê ji parçebûna siyasî, leşkerî û aborî bi xwe re bîne.

Di dema ku ji destpêka aloziya Sûriyeyê ji 2011an ve, rêjîme Sûriyeyê her tim hewil dide bide diyarkirin ku tişta li Sûriyeyê diqewime, tenê komployeke cîhanî ye û stratejiyeke rojavayî- israîlî- kendavî ye, armanca wê hilweşandina rêjîma desthilat li Şamê ye ku ev rêjîm xwe beşekî sereke di tewereya berxwedana li dijî impiryalîzma rojavayî dibîne ku Îran serkêşiya vê berxwedanê dike. Tu guhertin di hişmendî û ramanên rêjîma desthilat de çênebûne û hê nerîna leşkerî di hişmendiya piraniya rêveberên wê de desteser e û ew her tim dibêjin ku ew ê desteseriya xwe li ser tevahî xaka Sûriyeyê vegerînin. Di van demên dawî de, rêjîma sûrî hilbijartinên serokatiyê çûkirin. Ew hilbijartin berovajî tevahî diyalog, rêkeftin û pîvanên navneteweyî yên girêdayî Sûriyeyê ne. Bi vê hişmendiya kilasîkî û nepejirandina tevahî teşeyên diyalogan û nexwendina rewşa heyî bi awayekî durist û bêalî, dê bihêle aloziya Sûriyeyê bi salan dirêj bike.

Ji bo îtilafa ixwanî jî, ew gavekê bê dewleta Tirk naavêje. Dewleta Tirk jî bi alîkariya çeteyên xwe, herêmê dagir dike û hewil dide hin herêmên din jî dagir bike. Dewleta Tirk, rêveberiya herêmên dagirkirî bi rêveberiya kantonên sînorî yên tirkî ve girê daye, saziyên xwecihî yên tirkî hemû xizmetguzariyên sereke pêşkêş dikin, biranş bi zimanê erebî û tirkî tên dayîn, danûstandinên bazirganî bi pereyên tirkî pêk tên û beşên zanîngehên tirkî li herêmên dagirkirî tên vekirin. Dewleta Tirk bi rêya van kiryaran hewil dide ku dewleteke biçûk a serbixwe ava bike ku di bin desteseriya çeteyên sûrî de be (her wekî tecrubeya komara başûrê Qubrisê). Her wiha xuya ye

hewildaneke tirkî û hin welatên rojavayî heye ku hikûmeta rizgarkirinê ya girêdayî Qayîdeyê bi îtilafê re bikin yek û statoyeke siyasî û leşkerî ya nû li bakurê Sûriyeyê damezirînin. Ew jî piştî jinavbirina endamên ku ne bi dilê wan (siyasetmedar û leşkerên Qayîde û dijberên dagirkeriya dewleta Tirk) û xurtkirina rewşa parçebûnê li ser xaknîgariya Sûriyeyê..

Nerîna şofenîzm a îtilaf û rêjîma Sûriyeyê û gefên hevbeş li dijî Rêveberiya Xweser û hewildanên têkbirina wê û nepejirandina diyalogên pê re, dê bihêle Rêveberî bêtir xwe bi armancên xwe yên siyasî yên berevaniya di ber herêm û pêkhateyên xwe de bigire. Di encamê de jî dê çareseriya siyasî were derenghiştin, rewşa siyasî, leşkerî û aborî xirabtir bibe û parçebûna welat wisa bimîne.

Dûrî van sînaryohên navborî û bêyî levkirineke navneteweyî û herêmî, mirov nikare behsa tu çereseriyekê ji bo nakokiya sûrî bike û dibe ku hin levkirinên navneteweyî li ser xaknîgariya Sûriyeyê werin pêkanîn ku ne di bala tu kesî de bin.

**Dawî**

Xuya ye ku zehmet e encamên şaşîtiyên rikberiyê û zordariya desthilata navendî werin çareserkirin û welat ji çirava ku tê de ye were derxistin. Aloziya Sûriyeyê bû sedema mezintirîn pêvajoya koçberiyê li ser asta dîroka Sûriyeyê. Li gorî NY[9] heya niha nêzî 5 melyon û nîv mirov li Tirkiye, Iraq, Libnan, Misir û Ordinê dijîn. Ev ji bilî dewletên din û koçberên ku di hundirê bajarên Sûriyeyê de koçber bûne ku hejmara wan digihêje 6 melyon kes. Bûye xewn ji bo piraniya gelên sûrî ku konekî bi dest bixe û malbata xwe tê de bi cih bike. Her wiha li gorî amara dawîn a Riwangeha Sûrî ya Mafê Mirovan[10], ji destpêka aloziyê ve nêzî 606 hezar mirovî jiyana xwe ji dest

[9] nûçeyên NY, bernameya tîara cîhanî, Kovîd 19, zêdebûna pêdiviyên penaberên sûrî, 23yê hizêrana 2020
https://news.un.org/ar/story/2020/06/1057062

[10] Riwangeha Sûrî ya Mafê Mirovan, ji destêka şoreşê ve, zêdeyî 606 hezar kesî hatin kuştin an jî şehîd ketin, ji wan nêzî 495 hezar kes ji hêla Riwangehê ve hatine belgekirin, hezîrana 2021
https://www.syriahr.com/%d9%85%d9%86%d8%b0-%d8%a7%d9%86%d8%b7%d9%84%d8%a7%d9%82%d8%a9-%d8%a7%d9%84%d8%ab%d9%88%d8%b1%d8%a9-

daye. Li gorî komîteya NY ya aborî û civakî ya rojavayê Asyayê[11], ziyanên aborî jî gihaştin nêzî 442 milyar dolaî. Ne tenê wisa lê belê xizanî gihaştiye asteke pir metirsîdar û Sûriye gihaştiye qiraxa xelayê û êdî parseyî bûye kar û pîşeya hin welatiyan. Zêdeyî %80 ji xelkên Sûriyeyê di bin xeta xizaniyê de dijîn.[12] Her wiha ketina nirxên lîreya Sûrî û belavbûna mezin a kampên koçber û penaberan li ser asta xaknîgariya Sûriyeyê ku hin ji wan weke mayînan metirsîdar in (her wekş kampa Holê). Li kêleka van hiljimartinên borî, Sûriyeyê rastî dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê yên girêdayî Îtilafê ya yekser hat. her wiha baregehên leşkerî yên Rûsiya, Îran û Amerîkayê bi awayekî berfereh belav bûn. Ev bûyîna Sûriye weke meydaneke şerê herêmî û navneteweyî şîrove dike.

Xuya ye diyaloga stratejîk a hundirîn yek ji çareseriyên herîn girîng e ku xizmeta doza welatiyan dike di van rewşên zehmet de da ku kelem û astengî werin rakirin û dîwarên baweriyê di navbera tevahî pêkhateyên wê de were avakirin. Eger rikberiya sûrî di gotara xwe ya siyasî de cidî be ku ev deh sal in girtiye ser xwe û dide diyarkirin ku ew ê Sûriyeyê ber bi demokrsî û azadiyê ve bibe da ku tevahî pêkhateyên wê bi azadî û rûmet bijîn bêyî ku tu cudahî di navbera çîn, etnîk û pêkhateyan de hebin, eger ew di vê yekê de cidî be, naxwe gerek e bi rêya diyalogên sûrî-sûrî bi gel re li hev were da ku welat ji vê rewşa aloz rizgar bike. Jixwe berê jî gotine "tu dereng bigihêjî, çêtir e ku tu bi yek carê negihêjî". Ji bo dîtina çareseriyeke siyasî ku her kes bi qîm û reza xwe veger welatê xwe, welat ji nû ve were avakirin û gel bi ewlehî bijî dûrî dengê çekan û îdyolojîkên dogmayî, pêwîst e yekrêzî were pêkanîn û zimanê diyalogan di ser zimanê çekan re were girtin. Aloziya Sûriyeyê ji her hêzeke siyasî û leşkerî re çesipand ku çareserî dê tenê siyasî be û bi rêya beşdarbûna tevahî hêzên aktîv be. Eger na, wê hingê çareseriyên leşkerî dê xêrê ji bo tu kesî bi xwe re neyînin û dê tenê

---

%d8%a3%d9%83%d8%ab%d8%b1-%d9%85%d9%86-606-%d8%a2%d9%84%d8%a7%d9%81-%d8%b4%d8%ae%d8%b5%d8%a7%d9%8b/438781/

[11]nûçeyên N, piştî heşt salan ji şer, ziyanên aborî gihaştin nêzî 442 milyar dolaî. 23yê îlona 2020
https://news.un.org/ar/story/2020/09/1062062

[12] Nûjeyên NY, Pêdiviyên Sûriyeyê pir mezin in û alîkarî tenê têra asta jêrîn dikin. 13 avdara 2019
https://news.un.org/ar/audio/2019/03/1028831

rûxandin, wêrankirin, kuştin û koçberkirina gelê Sûriyeyê bi xwe re bîne. Jixwe gelê Sûriyeyê berî çêja van tiştan di van deh salên borî de tam kiriye û dizane çi wateya van tiştan e.

---------------------------------------------------------------------------------------

**Jêder û çavkanî:**


-*Hevdîtinek bi siyasetmedar Salih Mislim (berdevkê PYD).*

-*Hevdîtinek bi siyasetmedar Sîhanok Dîbo (nûnerê berê yê MSDê li Misrê)*

-*Congressional Research Service- Armed Conflict in Syria: Overview and U.S. Response- Updated July 27, 2020- p21- https://fas.org/sgp/crs/mideast/RL33487.pdf*

-*Malpera fermî ya MSDê*
*https://m-syria-d.com/?page_id=8821*

-*Malpera Desteya Hevrêziya Niştumanî*
*https://syrianncb.com/%d8%a3%d8%ad%d8%b2%d8%a7%d8%a8-%d8%a7%d9%84%d9%87%d9%8a%d8%a6%d8%a9*

-*Navenda Belgekirina Binpêkirinan li bakurê Sûriyeyê. Komkujiya tîrmehê li bajarên Tiliran û Tilhasil. 29 tîrmeh 2019*
*https://vdc-nsy.com/archives/21449*

-*Nûçeyên NY, bernameya tîara cîhanî, Kovîd 19, zêdebûna pêdiviyên penaberên sûrî, 23yê hizêrana 2020*
*https://news.un.org/ar/audio/2019/03/1028831*

-*Riwangeha Sûrî ya Mafê Mirovan, ji destêka şoreşê ve, zêdeyî 585 hezar kesî hatin kuştin an jî şehîd ketin kanûna paşîn 2020*
*https://www.syriahr.com/353886/353886/*

-*Nûçeyên N, piştî heşt salan ji şer, ziyanên aborî gihaştin nêzî 442 milyar dolaî. 23yê îlona 2020*
*https://news.un.org/ar/story/2020/09/1062062*

-*Nûjeyên NY, Pêdiviyên Sûriyeyê pir mezin in û alîkarî tenê têra asta jêrîn dikin. 13 avdara 2019*
*https://news.un.org/ar/audio/2019/03/1028831*

# Koçberiya pêkhate û neteweyan ber bi Reqayê ve

## ( Ereb, Kurd, Ermenî, Asûrî û Suryanî)

**Mihemed Elizo: Rêveberê muzexaneya Niştimanî li Reqayê**

### Reqa di bin desthilatdariya Osmaniyan de:

Desthilatdariya "Memlûkan" li ser girava Ferat û Reqayê heta sala (1516-923k )dewam kir. Sultan "Selimê yekem" di şerê "Merc Dabiq" de Memlûkî têk bir û paşê tevahiya girava Feratê kete bin desthilatdariya Împeratoriya Osmanî û pêkhateyên Ereb, Asûrî, Kurd, Suryan, Merdelî û yên din li bajarê Reqa û bajarên cizîrê, niştecih bibûn . Reqa, ji ber cihê we ya dîrokî, xwedî girîngiyeke taybet bû. Ji ber vê yekê, dema biryara damezrandina parêzgehan di sala 1566 z de hat derxistin, "Reqa" bû parêzgehek mîna parêzgeha "Bexdayê" û ji komek herêm û bajaran pêk dihat. Tevî ku Siltanê “Silêmanê Qanûnî” fermana jinûve avakirina “Reqqayê” da jî, lê fermana wî tenê mabû gotin, ji ber ku welatî wî tijî pirsgirêk û xem bû.di destpê de, Împaratoriya Osmanî jî nekarî êlên cihereng bi cih bike. Rêwî "Tişîzney" ku di sala 1837'an de serdana bajarê "Reqa" kiribû; dibêje ku ew li gundekî mayînde û sabit rast nehat. Ferhenga Erdnîgarî ya Almanî bajarê “Reqa” di sala 1855an de wekî herêmeke xwedî dexlûdan, fêkî û xezalan bi nav û deng; bi nav dike û berî sala 1850 z, kes li wir nebû. her wiha berdewam kir ku bajarê "Reqa" wêraniyek e, ku bi zeviyên tijî xêr û bereket hatiye dorpêçkirin.

Ji ber vê yekê, wek me anî ziman, piştî êrîşa mongolan li ser Reqayê; bajar çend sedsalan wêran ma. Di sala 1863 de, bi mebesta parastina berjewendiyên xwe, Osmaniyên dagirker baregeheke qereqola Osmanî ya nû li wir ava kirin, da ku ewlehiyê biparêze. Bi damezrandina vê qereqolê û piştî hatina malbatên Ereb û malbatên din ên ji Tirkiyê, Mûsil, Nisêbîn û rojhilatê Sûriyê, bi taybetî piştî sala 1860`li derdora wê qereqolê li Reqayê bicih bûn. Vê yekê hişt ku gelek malbatên Ereb û neteweyên din ên wekî

Kurd, Merdalî, Asûrî, Ermenî, Çerkez, Çeçen û Tirkmen piştî sala 1900 koçî Reqayê bibin û hewl bidin bi pêkhateyên din re di nava dîwarên kevn de bijîn, jixwe ew bûn ê yekemîn ku li Reqayê neştecih bûn.

gelek rêwiyên biyanî yên weke Lady Anne Blunt, Zaxaw û hwd serdana Reqayê kirin. Lady Anne Blunt, ku di sala 1878z de serdana Reqayê kiriye, behsa hebûna kon (malên ji mûyê bizinanam) û koçeran li wir hebûn.Lê rêwî, Dr"Zaxaw" ku di sala 1879'an de serdana " -Reqa" kiriye, me ji raporên wî agahîne hûr, der barê hemû aliyên jiyana li Reqa gihiştin destê me, wiha dibêje: ( serjimêriya Reqayê tevî polîsan û malbatên wan ne zêdeyî 100 kesî bû ), piraniya wan koçer bûn, ji 39 – 40 zilamî bûn, her wiha min çend firoşkarên gerok ji Helebê jî li wir dît û min li başûrrojava di navbera çar û panzdeh xaniyên xizan dîtin û heman jimar nîzî dîwarê başûr dîtin. Gelê "Reqa" berê bi zaravayê biyabana erebî diaxivîn û ev qonaxeke diyar e ku destpêka "Reqa" di qonaxa jiyan û aramiyê de nîşan dide

Pêkhate û netewên ku piştî nîvê duyem ê sedsala 19an, ango piştî sala 1850z, li Reqayê niştecihbûne ev in:

**yekem pêkhateya Ereb:**

Ev pêkhate dibe ya herî bêtir xwe li Reqayê girt ku ji hejmareke mezin ji êl û hozên erebî pêk tê ku ji “Iraqê” bi rêya “Nesîbînê” koçberî axa “Reqa” bûne û di sedsala heftemîn a zayînê û vir ve li gundewarê wê û li bajêr bi cih bûne. Êlên mezin, wek êla Bûşaban û yên din, li Reqa û derdora wê bi cih bûn. Van eşîran karên xwe yên şivantî û çandiniyê dikirin û mîrata çandî û rêûresmên xwe ji mîrateya kevnar a erebî ku bi şêwe û rengên cûrbecûr yên helbest, kevneşopî û gertev û gerdîşe, bi rêve dibirin. ez bi vê yekê axaftina li ser pêkhateya Ereb bi dawî dikim, ji ber ku axaftina li ser pêkhateya ereb wê gelekî dirêj be.

**Pêkhateya Kurd**

Kurd ji hêla bakur ve derbasî Reqayê bûn , li bakurê bajêr li taxeke teybet bi navê taxa kurdan bi bich bûn. Kurd miletekî kevnar û Arî ne, di serdemeke dîrokî de hebûna xwe parastiye. Di navîna hezarsala duyem berî zayîn de hebûna wî pir belî û vedeng da( şaristaniya Mîtanî ), bi Ereb, Asûrî, Eramen û gelên din ên Samî re mil bi mil jiyaye. Kesayetiya xwe ferz kirin û taybetmendiyên çandî û derûnî yên ku wan ji nijadên din cuda dike

pêş xistin. Tê zanîn ku gelê kurd hezker û girêdayî eşîrtiyê ye. ev gel bi durustî, dilpakiya xwe, rêzgirtina bêdawî ya ji bo jinan û tolhildanê tê naskirin, ew jî mîna Ereban pir rêzê didin mêvanan, mirovin wêrek in, ji mirinê natirsin, xwedî taybetmendî ne ku di jiyana xwe ya civakî ya eşîrî de pê tên naskirin weke:

**-** girîdayî rêberê xwe ne û li gel wan cihê rêzê ye

**-**Têbîneyeke balkêş heye ji bo hinek kurdan cihê gumanê ye ku kurdên li herêma cizîra Firatê, Reqa, Ruha û Diyarbekirê jî di nav de, bi zaravayê (kurmancî, Zazakî û goranî diaxivin. )( Ebdulhemîd el- Hemed êlên Reqayê Şam 2003). Kurd bi giştî li herêmê misilman in, lê mîr û bêgên wan li gor pirtûka "Şerefname" koka xwe Êzdî ne ku ta niha pabendî kultûr û nerîtê xwe yên berî islamê ne.

**-**Hebûna kurdan li Reqayê piştî peymana "Kuçuk Kaynarca 1774" ku xwesteka wan jî avakirina mîrgehên taybet bi hin kesayetine mîna " Elo Başa Siwêrkî" dest pêkir, û dema dewletê Elo Paşa erkdar kir ku wilayeta Orfa çak bike, lê biser neket û di sala 1796 an û bi alîkariya waliyê Reqayê Teymûrê paşa jê bar kir. Teymûr Paşa ku dibe ji xelkê bajarokê ( Quba Heyder)a Orfelî û di sala 1787 an de bû waliyê Helebê, lê vegeriya Amedê û artêşek ji kurd û ereban bi nave ( Hêza milet), û di sala 1791 an navê wî bû Teymûrê Milî, encumenek şêx û rûsipiyan bi nave ( Kum bineqiş) ava kir, komek mor jî ku ji sê koman pêk tê çêkir:

**-**Kurd ji şêxê şêxan in

**-**ji Êzdiyan in û ji rûsipiyên Serfiyan, Xaldan, û Merwaniyan in, di serî de malbata Hisênê Qenco

**-**Erebên Cibûr, Şemte, Idwana, Qeraca û ji bilî wa jî Begara û Kewawîs

**-**Malbata ( Oso) ku kurdên Reqayê ne.

Li milekî din jî nakokî di navbera Teymûr Paşa û dewleta Osmanî de çêbû, di encamê de teymûr Paşa reviya û xwe li çiyê girt, piştire birayê wî Ibrahîm
Paşa şûna wê girt, bi artêşa Osmanî lihev hat û bi navbeynkariya waliyê Mêrdînê yê wê demê Teymûr Paşa hat efûkirin.

Di serdema avakirina Reqayê de, bi taybetî piştî salên 1860- 1915 an, komine ji kurdan, bi taybetî kurdên milî koçberî Reqayê bûn, ji bilî kurdên milî jî hin êlên din jî hatin Reqayê wek ( Berazî- Kîtikan- Bêcan- pişaltiyan-

Elidîn- Sorguliyan) . Kurdan li rex biryayê xwe Ereb û pêkhatiyên din Reqa ava kirin, niha li Reqayê nêzî ( 2800- 3200) malbatên Kurd hene û ji ber êrîşên dewleta Tirk li ser bakurê Sûriyê û dagikeriya wê, hino hino jimara kurdan li Reqayê zêde dibe ku di encamê de; di navbera kurd û ereban de hevjînî, nêzîkatî û pêkvejiyanê rû da, jixwe Kurd jî di karê xwe de dilsoz in, û çi kesê kurdan nas dike vê taybetmendîyê di wan de dibîne.

Li Reqayê, kurdan rêûresmên sincî, folklor, cejn û gertev û gerdîşeyên xwe pê tanîn û diparastin, mîna rêûresên şahiyan ku pir nêzî rêûresmên pêkhateyên din ên li Reqayê dimînin. Di dirêjahiya dîrokê de gelê Kurd wêjeya xwe ya navdar a gelêrî ya nivîskî pêk anî, Mela Ehmedê Cezîrî ku di sedsala yanzdehan a zayînê de (1055-975 z) de jiyaye, yek ji pêşengên destpêkê yên destpêkirina nivîsandin û arşîvkirina çanda Kurdî ye. Dengbêj û vebêjerên Kurd ji bo parastina mîrata xwe ya çandî, sincî û gelêrî ji windabûn xwedî keda herî mezin bûn. Ji navên naskirî yên ku parastina mîrata çanda kurdî kirin, vebêjer (Cebro Kibiêj) û dengbêj (Dengbêjo) ku du ji pêşengên wêjeya devikî ya kurdî ne, ji ber ku wan wêneyekî rast û cihêreng ên welatekî ku di bin nîra çînên serdest û nakokiyên êlan de êşin mezin kişand, şênber kirin. Mîrat û wêjeya kurdî neynika ku ruh, hest û dîroka gelê kurd ê têkoşer nîşan dide. Di serdema nûjen de li Reqayê navine xuyanî ji helbestvan û şêwekar, bi pêşengiya helbestvan Umer Bozan, hunermendê navneteweyî Inayat Ettar, şêwekar Elî Şêxo û şêwekarê qambilind Xelîl Hemsûrk, berez bûn.

**Pêkhateya Ermenî**

Ermenî, Athanos, gelekî xwedî taybetmendiyên zimanî û derûnî ye, dîrok û rewşa erdnîgarî ya taybet, wan ji gelên din yên derdorê cuda dike.

Ermeniyan bi taybetî di serdema Qiral Dîkranê Mezin (55-94 bz) de hebûna xwe ya dîrokî tomar kir, di dema wî de Ermenîstan ji dewleta Romê cuda bû, Ji ber navûdengiya vî padîşahî, (Şîşron) weke padîşahê mezin ê Asyayê nev lê kir. Serweriya Qiral Dîkran gihişt Entakya, Haran, Orhî û Nîkforîon (Raqa) yê û dema Împaratoriya Osmanî hat damezrandin, Ermenî ketin bin desthilatdariya Osmaniyan.

Sedemeên koçberiya Ermenan bo Reqayê: Ermen jî mîna kurd, Suryan, Çerkez û ji bilî wan koçberî Reqayî bûn. Sedemên ku Ermenî koçberî Reqayê

bûn ku di konfransa Konstantînopolîsê , di sala 1912an de, biryar hat dayîn ku her heft herêmên Ermenîstanê bikin du beş, di beşa yekem de ev eyalet hene: Trabzon, Sêwas, Xerbût û Diyarbekir, di beşa duyemîn de jî Wan, Tiblîs û Erziromê hene. Lê Tirkiye li rex Almanyayê ket Şerê Cîhanê û rewşa ewarte ragihand û dest bi girtin, kuştin û zîndankirina Ermeniyan kir. Pêkhateyên din ên wekî Ereb, Kurd, Suryan û yên din jî ji vê tundî û kuştinê bêpar neman. Her wiha çi kesê ku haribe çekê higerejî bi kotekî tevlî operasyona xwe ya leşkerî ya qirêj kirin, ji bo wê jî kerwanên mirinê bi du rêyanin hat destnîşankirin:

**-**Rêka yekem, ji Teblîsê, Wan û Diyarbekir destpêkir ta Serê Kaniyê

**-**Rêka avê ku di çemê Firatê re ji Meletiya, Biracîk û Reqa bo bajarên herêma cizîra Firatê bû.

Nêzî 70 malbatên Ermenî gihiştin Reqayê, hatin pêşwazîkirin û bi malbatên Reqawiya re hatin neştecihkirin, paşê bûn xwedî xaniyên taybet ku bêtir hebûna wan li taxa Sekenê û kolana Wadî bû. Ermeniyan rêûresî, çand û şahiya cejnan bi azadî û serbestî dikirin. Li bajêr du kenîseyên bi nave kenîseya Seyidetulbişara û kenîseya Şehîdan, hebûn, jixwe her du kenîse jî li ser destê Daişê hatin rûxandin. Ermenan jî mîna kurdan beşdarî avakirina Reqayê bûn, gelek ji wan bazirgan, mekanîkê erebeya û firoşkarê caw, mast û penêr bûn. jixwe tê zanîn ku Ermen yekem car li Reqayê dest bi lîstika futbolê kirine û yên pêşî bûn ku cihê wênekêşiyê vekirin, gelek ji wan nivîskar wêjevan bûn mîna lêkolîner Arsîn gomeciyan. bi vî awayî Ermen, Suryan, kurd, Ereb û Çerkez li Reqaya "El- Hewraa" bi hevre wek bira di rewşek ewle û hezker de, dijîyan, lê dema Daişê bajar dagirkir pir astengî ji wan re derxist, bac li ser wan sepand , hişt ku piraniya wan ji bajêr koçberî Heleb û welatên Ewropî bibin.

**Koçberiya Çerkezan bo Reqayê**

Di despêka sala 1906 an Çerkez û Çeçanî gihan Reqayê, di wê serdemê de nêzî 50 erebeyên dagirtî koçber ji welatên Kafkasyayê gihiştin Reqayê, xelkê herêmê pêşwaziya wan kir û li aliyê başûrê rojava; ji derveyî sûra kevnare ew bicih kirin û ji bo vê yekê jî 50 donim erd ji wan re hat veqetandin. ji ber ku li ser ola mislmantiyê ne mizkevtek ji wan re hat damezrandin ku ta niha jî navê wê mizkeftê li ser navê Çerkeza ne. Tevî ku hinkan ji wan piştî rûxandina yekîtiya Sovyet vegeriyan ware xwe, lê hîn jî

çend malbat li Reqayê mane û li takekê bi navê taxa Çerkezan li gel pekhateyê din bi aramî dijîn

**Pêkhateya Asûrî û Suryanî li Reqayê**

Helbet tiştê ku ev pêwendî û girêdan xurt kiriye, hebûna gelek tiştên hevpar ên weke ax, jîngeh, berjewendiyên hevpar, çarenûs û rêgezên rêzgirtina hevdu ya ji bo azadiya raman, reftar û ramanê dûrî serdestî, tûndetî û hevnepejirandinê ye. Jixwe ev hevgirtin; hevgirtina civakî û pêvejiyana aştiyane ye, ya ku Reqa di dirêjahiya dîroka xwe ya kevnar de nas kiriye, çi di qonaxa wêrankirinê de be û çi jî di qonaxa avakirin û aramiya di navarasta sedsala 19 de be. Bi vî awayî van hemû pêkhateyan karîbûn Reqa bigihînin asta bajarên pêşketî û rûmeta wê ji nû ve vegerînin. Lê ji nişka ve komên çekdar êrîşî Reqayê kirin û bajar û derdora wê bi temamî dagir û talan kirin, ji ber wilo Hêzên Sûriyeya Demokratîk û hevpeymaniya navdewletî li dijî van hêzên tarî dest bi şer kirin û ew ji bajêr derxistin, lê di encamê de bajar wêran bû.

Îro girîngtirîn nîşana aramiya sivîl û bidestxistina dadmendiyê di navbera hemû pêkhateyên niştimanî de li Reqqayê, destkeftiyên xizmetguzarî, aktîvkirina saziyên civaka sivîl, xebat ji bo pêşxistina ruhê hevgirtinê di navbera endamên civakeke cihêreng de xutrkirina jiyana hevbeş e. bi vê yekê Reqayê bi dîroka xwe ya bedew xwedî xatîreyek geş e

---------------------------------------------------------------------------

**Jêder :**

*- Kovan Kovan, yekîneyên şaristanî li welatên şam 1984 . Qasim tiwêr*

*- El- Reqa duret el- firat- komek ji lêkolîneran –çam /1992/*

*- Eyaş Ebdulqadir şaristaniya geliyê firatê şam/1984/*

*- Selîm Adil e.Heq şûnwarên Sûriyê berga 13/1962/*

*- Ebdulhemîd el-Hemed, êlên Reqay û Cizîrê- Şam/ 2003/*

*- Ebdulhemîd el-Hemed dîroka Reqa ya şaristanî/ 2009/*

# Siyaseta Berevaniyê Ya Rikberiya Islamî Ya Sûriyê

## Pêşgotin

Bêguman, şepêlên tundrew yên îslamî yên siyasî di rikberiyra Sûriyê de nekarîbûn projeyên xwe li welêt bi cih bînin ku rewşa wanî dawî vê rastiyê nîşan dide. ji ber siyaseta xwe ya çewt û gendel û windakirina hêza xwe ya gelêrî li seranserî erdnîgariya welêt, hişt ku ev rikberî tenê têkeve rewşa berevaniyê û însiyatîfa êrîşan ji dest bide, çi li eniyên şer, çi li ser pêkanîna operasyonan di kûrahiya dijminê xwe yê sereke (rijêma Sûriyê) de, li rex pirbûnaûna cudahiyan di navbera şepêlên wê de , ew ji ber ji bo faktorên girêdayî bîrdozî û berjewendiyên madî, hişt ku hêzên dijber di nava aliyên rikberiyê bi xwe de çêbibin. Dibe eke ev jî yek ji sedemên belavbûna wê di nav komên hêzên herêmî û navneteweyî de, yên ku bi awayekî pragmatîk têkildarî aloziya sûriyê dibin. Ev şepêl niha li ser erdnîgariyeke biçûk ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatine dagirkirin, hevrikin. Têkçûna van şepêlan hişt ku ew bixwe ji bo gelên ku li herêmên di bin kontrola wê de û li herêmên li nêzî operasyonên wê yên leşkerî dimînin, bibin pirsgirêkek rasteqîn û bibe astengek li pêşiya çareseriyên siyasî yên pêkan ên krîza welat. Tiştê ku me anî ziman, şaştiyên stratejîk in ên ku serokên van rikberiyên (leşkerî û siyasî) ketinê, her wiha lewaziya xwendin û analîzkirina dîmena siyasî û ewlehiyê ya navxweyî, herêmî û navneteweyî, dide xuyakirin. Ev tişt hemû û di nav de tundûtûjiya rejîma Sûriyê, dibe yek ji faktorên sereke yên berdewamiya kirîza welêt û wêranî, kuştin, hejarî, belengaz, azar û dagîrkeriyê ye ku li seranserî welat belav bûye.

Di nava vê hevrikiya heyî de, hêzên sereke yên rikberiyê ji bo parastina hebûna xwe ya siyasî, leşkerî û îdarî, bi her awayî siyasetên parastinê yên pragmatîk dimeşînin. Ji bo ku dilsoziya alîgirê xwe biparêze, demagojiyê bikar tîne û dijminên xeyalî (weke Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê) çêdike ku vê rêveberiyê bi gotinên dûrî rastiyê bi mebesta xapandinê wê bi nav dike. Li milekî din jî metirsiya qirkirinê di bin navê mezhebî (Elewî-Şîî) li herêmên di bin kontirola rejîma Sûriyê û hevalbendên

wê de , derdixe pêş. Îdeolojiya Îslama siyasî ya tundrew (Ixwanî - Selefî) ji bo bihêzkirina van siyasetan, peydakirina hêviyek xeyalî ya serketinê, û dûrxistina her kesê ku baweriya wê ya siyasî napejirîne, bikar tîne.

Ev lêkolîn bi bi alîkariya nerînên siyasî yên çend navendên lêkolînan ên navnetewyî, hewl dide siyaseta berevaniyê ya rikberiya Sûriyê; di aliyê wê yê îslamî de binirxîne, her wiha hewil dide agahiyên ku ji çavkaniyên herêmî li ser herêmên di bin kontrola wê de û hin saziyên têkildarî mafên mirovan û raporên medyayî yên ku rewşa navçeyên rikberiyê dişopînin û li gorî têkiliyên wê bi hêzên herêmî û navdewletî yên çalak di kirîza Sûriyê de, peyda bike.

**Têgeha Siyaseta berevaniyê**

Tûê zanîn ku ev têgeh li cem gelek kesên ku di asta herêmî de bi siyaset û ewlehiyê re têkildar dibin, nû ye, lê tevî wilo jî di çalakî û xebatên cihêreng de; ji bo bidestxistina hin destkeftiyan û piştî derbaskirina astengî û keleman, bi awayekî jixweber tê bikaranîn. Ji bo bidestxistina têgeheke zelal a siyaseta parastinê, ya baş ku her du têgeh "siyaset û bervanî" werin pênasekirin.

Ji bo siyasetê, hema hema hemû çand li ser yek têgehê li hev dikin, ew jî girêdayî pênaseya Yunanî ji siyasetê re (hunera rêvebirina bajar), ku desthilatdarî û rêvebiryê pev girêdide , ango şêwaza nîzîkatiya desthilatê bi civakê re. Ev yek jî me dajo ku em têkiliya siyasetê bi têkiliyên di nav yek civakê de û awayê danûstandina wê bi endamên wê re gengeşe bikin.

Li vir jî pir girîng e ku mirov pênaseya ramangêrê Navneteweyî Ocalan ji siyasetê re weke diyardeyeke civakî bîne zimann wiha pênase dike:" Birêvebirina karûbar bi azadî, û pêşketina kesayetiyê; pêşketnia civakê misoger dike. Cihê azadiya civakê û qada afirandinê ye ku tê de pêşketin bi wate û vîn geş dibe. Ew têgihiştina civakî ye ku xwe û nasnameya xwe ji hêla ramanî û piratîkî nas bike û di ber wan de berevaniyê bike"([1])

Jixwe sinc jî dibe rengekî ji rengê siyasetê. Li ser asta tekekesî jî zanistnamya siyasî( ya elektronîk) wiha siyastmedar pênase dike:Ew kesê diplomasî û nerm e û dikare hemû dahat û amûrên berdest bi kar bîne, da ku bigihîje armanc û mebestên taybet; bêyî ku rewatî û nerewabûna van armancan hebe"([2]). Hinek jî hene siyasetê bi têgînên pragmatîzm û

demagojiyê ve girê didin . Li gorî tiştê me anî ziman, xuya dike ku derbirîna ku dibêje" Hunera sazkirin û birêvebirina têkiliyan; ji bo berjewendiya demkî an mayînde" guncav e ji bo zielalkirina tigeha giştî ya siyasetê û peyva (huner) hat bijartin, ji ber ku pisporiya wê bi behreya kes ya afirînerî ve girêdayî ye. Ji bo bergiriyê jî, Hema bêje hemû çand li ser yek têgehê li hev dikin, ew jî (rêgirtina metirsiyê), ango berxwedana bi her awayî li hember her tiştê ku zirara madî û manewî bide civak û kesan. Xuya ye ku çawaniya zirarê ji baweriya kesekî ji kesekî din cuda ye.

Li gorî hin lêkolînên nûjen([3]), siyaseta parastinê, dibe ew tedbîrên ku ji bo geşepêdan û hevrêziya hemû karînên siyasî, leşkerî, saloxgerî, aborî û çandî tê bikar anîn, û biçekdarkirin û asayîkirina hin têkiliyên guncaw û dûrxistna hinên din ên ku dikarin bibin metirsî û bikarnîna siyaseta herêma gewr( [4]) ji bo rûbirûbûna metirsî û gefên cuda di rewşa aştî û şer de. Helbet îdeolojiya desthilatdariya heyî bandorê li cewherê vê siyasetê dike.

Weke me li jor anî ziman, em dikarin siyaseta parastinê weke komek tedbîr û reftarên dîplomatîk diyar bikin( [5]), ya ku dikare her statuyekê ji metersî û ziyanan biparêze û rêveberiya wê ya xweser ku karibe di nava vê statuyê de, karûbarê xwe bi rêve bibie, misoger bike û mirov dikare li ser tekekeskî jî cîbicî bike, ango her kesek ji bo pêkanîna ewlehiya xwe ya mirovî, siyaseta xwe ya parastinê heye. Di vir de, li ser asta tekekesî jî, mirov dikare derberke din pêşkêş bike ku ew weke amûreke garantiya karîna kes a ji bo xwe bi rêvebirina karûbarên xwe, ewlekirina pêdiviyên xwe yên madî û manewî, berxwedana li hember metirsiyan û dermankirina zerarên ku diqewimin.

Der barê paradîgmaya neteweya demokratîk, têgîna siyaseta parastinê pir nêzî pergala xweparastinê ye( [6]).

ji ber wilo, her statuyek cure û rengê wê ya siyas, civakî, aborî û leşkerî çilo dibe bila bibe, siyasetek wê ya parastinê ya taybet heye ku li gorî cure û rengê metirsî hatiye daraştin, lewra mirov dikare wiha wê pênase bike ku ew ji bo bidestxistina stratejiyê mîna çalakiyek taktîkî ye (armancên demdirêj), her wiha dibe garantiya hevgirtina rêxistinê û parastina wê ji metirsiyên pêkan ên ku dibe di paşerojek nêzîk de biqewime, yan jî ji bo çareserkirina encamên zirarên çêbûne.

## Bingeha rêxistinî yên cuda yên Rikberiya Îslamî

Piştî tekçûnên siyasî û leşkerî, rikberiya islamî ya sûrî di çarçoveya erdnîgariyek teng de dimîne ku li gundên bakurê Laziqiyê û Idlibê, gundên bakur, rojava û rojhilatî Helebê û herêmên dagirkirî (Efrîn – Girî Spî - û Serêkaniyê) dimîne. Serweriya van herêman jî du hêzên leşkerî li xwe dabeş kirine û girûpên din ên çekdar jî di bin baskê wan de ne, her du hêz jî bi navê "Heyet tehrîrulşam (selfî)"([7]) ku serweriya xwe di bin sîwana qaşo hikûmeta bi navê(Inqaz) li herêmên di bin destê wê de ne dimeşîne, ya di jî milîsên artêşa niştimanî( Ixwanulmislimîn) ya yekserç girêdayî dewleta Tirk ku di bin sîwana hevpeymaniya sûrî û qaşo hikûmeta demkî karê xwe yên siyasî û îdarî dimeşne. bi giştî têkiliyek hevjiyanî di navbera wan herdu hêzan û dewleta de heye, lê dewleta Tirk Ixwanulmislimîn ji selefiyan yên ku dilsozên tevgera wehabîne û şerê sultaniya osmanî kirine , çêtir dibîne. siyaseta herdu hêzan ji hêla hêzên rikber ên din rastî berxwdanek mezin tê, di serîda Hêzên rizgarkirina Efrînê ku qada operasyênên wê yên leşkerî herêmên kurdî yên dagirkirîne(rojavayê çemê firatê). ji xwe ev hêz hêzeke sekuler e, dixwaze bi ewayekî demokratîk rewşa Sûriyê çareser bibe, şervanên wê jî hemû yê herêmê ne, li dijî dagirkeriya Tirkiyê şer dike. Hêza din jî, rêxistinên radikal nûnertiya wê dik ku bi ser Qaîdê ve ne û rijdin li ser rêgeza cîhada cîhanî ji bo şerê xaçperest, Cihû û alîgirê wan, ji bo çareserkirina kêşeya welêt jî, xîlafeta islamî dibînin bersiv. Ev hêz piraniya endamên wê biyanî ne, ji bo serweriyê jî bi Heyet Tehrîrulşam re nakok e, li milekî din jî carnan berjewendiyên leşkerî yê Tirkiyê, Rûs û rêjîmê dike armanc. Ev hêz niha pir fişar ji hêla Heyet Tehrîrulşam, Rûsya û Tirkiyê lê dibe, ji ber wilo dibe ku Afganistan piştî vekişîna Amerîka bibe qada wê ya pêkan. ji bo vê yekê jî; ji serkêşê tabûra (Cundulşam a Kafkaz) Mislim Çeçanî xwest ku tabûra xwe hiweşîne, yan jî here Afganistanê([9]). Çavdêr diyar dikin ku Heyet Tehrîrulşam hewl dide kontrola xwe li ser tevahiya herêmê ferz bike; Ev yek dibe nîşana ku hêzên Îslamî nikarîbûn atmosfereke siyasî ji bo çareserkirina aloziya welat, peyda bike, di encamê de rikberiyek di nava rikberiyke de çêbû, û her girûpek leşkerî girêdayî serokê girûpê ma, û her girûpekê dixwest ya din tune bike.

Herêmperestî, îdeolojî û eşîrtî ya her girûpekê, sedemên sereke ne yên belavbûna û windabûna hesta neteweyî ya vê rikberiyê ne.

Ji ber vê yekê, tevî yekbûna li ber berçavan ya hin hêzên rikberiya îslamî([10]), Lêbelê, ew ji perçebûn û cudahiyên îdeolojî astengiyan dikişîn in, ku pêkane di her demekê de şerê hev bikin û bibe encama wêranî û serkeftinek ji bo Rêjîma sûrî û hevalbendên wê. Xuyaye gurkirina qada Afganî piştî vekişîna Amerîka û pêkana şerkî li ser sînorê rojava ya Çînê û rojhilatî Îranê, bibe encama zindîkirineke nû ya ramana olî ya tund.

**Bingehên siyaseta berevaniyê ya rikberiya islamî.**

Rikberiya islamî ya Sûriyê bi giştî li ser du beşan dabeş dibe, Îxwan û Selefî. Her du jî ji hêla deolojîk hevrik û dijber in. Her yek ji wan siyaseta parastinê ya cuda dimeşînin û bi baweriyên xwe yên siyasî ve girêdayî ne. Ev siyaset li gorî du xetan tê daraştin, yek bi têkiliyên derve ve girêdayî ye û bi giranî li ser hevpeymaniyeke xurt bi rejîma Erdogan re hatiye girêdan; û amadeye di her pêvajoyeke siyasî de ku bikaribe berfirehbûna leşkerî ya desthilata navendî û hevalbendên wê rawestîne, û hewil dide pejirandineke navneteweyî ji bo statuya xwe ya siyasî û leşkerî bidest bixe. Xeta din, girêdayî peywendiyên xwe yên navxweyî, ku her şepêlek rêgezeke xwe ya taybet der barê çawaniya pêkanîna serdestiya xwe li deverên ku kontrol dike heye, û çawa derbasî deverên din bibe , û aliyên leşkerî yên lawaz tevlî hêzên xwe bike. Bi giştî têkiliya bi rejîma Erdogan re ji bo her du xetan jî faktoreke hevpar e.

**Ji bo xeta têkiliyên derve**

Sher du xetan eşkere xwe xistine bin baskê rejîma Erdogan, ku armanc jê sûdwergirtin ji çapemenî, saloxgerîtî û ji piştgiriya hewayî û topxaneya hêzên dewleta Tirk li "herêmên kêm şer”, ne wilo tenê xalên çavdêriyê yên artêşa Tirkiyê bûne asteng li ber pêşketina hêzên rêjîma Sûriyê û hevalbendên wê û rêgiriyê li ber her êrîşekê li ser bingehên rikberiyê li herêmên dagirkirî dike, bi taybetî li herêmên Rêveberiya xweser, da ku talan bibike û pêvajoyên neştecîkirinê û paqijiya nijadî pêk bîne, her wiha hin komên bê dîsîplîn veguhezînin wan deveran, da ku dûrbûnekê navbera komên îdeolojîk ên nakok li herêmên çêke, bi armanca ku wan ji hêla rêxistinî jihev bixe û wan bike çeteyê ku bixwaze wan li dijî Hêzên Sûriya Demokratîk û mijûlkirina wê bikar bîne. Jixwe der du alî jî; ji bo qirkirina kurdan bi artêşa tirk re dibin alîkar, malên kurdan talan dikin, dest datînin

ser milk û samanên kurdan û komelgehan jî ava dikin, her wiha her du alî jî , bi taybetî ( şepêla Ixwanulmislimîn) çeteyên xwe pêşkêşî rêjîma Erdogan dikin ku wan ji derveyî sûrî bkar bînin, mîna Ermenistan, Lîbya, Yemen û Hrêma Kurdistanê. vê dawiyê jî her du şepêl li Afganistanê bûne kaxezeke serkeftî di destê Erdogan de .

Siyaseta berevaniyê ya ji bo vê xetê dibe ku di asta taktîkî de serkeftî be, lê di asta stratejîk de çewt xuya dike, ji ber ku nasnameya neteweyî ya welat tune dike û dihêle rastî perçebûnê were, ji bilî afirandina hestên nefretî û dijminatiyê di nav civakên herêmî de, dibe ku bandora wê gelek salan bidome. Dibe ku jî her du şepêl rastî tolhildanê bên û ji derveyî deverên ku di destê wan de ye, werin qewitandin, û niştecihên ku li herêmên dagirkirî hembêzgeha wê ya gelerî pêk tînin, ji komelgehan veguhezînin kampan, ew jî heger di bazara koleyên siyasî de werin firotin, mîna peymanên siyasî yên di navbera Erdogan û Pûtîn de pêk hatin, an jî eger rejîma niha ya Tirk hilweşe yan jî hêzên Tirk di bin zexta navneteweyî de ji herêmên dagirkirî vekişin, an jî bi destxistina berxwedêran çekên bi kalîte ku bikaribe hêzên hewayî û topxaneyên Tirk bêbandor bike, her wiha ji ber tevlêbûna wan wek çeteyan di şerê dewleta Tirk li ser hin gelan , derketina dijmiin din li ser asta Navneteweyî. Dibe ku ev siyaseta berevaniyê xizmeta hin serkirdeyên şer ên rikberiyê bike, lê bandora wê li ser paşeroja siyasî ya welêt heye.

Dijminatiya Kurdan bi behaneya ku ew cudaxwaz in, armanca dewleta Tirk a kevn û nûjen a dagirkirina Bakurê Sûriyeyê ya li gorî peymana derewîn a Osmaniyan a Milî gur dike, ya ku ewlekariya neteweyî ya welat ku ji bo Kurd, Ereb û Suryan li erdnîgariya Sûriyê yekane garantorê neteweyî ye; dixe metirsiyê. Ji ber vê yekê, em dibînin ku gelek Sûrî têgeha xiyanet an jî sîxur wek baştirîn şayesdana vê siyasetê bikar tînin. Ji ber vê yekê, mirov dikare bibêje ku têkiliya baş bi desthilatdariya dewleteke ku beşek ji welêt dagîr kiriye û beşek ji welatiyên wê bi behaniya parastina desthilatdariya rêxistinî, darayî û exlaqî bindest dike, weke siyaseteke parastinê ya serkirdeyên rikberiya Sûrî, xwesteka exlaqî ya daxwazên wan ên ji bo çakirina şert û mercên siyasî, aborî û çandî yên welat,û bidawîkirina aloziyê winda dike, ku dikin bihane ji bo leşkerkirina serhildana gelirî ya sûrî.

Ji aliyekî din ve, her du alî amadebûna xwe ji bo beşdarbûna di her proseyeke siyasî de nîşan didin ku berfirehbûna leşkerî ya rêjîma Sûriyê û hevalbendên wê rawestîne, ku li ser esasê serçimandina tam ji fermanên Tirkiyê re û pişguhkirina hêzên din ên rikberiya Sûriyê, weke Rêveberiya Xweser, desteya Hevrêziya Niştimanî û gelek platformên din. Bêguman welatên di kirîza Sûriyê de xwedî bandorin, bi taybet Tirkiye, Rûsya û Amerîk, rêyên çareserkirina siyasî di dest wan de ye. Baweriyek jî di nav rikberiya islamî de heye ku rêjîma Erdogan weke garantorê ji xwe re dibînin, tevî ku wê ew li Xûta, Hums û Helebê xapandin û bû sedem ku gelek herêm ji dest wan derkeve û têkevê destê rêjîma sûrî û hevalbendên wê, ta gihişt asekê ku nikarîbû wan ji êrîşên asîmanî yê Rûsan biparêze. Tevî ku rêkeftinên li ser herêmên kêmşer berfirehkirina hêzên rêjîmê û hevalbendên wê ber bi erdnîgariya di destê rikberiya Îslamî ya Sûriyê de mayî rawestand, lêbelê, xuyaye ew qezencek demkî ye, ji ber xwe dispêre ser pragmatîzma dewletên garantor ên peymana kêmkirina şer û nebûna garantiyên navneteweyî û biryarên pabend yên Encumena Ewlekariya Neteweyên Yekbûyî ye. û heta di pêkana dorpêçeke asê de, nekarî hêzên din ên rikberiyê wek karteke fişarê li ser rêjîma Sûriyê bi kar bîne û kûrahiya stratîjî jê re misoger bike.

Rawstandina şer a demkî , nakokî û şer di navbera serkirdeyên şer di hevrikiyê de li ser serwerî û pereyan, pir xurt kir, jixwe teqîn, kuştin û revandin vê tiştî piştrast dike. Di heman demê de, derfet da rêjîmê ku çalakiyên xwe yên saloxgerî di nav wan de geş bike û bargehên xwe yên leşkerî bi hêz bike, tevî ku pêymanên ewlehihyê der barê kontrolkirina qaçaxçîtiya li ser sînor, radestkirina rikberan û şerê QSDê, pirsgirêka nabawrî di navbera şepêla selefî û dewletas Tirk de heye, ev dewleta ku ji ber sedemine dîrokî hewil dide berfirehbûna Wehabîzmê rawstîne û piştgiriya wê li herêmên di bin kontirola wê de neke, hemdem bi qirkirina kuradan li Rojava. Bi giştî desteya Tehrîrulûam bi serpereştiya Colanî ne di bin seweriya Tirkiyeyê de ye, ev yek dihêle ev rêxistin berovajî rêxistinên din li ser erdê bihêz bibe, dibe ku sedem jî; ji ber baweriya rêberên rêxistinê be ku dewleta Tirk endamê NATO`yê xwediyê rêgezek ewlehiyê ye ku li dij tevgera cîhadî ya cîhanî ye. Her wiha zêdebûna hebûna artêşa Tirkiyê li navçeyên di bin kontrola rêxistinê de, dihêle serweriya wê ya leşkerî li ser van deveran kêm dike, her wiha gumanek heye ku lihevkirinek

di navbera Pûtîn û Erdogan de, bi erêkirina rojavayî, ji bo tunekirina desteya Tehrîrulşam û kuştina serkirdeyên wê de heye([11]), ev yek nîşan dide ku siyaseta parastinê ya tevgera selefî rastî zext û aloziyên mezin tê ku niha bêtir giraniyê dide ser misogerkirina hebûne xwe; bêtir ji dabînkirina berjewendî û armancên xwe, ev yek jî dibe sedema ku niha serokê rêxistinê dixweze têkiliyên xwe bi dewletên rojava re baş bike.

**Der barê xeta têkilyên navxweyî**

**1-Şepêla Ixwanî**

Şepêla Ixwanî ya ku daxwaza dewleteke Îslamî xwedî rêgezeke neteweperestî û aboriyeke lîberal dike. siyaseta xwe ya parastinê li ser sê bigehan ava dike, ew jî ev in :

▪Gotara gelirî ya demagojîk ku arasteyî hemêzgeha xwe yê gelirî dike
▪serçimandineke tam ji rejîma Erdogan ra ya ku destekê dide wan.Jixwe serkirdeyekî vê rêxistinê bi navê"Yasir Hecî"dibîne ku "Têkiliyên Hikûmeta Demkî ya Sûriyê bi Tirkiyê re stratejîk e û ne pêkane ku çalakiyek an jî xebatek li gundewarên bakur were encamdan, beyî ku em nerîna wan negirin".
▪Ji bo rewakirina desthilata xwe, gurkirin nefreta mezheba sunî li hember mezheba Elewî, Şîî û ramana neteweyî ya sekuler a erebî bikar tîne.

Li gor me anî ziman, şepêla Îxwanî alîkariyeke mezin dide pêvajoyên paqijkirina nijadî, ya ku dewleta Tirk li herêmên dagirkirî(Efrîn-Serê kaniyê – Girê Spî )cîbicî dike ku bi rêya belavkirina bangeşeyekê dide zanînin ku Kurd dijminin û metirsiya wan ne kêmî rejîma Sûriyê ye. Her wiha hewil dide ku komelgehan ava bike û dest deyne ser milk û samanên koçberan([13]) û rewş û taybetmendiyên erdnîgarî ya herêmê bi rêya birîna daran, xirakirina goristanan, guhertina navên deveran biguherîne, her wiha piştgiriya siyaseta tirkirinê û islamiya radîkal a civaka neşteciyên ku ew li wan herêman bi cih kirine û avakirina bingehên leşkerî, daku desthilata xwe bihêz bike û hêviya vegerê li gel koçberan tune bike. Her wiha gelek ji serkirdeyên şer, daku tawan, gendelî û diziya xwe veşêrin xwe xistine himêza Tirkan, mîna çeteyê bi navê Mihemed el Casim([14]); bi nasnav "Ebû Emşa"( serçetyê Lîwaya Sultan silêman Şah ), di heman demê de, li dijî berfirehkirina îdyolojiya selefî li herêmên xwe derket û kontirolkira

nûnertiya rikberiya îslamî ya Sûriyê li ser qada navdewletî. Li milekî din jî ev şepêl hewil dide hemû milîsên ku rêgeza wê ya siyasî dipejirînin û bi alîkariya Tirkan wan di yek girûpê de kom bikin, ji bo vê yekê jî her êrîşeke li ser Rojava ji bo avakirina rêxistinên leşkerî yên nû bikar tîne, ya dawî jî damezrandina qaşo"artêşa Niştimanî ya Sûrî" bû ku hewil dan hemû milîsan di rêya dispilîna leşkerî û dana pileyên serpereştiyê wan di nava wê de kom bike, vê dawiyî jî nîşanên avakirina rêxistineke leşkerî nû ji bo van milîsan di demeke nêzîk de derketin holê, ku komeke milîsan bi navê (Ceyşulqaqaa) ji aliyê Heyet Tehrîrulşam ve hat avakirin. Li gorî hin çavdêran, armanca ji vê avakirina mekanîzmayeke nû ligel milîsên Artêşa Niştimanî ya Sûriyê ya Îxwanî ye ([15]) ku dibe di encamê de rêxistineke leşkerî nû derkeve pêş, jixwe hwildanak ji bo pêkanîna vê yekê jî heye ku di havîna sala 2021ê de hatibû ragihandin ku avahiyeke leşkerî ya nû di bin navê Eniya Rizgariya Sûriyê de û ya din di bin navê Odeya Operasyonên el-Ezm de hate ragihandin, lê heta niha di erdnîgariya ku opozisyon tê de ye cihê xwe negirtine, ji ber berdewamiya cudahî û nakokiyêndi navbera serkirdeyên wê de.

Xuyaya ev siyaseta parastinê ne xwedî nerîna stratejîk e, ji ber ku himêzgeha gelirî, asta dilsoziya wê çilo be jî,lê gendelî, nebûna xweşguzariyê û belengaziya domdar, dê berê wî bide her aliyê ku wî ji êş û azarê rizgar bike, û baweriya wî ya berxwedanê dê pir lawaz bibe.

Jixwe rêjîma Erdogan dê biçe û dewleta Tirk ji ber rewşa wê ya jeosiyasî û stratejîk dê bimîne gerewdara nakokiyên cemserên Ewropa, Ewrasya, Amerîka, îslamî û neteweperestiyên Tirkî, û rewşa dewleta Tirk di pêşeroja nêzde de jî çarenûsa wê ne diyare. Her wiha hişmendiya nefreta mezhebî li dijî hişmendiyek din, bi demê re bihêztir dibe, nemaze piştî belîbîna nîşaneyan ku wê Heleb dibe keleha şîeyan, tiştê ku vê yekê piştrast dike jî, vekirina konsulxaneya Îranê û serweriya milîsên alîgirê Îranê li wir, û nehiştina neştecihên bajêr ku vegerin bajarê xwe; tevî pêwendiyên dostane ya wan bi Îranê re([16]), her weha, hebûna metirsiyên xwedî taybetmendiyên demografîk ku gefê li hebûna wê ya heyî li navçeyên dagîrkirî dixwe, nemaze piştî niştecihbûna ku li Deraayê pêk hat û xwesteka komên ku nexwestin di bin ala rêjîma Sûriyê de bimînin; ji bo derbasî herêmên ji aliyê Tirkiyeyê ve hatine dagirkirin bibin, Jixwe ev xwestekî jî li gel Tirkiyê heye

ku koçberan derbasî van herêman bike, Ev yek ji bo tevlêbûna van kesan di nav civakên tundrew ên ku niha di bin serweriya îdyolojiya wan de ne, pirsgirêkên mezin derdixe hole, Ji bilî hebûna bi sedhezaran Kurdên derbider û jimarek mezin ji Ereb û Suryaniyan ku dixweazin tola xwe ji wan kesên ku bûne sedema koçberkirina wan, talankirina mal û milkên wan û kuştina bêgunehên wan hilîn in, di heman demê de daxwaz li cem gelek niştecihên hawirde heye ku vegerin deverên ku jê koçber bûne. Tevî avakirina komên leşkerî ji bo ku wan bi xwe ve girê bide, lê hişmendiya eşîrî û herêmî hîna li ser bîrdoziya şer li ser şervanên neştecihên hawirde, serdest e. li milekî din jî sîxurîyê hişt ku ev rêxistin pêbaweriya xwe ya pîrdozî winda bike û berjewendiya madî li ser armanca bîrdozî derxist pêş, wek tê zanîn ku ev yek dibe ji girîngtirîn karîgerên ku bîrdoziyê winda dike. Ji aliyê din ve, pir zehmet e yek bi rêxistinên selefî re, çiqasî cemawerê wê pirbe jî, bigihîje peymanek stratejîk an hevkariyek domdar û pêkvejiyana aştiyane. Dibe ku jî gendelî û hejariya li saziyên girêdayî vê şepêlê, û tirsa niştecihan ji vegera xwediyên cih, bibe derfetek ji Heyet Tehrîrulşam re ku alîgiran xwe zêde bike û bibe hêzeke sereke ya rikberiyê ku dê bingehên rêxistina Îxwanî têk bibe.

**2-Şepêla Selefî**

Ev şepêl, Heyet Tehrîrulşam nûnertiya wê dike û ji bo pêşxistina dewleteke Îslamî xwedî rêgexeke Îslamî dixebite. Ew hewl dide ku serkeftina peymana aştiyê ya çaverêkirî ya di navbera Talîban û Amerîkayê de, ku di Reşmeha 2020-an de li Dohayê hate kirin, bikar bîne( [17]) ku weke hêzeke îslamî mîna Pakistan û Erebistana Siûdî ku ne dijminê Rojava ye û ji el- Qaîde cuda ye û dijminê Daişê ye û kiryarên wê red kir û niha dixwaze rûpelekî nû bi dewletên Rojava re veke, jixwe ev helwest li ser zimanê serpereştê vê rêxistinê bi hevdîtinên bi ragihandinê re hat belavkirin([18]), yek ji nîşaneyên vê yekê jî ew e ku Ebûbekir el-Bexdadî dema ku li herêmeke di bin kontrola Tehrîrulşam de bû(herêma Barîşa li Idlibê) ji kuştinê nehat parastin.

Nakokiyên Tehrîrulşam bi Ixwanulmuslimîn, Daiş û Tirkiyê re, dibe ku bingehek ji bo lihevkirinek tektîkî ya demkî bi QSDê re peyda bike, her wiha dûrxistina wê ji her şerekî ji bo rizgarkirina herêmên ku ji hêla milîsên Ixwanî ve hatiye dagirkirin, dibe jî bibe sedema ku dewleta Tirk Tehrîrulşam

himêz bike û hewl bide li gorî dariştineke lihevkirî û têkiliyeke hevjiyanî di navbera her duyan de li ser bingeha parvekirina rêveberî, siyasî, leşkerî û aborî wê bi Tevgera Ixwanî re bike yek, her wiha wan di dezgehên yasayî û dadwerî de jî bike yek ku bi hev re şerê gelê Kurd bikin û tundrewiya xwe bişînin Efxanistanê. Nîşanên herî berbiçav ên vê yekê jî, ragihandina avakirina rêxistineke çekdarî ya nû di bin navê "Artêşa el-Qaqaa" li Idlib û Cebel el-Zawiyê, ku girêdayî îdyolojiya Tehrîrulşam e, li gorî stratejiya wê ya eşkere; li ser zimanê berdevkê vê rêxistinê ([19]) ragihand, wê li herêmên di bin kontrola Ixwanulmislimîn de berfireh bibe. Dibe ku ev yek bi lihevkirinekê di navbera Tirkiye û Amerîkayê de bi mebesta jiholêrakirina belavbûn û kaosa di nav milîsên çekdar û xistina wan di bin serkêşiyek rêxistinî ku bi hêsanî tê kontrolkirin, were encamdan, û li ser bingeha wateya îdeolojîk a li pişt bijartina vî navî bi rengekî ku Amerîkî û Rûsan razî bike, balkişandina li ser şerê li dijî komên çekdar ên bi ser Pasdarên Şoreşa Îranê li herêmê. Dibe ku jî ev yek bikeve çarçoveya lihevkirina Erdogan-Pûtîn ya derbarê çarenûsa Heyet Tehrîrulşam û bêbandorkirina metirsiya wê ya li ser ewlehiya neteweyî ya Rûsyayê, di heman demê de, di rêya avakirina hevkariyeke stratejîk bi tevgera selefî re,afirandina atmosferek dostane bi Ixwanulmislimîn re ji bo başkirina rewşa nakokiyên îdeolojîk di navbera her du aliyan de. Dibe ku ev mijar di qada navneteweyî de jî bi însiyatîfa wê ya ji bo lîstina rola polîsî li Afganîstanê û amadebûna wê ji bo birêvebirina Balafirgeha Kabulê piştî vekişîna hêzên NATO'yê ji wir girêdayî be.

Lê ciyawaziya bîrdozî, nakokiyên siyaseta berevaniyê ya alîgirên her du tevgeran (Tirkiye û Erebistana Siûdî) û nebûna baweriyê bi dewleta Tirkiyê piştî bazarên li ser hesabê Selefiyan bi Rûsyayê re û hewildana nêzîkatiya Tehrîrulşam ber bi Amerîkayê ve xwe wek alternatîvekê ku nûnertiya îslameke siyasî dike û nabe gef li ser dewletên rojava. li gorî tecrubeyên berê ya di navbera Amerîka û el-Qaîde di şerê li dijî Yekîtiya Sovyetê de, heger lihevkirinek çêbibe jî, dê demkî be. Ji aliyekî din ve, selefî hewil didin ku hêza xwe ya şerker jidest nedin û xuyaye xetek vegerê ji xere re hiştiye; heger ku ew rastî xiyanetê werin, ku bi rêya stratejiya herêma gewr û hiştina hin rêxistinên cîhadî yên selefî ku şerê xwe berdewam bikin û bidin xuyan ku ew weke Hurasuldîn û ji biî wan, ji Tehrîrulşam cuda bûne. Mana Heyet Tehrîrulşam di lîsteya rêxistinên terorîst ên navneteweyî de û

îdyolojiya wê ya siyasî berovajî hêzên din ên rikberiyê ye, dbe kêşe û astengiyek mezin li ser siyaseta wê ya berevaniyê. Rejîma Sûriyê û hevalbendên wê jî vê yekê dikin behane ji bo rewakirina êrîşên xwe yên tund li ser deverên di bin kontrola rikberiyê de, ligel kêmbûna palpiştên wê li herêmên di bin serweiya wê de ku tê de bingehek gelêrî, Ixwanî, çepgir, neteweperest û Daişî hene, bi taybetî li deverên Seraqib, Atareb û Sarmada.

Her du şepêl kar dikin ku şerê bi rejîma Sûriyê re weke hevrikiyeke elewî-şîî û sunnî nîşan bidin, ango rijdbûn li ser berdewamiya nakokiya mezhebî ya aloziya Sûriyê, ku ne şoreşeke gelêrî ye. Her du li ser hestên olî yên îslamî dilîzin, da ku hevgirtina yekîtiya rêxistina xwe biparêzin û desthilatdariya xwe bi hêz bikin. Di heman demê de bi têgehan dilîzin û wateya tiştan diguherin, da ku nerînekê yan jî raya giştî dûrî rastiyên li ser erdê bixe ku rejîma Sûriyê tevî beşdarbûna bi dehan Sunne, Elewî û Xirîstiyan di saziyên wê de, weke rêjîma Nusayrî bi nav dike, û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke cudaxwazan bi nav dike. Tevî ku ti projeyek wê ya cudaxwaz nîne û di peymana xwe ya civakî de yekitiyê dixwaze, û tevî têkiliyên xurt ên QSD bi Hevpeymaniya Navdewletî re, ya ku têkiliyên wê yên stratejîk bi Tirkiyê re hene; QSD wek Partiya Karkerên Kurdistanê bi nav dike. Jixwe her derfetek bi dest wan dikeve, , her du şepêl şaneyên xwe yên veşartî li dijî herêmên ewle yên bakur û rojhilatê Sûriyê bikar tînin, wek ku vê dawiyê li Minbicê û gundewarên Dêra Zorê û yên din qewimîn.

**Encamên siyaseta berevaniyê ya rikberiya îslamî ya Sûriyê.**

Xuyaye ku siyaseta berevaniyê ya her du şepêlan li ser bingehên ne rawstar hatiye avakirin ku girêdayî guherînên helwêstên navneteweyî yên ku di kirîza Sûriyê de çalak in. Nêzîkatiya wan a îdolojîk bi rêgezên demokrasî û sekularîzmê re dûrî hev in û bi rêgezên lîberalîzma îslamî ya ku ji aliyê dewletên Rojava ve hatiye qebûlkirin re hem nakok in, û bûye alav û sîxur di destê dewleta Tirk a laîk de ku endamê NATO`yê ye û dostê Rûsya û Îsraîlê ye. Her wiha pabendbûna civaka navneteweyî bi ewlekariya dewleta Israîlê, dê rêgiriyê li pêşiya her rêxistineke îslamî-neteweperest ku desthilatê li Şamê zeft bike; bigire. Jixwe ev jî dibe sedema ku ta niha rêjîma Sûriyê li ser desthilatê berdewam e. bêguman, her du dibin sedema beşek

ji êş û azarên bi milyonan Sûrî, di nav de Kurd, Ereb, Elewî, Xiristiyan û Şîe, û di peydakirina ewlekarî û rizgariya civakên erebî yên sûrî de têk çû, vê yekê hişt ku bawerî bi wan nema were , nemaze piştî ku bandora wan a nerênî di krîza aborî de ku danûstandin bi lîreyên tirkî dikin û berhemên kompaniyên tirkî di bazarên di bin kontrola xwe de bikar anîn, û bi hezaran darên zeytûnan birîn, kargeh dizîn û bûn sedema bêkariya bi deh hezaran kesên ku li herêmên dagirkirî bicih kiribûn. Rikberiya Îslamî xwe xist weke herêmeke cudakar û hino hino dibe wilayetek ji Tirkiyê ku di encamê de piştgiriya rasterast a Ereban( Siûdî, Misir û Îmaratî) winda kir û dabeşî çend mase û komên rikberiyê bû, her wiha bû sedema girtina rêyên çareseriyê bi Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê re û saziya wê yên leşkerî, aborî û civakî yên girîng li ser erdnîgariya Sûriyê. Ji ber kiryarên koçberkirin, neştecihkirin, kuştin, xiyanet, êrîş û çewisandina gelê Kurd yê resen û hemû kesên ku gumana hevsoziya wan bi Rêveberiya Xweser û bi rêjîma Sûriyê re hebû, nasnameya xwe winda kir û nekarî di sazî û di nava mîlîsên xwe de gendeliya berbelav kontrol bike..

Niha xwesteka artêşa Tirkiyê ku stratejiya xwe bi şêwazên şerê hevbendî(hibrit) xurt bike ([20]), nemaze piştî têkçûna operasyonên xwe yên leşkerî yên dawîn di êrîşa li ser Eyin Îsayê di destpêka sala 2021an de û derketina nîşaneyên qeyraneke leşkerî bi Rûsya, Îran û rêjîma Sûriyê re li ser xalên têkel di herêmên di bin serweriya wan de. Tê pêşbînîkirin ku milîsên rikberiya îslamî bi hemû şepêlên xwe, ji nû ve û di bin her navî de û di bin sîwana yek rêxistinê, bên birêxistinkirin û di rewşa amadebaşiyê bin da ku banga fermanên leşkerî yên artêşa Tirkiyê, ku şerekê li dijî herêmên ewle li bakurê Sûriyê yan jî her herêmeke cîhanê, pêk bînin. Li gor têgeha vî şerî([21]), leşkerên tirk; ji bo ku windahiya nedin, tevlî êrîşên rasterast nabin, tenê wê alîkariyên esmanî û topan bikar bîne û çete wê bi karê êrîşên bejayî rabin. Dibe ku ev stratejî girêdayî gotegotan be ku QSDê hewl dide teknolojiya çêkirina çekên taktîkî, wek dron, mûşekên germî, û mûşekên arastekirî bidest bixe , û pêkane di şerên xwe yên berevaniyê yên pêşerojê de bikar bîne.

Xuya ye vî tiştî hişt ku her du şepêl xeta paşvekişînê ji dest bidin û di warê têkiliyên navxweyî û derve de siyasetên xwe yên parastinê ji nû ve binirxînin ku di encamê de wê her du şepêl bêtir xwe bi siyaseta parastinê û

li pey hêzên navneteweyî ku bibin sîxur li gel wan,bihêle. Dibe ku ev yek bibe şaştiyek stratejîk ku aliyên din ên Sûrî rastî wê werin, çi Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê be, çi rêjîma Sûriyê be, çi jî hêzên rikberiyê yên nerm bin, eger ew xwestek li gel wan nebe ku bi vê rikberiyê re negihêjin tu hevtêgihiştinekê. Li gorî vê yekê, eger rikberiya îslamî li ser dijberî û dijminatiya hemû hêzên din ên rikberiyê rijd be, dê paşeroja wê tarî be û hêz û dahatên wê wê roj bi roj kêm dibe, û dibe ku ew li ser erdê; li hember artêşa rejîma Sûriyê û hevalbendên wê têk biçe. Ji ber vê yekê ya baş ku siyasetên xwe yên berevaniyê pêş bixe û li ser mayîndebûna qeyranê di rewşa wê ya niha de, ne jî li ser guhertinên helwêstên hêzên navneteweyî li hember kirîza Sûriyê, tu hêviyan girênede. Xuya ye avakirina têkiliyên bi Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê re û bidawîkirina rewşa dijminatiyê bi wê re, dê xizmeta siyaseta wê ya berevaniyê bike, û ev tişt ji ber nermbûna siyasî ya Meclisa Sûriya Demokratîk (yek ji saziyên siyasî yên nûnertiya Rêveberiya Xweser dike) pekan e, ku siyaseta xwe ya parastinê dispêre ser paradîgmaya neteweya demokratîk. Jixwe ev nermbûn gihişt asta ku li Şamê û bi navbeynkariya Rûsî bi rêjîma Sûriyê re danûstandnê bike ku dawî li vê aloziyê bîne. Hêjaye gotimê ye ku piraniya konferans û rêkeftinan nekarîn dawî li kirîza ku welat ku ev deh dsalin disere derbas dibe bîne. ya dawîn jî gera şazdemîn a danûstandinên Astanayê bû ku di destpêka meha heftan a sala 2021an lidar ket.

**Dawî**

Siyaseta komên rikberiya îslamî ya Sûriyê li herêmên dagîrkirî yên bakurê welat ketiye xizmeta cîbicîkirina ajandayên artêşa Tirk a dagirker. Her aliyek hîn jî li ser berdewamiya taybetmendiya xwe ya rêxistinî rijd e, ji ber ku ta niha her aliyek nav û ala wê ya rêxistinî cudaye û mîna talanê nêzî herêmên di bin serwriya xwe de dibin û li şûna ku li ser şaşiyên xwe yên stratejîk rawestin û bi nermayî nêzî Rêveberiya Xweser bibin, mîna nermiya ku di danûstandinên xwe de bi rêjîm re nîşan didin, dan xuyakirin ku ew amade ne tevlî her êrîşeke dewleta Tirk a li ser herêmên ewle yên Bakurê Sûriyeyê bibin û ev helwest di propaganda qaşo serkeftinên pîroz û veşartina têkçûna xwe li dijî rejîma Sûriyê û hevalbendên wê bikar anînin. Tiştê ku vê yekê piştrast dike jî, beşdarbûna wan di ragihandina seferberiya giştî de û amadebûna wan ji bo her êrîşeke pêkan a rejîma Erdogan li dijî

herêmê; piştî gurbûna gefên Erdogan di meha Mijdarê de li dijî şêniyên herêmê.

Ji ber vê yekê, Rikberiya Îslamî ya Sûriyê beşek ji berpirsiyariya rasterast a têkbirina serhildana gelêrî li welat; ji bo bidestxistina daxwazên xwe yên rewa û ji bo cîbicîkirina rêgezên demokrasiyê, bidestxistina ewlekariya aborî û bidawîkirina zordariyê ye, hildigire, her wiha berpirsiyariyeke mezin ji êş û azarên bi milyonan koçber, derbider û penaberên Sûriyê ku îro têde dijîn, hildigire. Newilo tenê, ji bo ku hestên raya giştî têxe xizmeta berjewendiya xwe, rewşên mirovî yên trajîk bikar tîne. Jiwxe van koman tu pêşketineke siyasî û leşkerî li hember rêjîmê bi dest nexistine, lê belê ji erdnîgariya welat cuda bûne.

Tê pêşbînikirn jî ku bi tevlîbûna wan di şerê hevbendî bi dewleta Tirk a dagirker re û hebûna wan weke behaneyekê ji bo domandina hebûna leşkerî ya Rûsiya û Îranê li vî welatî, bibe sedema berdewamiya aloziya welêt a siyasî û aborî. Ev tişt û ji bilî wan, ji rikberiya Îslamî ya Sûriyê tê xwestin ku lêvegereke objektîf û rast ji siyaseta xwe ya berevaniyê re çêke, da ku wê pêş bixe û têxe xizmeta berjewendiya giştî ya Sûriyê de, nemaze ku aliyên serdest ên navneteweyî û herêmî hewil didin ku heza neteweperestî di nav hêzên rêxistina îslamî de kûr bikin, da ku bibe sedema jihevxistina binyata baweriya îslamî ya giştî ya gelê herêmê û ji bo kesên xwedî armancên kesane û îdeolojîk zemînekê pêyda bike ku di encamê de şer û tevliheviyê peyda dike û karibe van welatan kontirol bike. Jixwe di van demên dawîn de em dibînin ku hewldanek ji bo osmanîkirina tevgera siyasî ya îslamî ya piştî Îrankirina ([22]) beşek ji wê, hevterîp(parallel) bi xurtkirina heza neteweperestiya îslamî ya erebî ji bo peydakirina sê aliyên nakok di avahiya islama siyasî ya Sunî-Tirk, û aliyên Şîe û Sûnniyên Ereb, ku bibe sedema berdewamiya qeyranên herêmê û astengiyên civakên wê.

## Lîsteya çavkaniyan

1. فيليب هوفمان/ عمر السراج؛ مَسَارُ المعارضة السياسية السورية نحو مآل التهميش، الناشر: مركز مالكوم كير-كارنيغي للشرق الأوسط؛ تاريخ النشر: أيار 2020م؛ الرابط: https://carnegie-mec.org/2020/05/22/ar-pub-81840
2. CSIS(مركز الدراسات الاستراتيجية الدولية) ; Hay'at Tahrir al-Sham (HTS)/ TNT Terrorism Backgrounder ؛2018; Link: https://www.csis.org/programs/transnational-threats-project/terrorism-backgrounders/hayat-tahrir-al-sham-hts
3. Agreement for Bringing Peace to Afghanistan between the Islamic Emirate of Afghanistan which is not recognized by the United States as a state and is known as the Taliban and the United States of America; February 29, 2020; Link:
4. https://www.state.gov/wp-content/uploads/2020/02/Agreement-For-Bringing-Peace-to-Afghanistan-02.29.20.pdf
5. أندرو رادن، الحرب الهجينة في منطقة البلطيق/التهديدات والاستجابات المحتملة؛ الناشر: مؤسسة RAND سنة النشر عام 2017م؛ الرابط:
6. https://www.rand.org/content/dam/rand/pubs/research_reports/RR1500/RR1577/RAND_RR1577z1.arabic.pdf
7. سلطان الكنج؛ استعراض العلاقة بين تركيا وهيئة تحرير الشام؛ الناشر: Chatham House ؛ تاريخ النشر: أيار 2019م؛ الرابط:
8. https://syria.chathamhouse.org/ar/research/2019/reviewing-the-turkey-hts-relationship
9. شيماء فاروق سلامة؛ اتفاقية الدوحة بين الولايات المتحدة وحركة طالبان: الواقع والمأمول؛ الناشر: المركز الديمقراطي العربي للدراسات الاستراتيجية، الاقتصادية والسياسية؛ تاريخ النشر: 2021/3/30م؛ الرابط: https://democraticac.de/?p=73913
10. المرصد السوري لحقوق الإنسان؛ مناطق "غصن الزيتون ودرع الفرات" خلال شهر تشرين الثاني: نحو 45 حالة اعتقال وخطف.. وسرقات وانتهاكات كبيرة على مرأى القوات التركية؛ تاريخ النشر: 2020/12/5م؛ الرابط:
11.https://www.syriahr.com/%D9%85%D9%86%D8%A7%D8%B7%D9%82-%D8%BA%D8%B5%D9%86-%D8%A7%D9%84%D8%B2%D9%8A%D8%AA%D9%88%D9%86-%D9%88%D8%AF%D8%B1%D8%B9-%D8%A7%D9%84%D9%81%D8%B1%D8%A7%D8%AA-%D8%AE%D9%84%D8%A7%D9%84-%D8%B4%D9%87/409509/
12. إلهان أفيونكو؛ التحول في منظور الحرب: الحرب الهجينة؛ الناشر: جامعة الدفاع الوطني التركي-2017م؛ ترجمة: ضرار الخضر- أحمد علي لصالح مركز نورس. الرابط:

*13.https://ia802909.us.archive.org/33/items/20200328_20200328_1758/%D9%85%D9%86%D8%B8%D9%88%D8%B1%20%D8%AC%D8%AF%D9%8A%D8%AF%20%D9%84%D9%84%D8%AD%D8%B1%D8%A8%20%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%B1%D8%A8%20%D8%A7%D9%84%D9%87%D8%AC%D9%8A%D9%86%D8%A9.pdf*

*14. الحرب الهجينة (HYBRID WARFARE) قتال بأرواح الآخرين وبأموالهم؛ د. أحمد علو (عميد متقاعد)؛ الناشر موقع الجيش اللبناني/ دراسات وأبحاث، العدد 365- تشرين الثاني 2015م؛ الرابط:*

*15.https://www.lebarmy.gov.lb/ar/content/%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%B1%D8%A8-%D8%A7%D9%84%D9%87%D8%AC%D9%8A%D9%86%D8%A9-hybrid-warfare-%D9%82%D8%AA%D8%A7%D9%84-%D8%A8%D8%A3%D8%B1%D9%88%D8%A7%D8%AD-%D8%A7%D9%84%D8%A2%D8%AE%D8%B1%D9%8A%D9%86-%D9%88%D8%A8%D8%A3%D9%85%D9%88%D8%A7%D9%84%D9%87%D9%85*

*16. المرصد السوري لحقوق الإنسان؛ أبو عمشة من متاجر بصواريخ غراد إلى محتل لبيوت الأكراد و"ملك مملكة شيخ الحديد"؛ تاريخ النشر: 2021/4/14م؛ الرابط:*

*17.https://www.syriahr.com/%D8%A3%D8%A8%D9%88-%D8%B9%D9%85%D8%B4%D8%A9-%D9%85%D9%86-%D9%85%D8%AA%D8%A7%D8%AC%D8%B1-%D8%A8%D8%B5%D9%88%D8%A7%D8%B1%D9%8A%D8%AE-%D8%BA%D8%B1%D8%A7%D8%AF-%D8%A5%D9%84%D9%89-%D9%85%D8%AD%D8%AA%D9%84/433228/*

*18.DW؛ بوتين و أردوغان يتفقان على العمل على خفض التوتر في إدلب؛ تاريخ النشر: 2020/2/21م؛ الرابط:*

*19.https://www.dw.com/ar/%D8%A8%D9%88%D8%AA%D9%8A%D9%86-%D9%88-%D8%A3%D8%B1%D8%AF%D9%88%D8%BA%D8%A7%D9%86-%D9%8A%D8%AA%D9%81%D9%82%D8%A7%D9%86-%D8%B9%D9%84%D9%89-%D8%A7%D9%84%D8%B9%D9%85%D9%84-%D8%B9%D9%84%D9%89-%D8%AE%D9%81%D8%B6-%D8%A7%D9%84%D8%AA%D9%88%D8%AA%D8%B1-%D9%81%D9%8A-%D8%A5%D8%AF%D9%84%D8%A8/a-52471715*

*20. القدس العربي؛ حكومتان في الشمال السوري... هل هناك جهود لدمجهما؟؛ تاريخ النشر: 2019/2/7م؛ الرابط:*

*21.https://www.alquds.co.uk/%D8%AD%D9%83%D9%88%D9%85%D8%AA%D8%A7%D9%86-%D9%81%D9%8A-%D8%A7%D9%84%D8%B4%D9%85%D8%A7%D9%84-%D8%A7%D9%84%D8%B3%D9%88%D8%B1%D9%8A-%D9%87%D9%84-%D9%87%D9%86%D8%A7%D9%83-%D8%AC%D9%87%D9%88%D8%AF/*

*22. عبدالله الحسن؛ مناطق" درع الفرات" و" غصن الزيتون" .. إلى أين؟؛ الناشر: موقع صالون سوريا*
*(Salon Syria؛ تاريخ النشر: 2019/1/11؛ الرابط: م*
*23.https://salonsyria.com/%D9%85%D9%86%D8%A7%D8%B7%D9%82-%D8%AF%D8%B1%D8%B9-%D8%A7%D9%84%D9%81%D8%B1%D8%A7%D8%AA-%D9%88-%D8%BA%D8%B5%D9%86-%D8%A7%D9%84%D8%B2%D9%8A%D8%AA%D9%88%D9%86/#.YLytMvnXLIV*
*24. الوطن؛ توتر العلاقة بين تركيا وتحرير الشام؛ تاريخ النشر: 2020/5/8؛ الرابط: م*
*https://www.alwatan.com.sa/article/1045494*
*25. الحرة؛ أحمد رحال.. ضابط سوري منشق مهدد بالقتل و"أبو عمشة" المحرك؛ تاريخ النشر: 2021/5/24؛ الرابط: م*
*26.https://www.alhurra.com/syria/2021/05/24/%D8%A3%D8%AD%D9%85%D8%AF-%D8%B1%D8%AD%D8%A7%D9%84-%D8%B6%D8%A7%D8%A8%D8%B7-%D8%B3%D9%88%D8%B1%D9%8A-%D9%85%D9%86%D8%B4%D9%82-%D9%85%D9%87%D8%AF%D8%AF-%D8%A8%D8%A7%D9%84%D9%82%D8%AA%D9%84-%D9%88%D8%A3%D8%A8%D9%88-%D8%B9%D9%85%D8%B4%D8%A9-%D8%A7%D9%84%D9%85%D8%AD%D8%B1%D9%83*
*27. موقع العربي الجديد؛ مقابلة للجولاني في الإعلام الأمريكي: على واشنطن رفع " هيئة تحرير الشام" من قائمة الإرهاب؛ تاريخ النشر: 2021/4/3؛ الرابط: م*
*28.https://www.alaraby.co.uk/politics/%D9%85%D9%82%D8%A7%D8%A8%D9%84%D8%A9-%D9%84%D9%84%D8%AC%D9%88%D9%84%D8%A7%D9%86%D9%8A-%D8%A8%D8%A7%D9%84%D8%A5%D8%B9%D9%84%D8%A7%D9%85-%D8%A7%D9%84%D8%A3%D9%85%D9%8A%D8%B1%D9%83%D9%8A-%D8%B9%D9%84%D9%89-%D9%88%D8%A7%D8%B4%D9%86%D8%B7%D9%86-%D8%B1%D9%81%D8%B9%D9%87%D8%A7-%D9%85%D9%86-%D9%82%D8%A7%D8%A6%D9%85%D8%A9-%D8%A7%D9%84%D8%A5%D8%B1%D9%87%D8%A7%D8%A8*
*29. القدس العربي؛ الجولاني في مقابلة جديدة: تصنيف "تحرير الشام" "إرهابية" من جانب واشنطن غير عادل؛ تاريخ النشر 2021/6/2؛ الرابط: م*
*30.https://www.alquds.co.uk/%D8%A7%D9%84%D8%AC%D9%88%D9%84%D8%A7%D9%86%D9%8A-%D9%81%D9%8A-%D9%85%D9%82%D8%A7%D8%A8%D9%84%D8%A9-%D8%AC%D8%AF%D9%8A%D8%AF%D8%A9-*

%D8%AA%D8%B5%D9%86%D9%8A%D9%81-
%D8%AA%D8%AD%D8%B1%D9%8A%D8%B1/
31. حلمي النمنم؛ في مواجهة العثمنة والأيرنة؛ الناشر: موقع المصري اليوم؛ تاريخ النشر: 2019/7/7م؛ الرابط:
32. https://www.almasryalyoum.com/news/details/1410570
33. للمزيد حول هذا الموضوع من المفيد مراجعة إحدى المقالات من المواقع الموالية للمعارضة الإسلامية، وهي:
34. خالد الخطيب؛ "جيش القعقاع".. عصا الجولاني في مواجهة الجيش الوطني؛ الناشر: موقع سوريا. tv؛ تاريخ النشر: 2021/6/17م؛ الرابط:
35.https://www.syria.tv/%D8%AC%D9%8A%D8%B4-
%D8%A7%D9%84%D9%82%D8%B9%D9%82%D8%A7%D8%B9-
%D8%B9%D8%B5%D8%A7-
%D8%A7%D9%84%D8%AC%D9%88%D9%84%D8%A7%D9%86%D9%8A-
%D9%81%D9%8A-%D9%85%D9%88%D8%A7%D8%AC%D9%87%D8%A9-
%D8%A7%D9%84%D8%AC%D9%8A%D8%B4-
%D8%A7%D9%84%D9%88%D8%B7%D9%86%D9%8A
36. عبد الله سليمان علي؛ "جيش القعقاع": الجولاني يتمدد إلى "درع الفرات"... بغض نظر تركي؛ الناشر: النهار العربي؛ تاريخ النشر: 2021/6/15م؛ الرابط:
37.https://www.annaharar.com/arabic/makalat/annahar-alarabi-authors/14062021114148788
38. الميادين نت؛ تنظيم "جنود الشام القوقاز" في سوريا يعلن حل نفسه؛ تاريخ النشر: 2021/7/9م؛ الرابط:
39.https://www.almayadeen.net/news/politics/1493350/%D8%AA%D9%86%D8%B8%D9%8A%D9%85-%D8%AC%D9%86%D9%88%D8%AF-
%D8%A7%D9%84%D8%B4%D8%A7%D9%85-
%D8%A7%D9%84%D9%82%D9%88%D9%82%D8%A7%D8%B2-%D9%81%D9%8A-
%D8%B3%D9%88%D8%B1%D9%8A%D8%A7-%D9%8A%D8%B9%D9%84%D9%86-
%D8%AD%D9%84-%D9%86%D9%81%D8%B3%D9%87
40. صبحة بغورة؛ التوجهات الحديثة في السياسة الدفاعية؛ الناشر: مجلة درع الوطن (مجلة عسكرية واستراتيجية) / الإمارات العربية المتحدة؛ تاريخ النشر: 2020/4/2م؛ الرابط:
41.http://www.nationshield.ae/index.php/home/details/research/%D8%A7%D9%84%D8%AA%D9%88%D8%AC%D9%87%D8%A7%D8%AA-
%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%AF%D9%8A%D8%AB%D8%A9-%D9%81%D9%8A-
%D8%A7%D9%84%D8%B3%D9%8A%D8%A7%D8%B3%D8%A7%D8%AA-

*%D8%A7%D9%84%D8%AF%D9%81%D8%A7%D8%B9%D9%8A%D8%A9/ar#.YO_cq-jXLIV*

42. د. عبد الرفيق كشوط؛ فلسفة الأمن والدفاع في سياسة الجوار الأوروبية؛ الناشر: مجلة *تنمية الموارد البشرية- المجلد 7/العدد الثاني- ديسمبر 2016؛ الرابط:*

*43.https://www.univ-setif2.dz/images/PDF/revue/%D8%A7%D9%84%D9%85%D8%AC%D9%84%D8%AF%2007%20%D8%A7%D9%84%D8%B9%D8%AF%D8%AF2/13-%20A%209.pdf*

*44. الموسوعة الجزائرية للدراسات السياسية والاستراتيجية؛ مجموعة مقالات حول السياسة الدفاعية للدول؛ تاريخ النشر 2019/8/30 م؛ الرابط:*

*45.https://www.politics-dz.com/%D9%85%D8%AC%D9%85%D9%88%D8%B9%D8%A9-%D9%85%D9%82%D8%A7%D9%84%D8%A7%D8%AA-%D8%AD%D9%88%D9%84-%D8%A7%D9%84%D8%B3%D9%8A%D8%A7%D8%B3%D8%A9-%D8%A7%D9%84%D8%AF%D9%81%D8%A7%D8%B9%D9%8A%D8%A9-%D9%84%D9%84/*

# Komara islamî ya Îranî

## (B 1)

## Îran Ji Hêlên Erdnîgarî, Dîrokî Û Ramyarî Ve

### Pêşgotin

Di cîhanê de Rojhilata Navîn herêma herî germ e. Di bin durşmeya parastina Ewlekariya Neteweyî de, gelek hêz bi handana îdeolojîk yan jî bi handana desthilatdariyê, li ser wê şer dikin. Her wiha ev hêz hewl didin ku pirojeyên xwe li ser gelê Rojhilata Navîn bi cih bikin bêyî ku vîna piraniya vî gelî li ber çavan bigirin. Weke tê zanîn, pirojeya “ji Nîlê ta Feratê” heye, armanca wê jî ew e ku dewleta Îsraîlê ya mezin, bê avakirin. Ew jî weke berdewamiya pirojeya dewleta neteweyî ye ku Sermayedariyê ji destpêka sedsala 20'an de li ser herêmê gerek kiriye. Li kêleka wê pirojeya vejînkirina Sultaniya Osmanî heye, ji hêleke din ve pirojeya Cîhana Erebî ya ku weke bertek li ser her du pirojeyên navborî bûn, heye. Her wiha pirojeya vejînkirina şahinşahiya Farsî bi rengê Îranî û Şîî jî li dar e. Lê mezintirîn van pirojeyan pirojeya Rojhilata Navîn a Mezin e, ew a ku Emerîka û hin dewletên Rojavayî pêşniyar dikin. Li nik wê jî, hin hêzên herêmî mîna Asûrî, hin hêzên Kurdî, Bilûçî û hwd dixwazin dewlatên neteweyî, ava bikin.

Bê guman nakokiyên di navbera van pirojeyan de li nik nakokiyên di navbera alav û rêbazên cîbicîkirina wan de, metirsiyeke mezin li ser gelê herêmê çêkir ku di riya koçberî û paşxistina zanistî, hînkirin, geşpêdana aborî û hwd; rewşeke ramyarî ya nearam peyda kir, êdî ji binpêkirina mafên mirovan û guhertina demografîk, bû sedema. Ev rewş piştî dehsala pêşî ya sedsala 21`an, gihişt astên pêşketî. Emerîka, Brîtanya, Firansa û Rûsya ku weke aliyên navneteweyî û Îran, Tirkî (Dagirkerên Kurddistanê) û Siûdiyê ku weke aliyên herêmî, tên naskirin, lîstikvanên sereke ne û pêşhate û pêşketina bûyeran di destê wan de ne. Îran, Rûsya û Emerîka li ser hesabê gelê herêmê ji her hêzê bêtir destkeftî qezenc kirin. Emerîka, Rûsya û Îran

hewl didin ku berjewendiyên xwe yên aborî misoger bikin û baregehên leşkerî ji bo misogeriya ewlehiya xwe ya neteweyî ava dikin. Lê armanca Îranê ji wilo kûrtir e, li kêleka daxwaz û xwesteka wê ya sedest; pirojeya mezhebî ya Şîî jî di des de ye; ev pirojeya ku ji aliyekî ve xwe dispêre nakokoyên mezhebî yên di navbera Şîa û Sunyan û ola Islamî û olên din; ji alîkî din ve jî xwe dispêre cudahiya di navbera neteweya Farsî û netweyên din de. Bi vê yekê dixwaze îdyolojiya Xumeynî bi teşeyeke nû li ser herêmên di bin serweriya xwe de gerek bike û li gorî pîvana çîna deshilatdar a Îranê û guhertina pergala jeopolîtîk li Rojhilata Navîn; hemû alav û rêbaz bikar anîn, her wiha rola sinc, dadmendî û biratiya gelan, pişguh kir. Ev tişt li ser destê komên girêdayî Îranê; bi awayekî yekser û neyekser, bû sedema gelek bobelat û binpêkirina mafê mirovan. Di qada herêmî de, Îran xwedî hêzeke bi bandor e, pirojeya wê ya ku bi dogmatîzma olî tê naskirin, ji hêla gelê herêmê; li hemberî rikberiyeke bihêz tê. Ev piroeya ku bû sedema pirsgirêkên herêmê yên civakî, ramyarî û aborî. Ji ber vê yekê pêwîst e ku mirov wê ji hêla ramyarî, aborî, civakî û leşkerî baş nas bike û bingeha ku xwe dispêre ser jî destnîşan bike. Her wiha xalên lewaziya wê jî bi awayekî ku rastiya gelek tiştan diyar dike, çi ji pêşeroja herêmê re tê rêsandin, rola hêzên rikber ên dijî wê û li milekî naskirina têkiliyên Îranê bi dewlatên derdo re jî, werin diyarkirin.

**Cihê Îran Û Girîngiya Wê Ya Stratejîk:**

Îran xwedî erdnîgarî û jîngeheke pirrengî ye û bi delemendiya xwezayî û çavkaniyên wizeyê pir dewlemend e. Îran xwedî cihekî stratejîk e, ji ber ku li ser asta cîhanê dikeve ser du cihên girîng û çalak, ew jî herêma Kendavê û deryaya”Xezerê” ne, ev cihên ku bi  petrol û gazê pir dewlemend in, her wiha cihekî di naverasta komeke dewletên girîng yên xwedî rûpîvên berfireh û xwedî pirsgirêkên ramyarî mîna: ”Efxanistan, Bakistan, Turkmenistan, Îraq û Tirkiyê”, digire. Ev rewê dihêlin ku Îran bibe xwedî cihekî jeopolîtîk û dibe pirek di navbera dewletên Asya navîn û dewletên rojhlatî deryaya spî de, di heman demê de di navenda cîhana Islamî ya Şîî, cihê xwe digire. Rûbera Îranê 1648195 km[21], Îran dikeve beşê başûrê

[1] http://www.fao.org/nr/water/aquastat/countries_regions/IRN/IRN-CP_ara.pdf
Îan (Erdnîgarî di-) - https://www.arab-ency.com

rojavayê parzemîna asyayê. Ji bakurê ve Turkmenistan, Azerbaycan, Ermenistanê û deryaya Xezer; ji rojhilat ve Efxanistan û Pakistan; ji rojava ve Îraq û Tirkiyê; ji başûr ve kendava Lor , kendava Oman û zeryaya Hindî, Îranê dorpêçkirîye. Îran dikeve navbera her du hêlên dirêjhî ”$44^{o}$ - $63^{o}$ 20` rojhilatî Girênêç û her du hêlên dirêjahiyê $25^{o}$ 02` - $39^{o}$ 47´ bakurê Nîvqatbirê. Rêjeya çiya û çolistanan %52 ji rûbera Îranê ye, rûerda xaka çandiniyê nêzî %29 ji rûbera Îranê ye, mezintirîn rêzçiya li Îranê rêzçiyaya Zagrosê ye ku ji bakurê rojava dest pê dike ta berava Kendavê li hêla başûr, dikişe. Her wiha hin rêzçiya li aliyê bakur û rojhilat jî hene. Rûbera Îranê ya berfireh û li gorî erdnîgarî û rûerdê, dihêle avhewa wê pirrengî be, bi giştî li herêmên hundir: havînî pir germ e, carnan dighêje $55^{o}$, li herêmên çiyayî zifistana wê pir sar e, dibe ku bigehêje 20-$30^{o}$ bin sifir, navîna barîna baranê li Îranê nêzî 228mm e. Tê zanîn ku %90 ji welêt beyar e yan jî nîv beyar e.




**Dîroka Îranê:**

Îran yek ji navendên şaristanî yên kevnar e. Vedîtinan diyar kir ku ev herêm ji serdema kevrî ya nûjen (newlîtîk) ve, mirovan lê jiyan dikir, mîna

Îran – Serjimêr Jimara şêniyê - https://ar.actualitix.com/country/irn/ar-statistics-population-iran.php

şkefta ”Warosî” li Kermenşahê û devera ”Keşferûd” li xuresanê û ”Kencber” li eyaleta Cîlan. Berî ku Farsan werin zozana Îranê, li vê herêmê jimareke gelê Arî û gelên ku ji rêzeçiyayê Zagrosê daketibûn mîna ” Îlamî, Kûtî, Kaşî û Kardox[2]” bapîrên Kurdan lê bi cih bibûn. 3000 sal BZ (berî zayînê), Îlamiyan yekemîn malbata deshilatdar li zozana Îranê damezrandibûn û bi gelek şeran li hemberî Akadî, Babilî û Asûriyan derketin. Qiralê Asûriyan ”Asûr Banîbal” di 640 BZ de êrîşî dewlata ”Îlamê” kiri[3] û di encamê de bajarê ”Soza” desteser kir û bi giştî ew bajar wêran kir.

Di navbera dawiya sedsala heftan û navîka sedsala şeşan ên berî zayînê; êlên Mîdî ku pêşiyên Kurdên bakur ên ku li ser ola Mitrayî û Zeredeştiyê bûn, li ser destê zana û serkêşiya”Diyako” , bûn yek û neviyê wî ”Kîxisro” karîbû dewlatekê mezin mîna konfederasyonekê ava bike ku piraniya gelê Arî li seranserî erdnîgariya Îranê û herêma di navbera Mezopotamya û deryaya Reş tê de hembêz bike, her wiha bi alîkariya Babiliyan karîbû bajarê ”Nînewayê” paytexta şahinşahiya Asûriyan rizgar bike û desthilatdariya wan hilweşand.

Di sala 550 BZ, Farsan bi serkêşiya” Koreş”, piştî lêdana li ser Padîşahê Mîdiyan û xiniziya hin sergewerên Mîdiyan bi padîşahê xwe re, paytexta Mîdiyan ”Akbatana” ku niha navê wê Hemedanê ye dikeve rojhilatî Kurdistanê, dagir kir. Bi vê yekê şahinşahiya Mîdî hat rûxandin, paşê ”Koreş” şahinşahiya xwe berfireh kir, êrêşî şahinşahiya”Lîdî” li Anatolyayê û şahinşahiya Babilî ya duyem kir û xwe weke qiralê her çar aliyê cîhanê ragihand. Şahinşahiya Farsî bi serdariya binemala” Hexamenişî” derket holê, ji ber vê yekê bi navê  şahinşahiya Farsî ya Hexamenişî hate naskirin. Piştî ku Koreş di şerekî de hate kuştin ”Qembîzê Duyem” şûna wî girt, wî jî şahinşahiya Farsî berfirehtir kir û di sala 525 BZ Misir tevlî xwe kir. Farsan di wê demê de sê xwedawend diperestin, ew jî ”Ahoramezda” weke qiralê xwedawendan û ” Mithra” xwedawenda rojê û ”Anahîta” xwedawenda av û berdariyê. Li gorî nerîna Ramyarê Navneteweyî **Ebdela Ocelan**[4]**:**"...kevneçopiyên dewleta Îranê ji dema Konfederasyona Med

[2] Zanistnameya dîroka Îranê ya ramyarî (ji dîroka destanê ta dawiya dewleta Thirî)- berga yekem-D. Hesen Kerîm Caf.

[3] Mîdî û kurd – Hesen Kakayî

[4] Manîfesto şaristaniya Demokratîk – Ebdela Ocelan - berga 5( R. 440)

(1000 – 550 BZ) dikşe, bi Med û Kurdan re çandeke wekhev parve kirine. Zerdeştî û Mîtrayî ji bo belavkirina vê çandê di dîrokê de, çavkaniyên girîng in”.

Piştî çend şerên giran bi Yewnaniyan re, ” Iskandarê Mekedonî” şahinşahiya Farsî ya Hexamenişî bi serkêşiya ”Daryosê Sêyem”di şerên "Îsos" 333[5] û ”Erbela/Erbîl”ê 331 BZ de, têk bir û îrêşî welatê Farsî kir û malbata Hexamenişî tune kir û hewl da ku çandeke nû ya têkilhev ji Fars û Yewnaniyan bi riya şûkirina deh hezar şervanên Mekedonî û Yewnanî bi keçên Îranî û gel û neteweyên din re ava kir, Iskender bi xwe bi "Roksana" re keça serkêşekî Farsî û "Estatêra" keça "Daryosê Sêyem" re şû kir, bi vê yekê çanda "Helenîstîk" hat afirandin. Piştî mirina ” Iskandar” gelek dewlet li vê herêmê pey hev hatin, mîna dewleta ”Seloqî(Seleucid) 323- 141 BZ”, piştî têkçûna dewleta Seloqî li ser destê êlên Işkanî bi serkêşiya ”Erşek”, dewleta ”Işkanî/Parsî 247 BZ” hate damezrandin. Di sala 224 "Erdeşêrê Yekem" qiralê Parsiyan "Artibanusê Çarem" têk bir û binemala Sasanî li ser navê bapîrê xwe Kahinê Zeredeştî ”Sasan” yê ku piştevaniya perestgeha”Anahîta” li Istexerê(Persepolis) dikir û hevjîna wî jî ji malbata destlatdarên serdema Işkanî bû, di sala 226`an de padîşahiya xwe ragihand. Bi vê yekê Şhinşahiya Sasanî hat damezrandin, ” Erdeşêrê yekem ” Serhildanên navxweyî rawestandin û şahinşahiya xwe berfireh kir ta gihişt herêmên mîna ” Circan, Sîstan, Xuresan û hwd”, her wiha piştî ku ola Zeredeştî ji bo azadî û rûmeta mirovan hatibû, bû ola fermî ya desthilatdariyê. Di serdema ” Şabûrê duyem” de deqên pîroz ên Zeredeştiyê yên binavê ”Avista” li gorî nerînên Farsan temam bûn û çi kesê ev ola Zeredeştî (ya guherandî) nepejirand weke” Manî”, hat sizakirin. Kesrayê yekem ”Eeûşêrwan” di (532-579) de; bû serkêşê şahinşahiya Sasanî, yekser artêş bi serweriya navendî ve girêda, her wiha peymana aştiyê bi Romîyan re bi dawî kir, êrîşî Sûriyê jî kir û bac jê xwest. Di wê serdemê û di serdemên berî wê de jî, bingeha hêza leşkerî ya Îranî ji komên kurtêlxur ên êlên Tirk û êlên zozana Îranê pêk dihat, Kesrayan bi destê wan koman stemkarî li ser gel dikir da ku wan bitirsîne û bacan bistîne. Piştî ” Kesra” ” Hurmizê Çarem” bû serdarê mîrgehê, piştre” kesrayê Duyem” hat, di serdema wî de; ji ber girtina bacên giran serhildanên navxweyî rû dan.

[5] Heman jêder

Bîzantiyan ev serhildan ji xwe re bi kar anîn û gelek serkeftinan li dijî Sasaniyan bi dest xinstin. Di wê serdemê de Padîşah” Kesrayê Duyem” hat kuştin, Şahinşahiya Sasanî lewaz bû. Di sala 632`ê de, di serdema padîşa ”Yezdeşêrê Sêyem” êrîşa Islamî dest pê kir. Ereban lawazbûn û perçebûna Sasaniyan di dema ”Yezdeşêrê Sêyem”, bi kar anîn û sdi ala 637`an de; di dema Umer Binûxetab de di şerê ”Elqadisiyê” de û bierkêşiya "Seed Binûlas" de bi serketin. Piştî ku padîşah ”Yezdeşêrê Sêyem” di sala 651`ê de hate kuştin, Îranê bi tevayî ket nava xîlafeta Islamî. Piştî damezrandina Dewleta Emewîyan, gelên Îranê li dijî xîlafeta Islamî bi gelek serhildan rabû, lê bi ser neketin û piştî serhildana Ebassiyan li hemberî dewleta Emewî; gelên Îranê piştgiriya Ebassiyan girtin, lê mixabin Ebassiyan piştî damezrandina dewleta Ebasî; pişta xwe dan wan û di encamê de ”Ebû mislim El xuresanî ” kuştin û têgeha ”zendîq” weke nav li çi kesê ku ew peyrewê olên Arî yên kevn û li çi kesê ku baweriyê bi ola Islam, Xirîstiyan û Cihûtiyê nayne, hat kirin.

Piştî ku dewleta Ebasî ket warê lewazbûnê; tûşî perçebûnê hat. Li seranserî vê dewletê û Îranê gelek dewletên mîna: Dewleta Tahirî, Sefarî, Samanî, Buweyhî, Xuresanî û hwd, hatin damezrandin. Li aliyekî din jî Mengolan di sala 1396`an de bi serkêşiya” Tîmorleng” û berî wê jî di sala1265`an de”Holako” neviyê Cengîzxan yê ku xîlafeta Ebasî tune kir û Bexdayê wêran kir”, êrîşî wê kirin. Paşê dewleta Sefewî li ser navê Şêx ” Sefiyedîn Ishaq Erdebîlî” [6]hat damezrandin, ew jî dibe bapîrê pêncemîn ê Şah”Ismaîl Sefewî”[7] damezrînerê Sefewîyan li Îranê ku mezheba Şîî ya Dozdehîmamî kir oleke fermî. Ramangêrê navneteweyî ”**Ebdela Ocelan”**

[6] Sefyodîn Ishaq Erdebîlî, di hrêma sînorî ya di navbera Azerbaycan û Erdebîlê de jidayik bûye, di 20 saliya xwe de çibû Şîrazê, li wir rastî olnasekî bi navê Şêx Zahid Cîlanî hatibû, ev şêx, yek ji şêxên terîqeta sofîtiyê, li gundekî li ser deryaya Qezwîn bû, Erdebîlî bû yek ji peyrewên wî yê herî dilsoz. 85 sal kir. Dêvêd Mekdol di pirtûka xwe de ya bi navê ” Dîroka Kurda ya nûjen” dibêje: Erdebîlî damezînerê ” Qizlepaş e(Ehil el- Heq, yanî Elewî)- bû.

[7] Ismaîl Elsefewî : Yekî Elewî bû ji ”Qizilpaşê” bû, dev ji mezheba xwe berda, bû li ser mazheba ya Diwanzdeh îmaman, Fars û Tirkmen kirin desthilatdarên Kurdisana Îranê û ji malbata”Erdelan” re ku ew Kurdên Îranê ne, navîka Zagros, newalên berdar û Şehrezûr hişt, piştî şerê Çaldîranê 1514 an, Kurd ji Sefewiyan cudabûn û bi handana pêşengê Kurd” Idrîsê Bedlîsî” û Kurdên Erdelanî ku bi xwe Elewîne xwe biser Osmaniyên Sunî, dan. ” Dîroka Kurd a nûjen, Dêvêd Mekdol”.

derbarê vê yekê dibije: ” **Îran a Şîa bi awayekî kategorîk ji hebûna qewmên Tirkmen, Fars û Kurdan ên li dij Îslama Sunî ya desthilatdar hevgirtine, pêk hatiye û ava bûye. Kurdekî xwedî ocax ê bi navê Şêx Sefiyuddîn bingehê mezhebê Sefewiyan daniye”**[8].

Dîroknasên dewleta Sefewî angaşt dikin ku bapîrê Sefewîyan, Sefiyedîn neviyê Îmam ”Mûsa Elkazim” e, mebesta bikaranîna vê girêdanê, belavbûna raman û baweriyên xwe hêsan bikin, ku dilsojiya gel ji her kesên nêzî pêxember ”Muhemed” bi kar bînin, ta ku”Îmamtiyê”[9] bikin baweriya herî nêzî xweda.

Îmamtiya rasteqîn, ew rêvebertiya şoreşgerî ye, ya ku armanca wê rê nîşanî gel dike û civakeke nimûneyî berovajî îmamtiya Sefewî, ava dike. Ramangêrê navneteweyî ”**Ebdela Ocelan**” wê weke tevgerek dijbere bi nav dike û wilo dibêje : ” **Dozdehîmamî, paşê Şîe û hin tevgerên Batinî xwestin ku li gewherê bigerin û biparêzin**”[10].

Êdî di îmamtiya Sefewî de baldarî û teqeziya li ser tewhîdê û pêxembertiyê, veguherand perestiya ”Îmamtiya” ku di kesayeta Sefewî de tê nimandin. Ev rêbaz weke pergala deshilatdariya di serdema koletî û derbegiyê de ye, dema ku kardar û derbeg mîna xwedawendan bûn. Ev yek tekez dike ku Sefewiyan tîreya (mezheb) ” Îmamtî” weke xebateke siyasî bijart û tu mebesteke wê tune ye ku vê tîreyê bi wateya wê ya rasrteqîn belav bike.

Di sala 1501`ê de ”Ismaîl Sefewî” komeke ji êlên Turkmen ” Beyaz Koyunlar”[11] têk bir û paytexta wan ” Tebrîzê” deste ser kir, êdî xwe kir serdarê dewleta Sefewî ya nû û tevî ku mezheba Sunî sêçaryek ji gelê Îranê ye tîreya Şîî ya ” Dozdehîmamî ” kir bîrdoziya dewleta Sefewî. Ew jî ji bo

[8] Manîfesto berga 5 – R 156 .

[9] Îmamtî: Li gorî baweriyên wê; baweriya mirov çênabe ta bweriyê bi xwedê û bi melaîket, kitêb, pêxember û roja axretê û welayetî Elî neyne.

[10] ji dewleta Kahinên Somerî ber bi şaristaniya Demokratîk ve.

[11] Beyaz Koyunlar;Berxên gewr: Êleke Tirkmen e, li rojhilatî Anatolyayê, Fars, Îraq, Azebaycan, Afganistan û Tirkemenistanê, di navbera salên 1467-1502 an hukim kir. . . koka vê nasnavê ji hin adatên wan yên kevn der barê pîrozkirina vî ajalî(Berx). Gihişt astekê ku bû sembola vê êlê, regeza vê êlê jî, ji Tikkên Egoz hatiye. Wikipedia

xwe ji dewleta Osmanî ya Sunî, cuda bike. Dibe ku milmilaneya wê ya dirêj bi şhinşahiya Osmanî re ne tenê milmilaniyeke leşkerî bû; da ku hebûna xwe bide diyar, lê ew milmilaniyeke ramanî bû, ji bo ku serkêşî û lêvegera Islamî ya ku xwe didîtin xwediyê wê, bi dest bixe. Vê yekê hişt ku " Ismaîlê yekem" li ser afirandina nasnameyeke ji Osmaniyan cuda û vegerandina Şahinşahiya Farsî pir bi rijd be. Êdî baweriyên olî yên Şîî kir amûreke ji bo pêkanîna vê yekê. Ji bo ku rewatiyê bide xwe, dola Sefewiyan bi "Mûsa El-Kazim" girêdan, bi vî awayî regeza Sewefwiyan bi dola pêxember "Muhemed" girêda.

Weke me anî ziman, ji ber ku piraniya miletê Îranê Misilmanên Sunî bûn, Sefewiyan di destpêka tevgera xwe de nasnameya xwe ya" Şîî" nedan diyarkirin, lê piştî Sefewiyan tîreya "Şîî" weke tîreyeke fermî li Îranê ragihandin, hemû netewe di nav wan de neteweya Kurd, bi kotekî ew kirin"Şîî" û koçbûn û kuştin bû para çi kesê li dijî vê helwestê derket.

Hişmendiya Sefewîyetê gelek rêgezên Islamê çewt kirin û perçebûna tîreyî di navbera Şîe û Sunniyan de xurt kir, hewl da xwe weke parêzvana Şîîyan bide xuyakirin, teşeya bangê (Azanê) guhert, şehdebûna sêyemîn"Ez şahidim ku Elî Welîyê Xweda ye" lê zêde kir, pîrozbahiya salane ya bîranîna kuştina "Husên" kurê Xelîfe Elî Binûebîtalib" kirin, ji destpêkê ta roja dehan ya meha "Muherem" li serîdanaşû, lêdana rû û sîngê û li xwekirina kincên reş tên kirin, ew jî bi navê" Aşûra" tê naskirin, her wiha sicûd li ser" axa Huseyniyê" [12]çesibandin, hemû perestên wan bûn li ser rêbaza tîreya " Şîî", dibistan ji bo hînkirina tîreya Şîî" hatin vekirin û mizgeftên Suneyan hatin girtin, pere bi navê "Alûlbeyt" hatin çêkirin, tevgera çandî ket bin bandora Şîetiyê, endamên wê di dewleta Sefewî de asteke bilind cih girtin û Sefewiyan gelek pere ji wan re veqetandin, her wiha têgeha "Dewletaûlfeqîh" ji bo xurtkirin û asêkirina vê dewleta tîreyî derke holê. Bi vî awayî Sefewiyan bi guhertina terîqeta xwe ya sofîtî ber bi tevgereke olî ya navdar di Îranê û herêmê de, bi serketin. Gelek alîgirên wan çêbûn, bi taybetî li hin dewletên Erebî. Peyrewên Sefewiyan ji bo Şîetkirinê gelek kiryarên tund bi kar anîn. Ev jî bû sedem ku dewleta Sefewî li hemberî gelek bertekan were ku dawî lê anîn. Weke Efganan ku Sefewiyan stemkariyeke

[12] Perçeyek ji heriyêye li ser nimêj dikin, her wiha hin vê heriyê dixwin; ji bo saxlemtiyê.

mezin li ser wan kirin ku Şîetî li ser wan gerek kirin. Ev kiryar di sala 1722`an de bû sedema tunekirina dewleta Sefewî ku ”Şah Husên ” padîşahê wan ê dawîbû. Li ser kavilên dewleta Sefewî, çend dewletên weke ç: Dewleta ” Hûtkiyanî, Afşarî, Zendî” hatin avakirin. jixwe Dewleta Zendî ” 1794- 1757” roleke wê ya mezin di dîroka Îranê de heye. Ew jî ji hêla Zendiyan hat damezrandin, ew jî şaxek in ji êla ”Lekî” a Lorî ya Kurdî ku cihê wan di navbera Xozistan û Esfehanê de ye, herêma wan bi navê ”Loristan” tê naskirin. Qaçariyan şerê navxweyî di nav Zendiyan li ser deshilatdariyê ji xwe re derfet girtin û di şerekî de bi serkêşiya ” Axa Muhemed Xan” sala 1794 dewleta Zendî tune bike. Dewleta ” Qaçarî” heta deh salên duyem ji sedsala bîstan domand. Li şûna wê dewleta Behlewî di sala 1925 – 1979 avabû, ew jî şoreşa Islamî ya ” Şîî” bi serkêşiya Xumeynî ew bi dawî kir.



***Textê Şahinşahiya Îranê (Serweriya Behlewî)***

## Şoreşa Islamî ya Şîî li Îranê :

Gelê Îranê di sibata 1979`an ji bo rûxandina desthilatdariya rêjîma Şah” Muhemed Riza Behlewî”[13] bi şoreşek teqand. Olnas ”Ayetûlah Xumeynî” ji cihê sirgûna xwe Fransayê bi daxuyaniyên xwe yên bikelecanî serkêşiya

[13]Muhemed Riza Behlewî: Li Tehranê jidayik bûye, kurê Riza Behlewî yê mezine, yê ku Îran di serdema; navbera( 1925-1941) hikum kir, bû mîrasgirê şahişahiyê sala 1926 an. Şahê herî dawîbû, desthilatdariya wî ji sala 1941 ta 1979 an berdewam kir, jêr dihat gotin ” Şahinşah” tê wata ” qiralê qiralan”.

şoreşê bike. Xumeynî di axaftinê xwe de diyar kir ku armancên şoreşê tunekirina zordariya rêjîma Şah e, her wiha ew ê piştgiriya rastiyê bikin û dadmendiyê û têkiliyên Îranê bi gelê herêmê re li gorî cîrantiya baş, ava bike. Lê piştî biserketina şoreşê û vegera ”Xumeynî ”, jimareke Zanyarên”Şîî” bi serkêşiya Xumeynî bi lez destlatdarî desteser kirin, rola pêkhateyên din di şoreşê de pişguh kirin û rikberî çewisandin. Piştî serweriya wan bi serket; rêgeza”belavkirina şoreşê” ragihandin. Li gorî nerîna wan, pêwîstiya Islamê bi cîbicîkirina rêgeza”Wilayetûlfeqîh” heye. Êdî ji bo serdestiya herêmê bikin pilanek danîn û li gorî berjewendiyên ramyarî yên ”Şîî”, araste kirin. Ev rêjîm bi zordariya xwe nekêmtirî zordariya Şah bû, ev şoreş li hemberî çi kesê armancên”Xumeynî” nepejirand, bû amûra belavkirina bizdîn û tirsê. Ji bo nûjenkirina raman, armanc û hişmendiya desthiladariyê xwe, bi awayekî nerasterast rêbaza dewleta Farsî ya Sefewî şopand, ew jî di riya raghandina tîreyîna Şîî . Bi vê yekê mafê pêkhateyên Îranî di nav wan de Kurd pişguh kirin, tevî ku civaka Îranî civakeke ji hêla ol, tîre, netewe û zimanan, pirrengî ye. Ji destpêka şoreşê Kurdan piştgiriya” Xumeynî” kir, ji wan werê ku ferweriya şoreşê dê piştgiriya wan bike û xweseriyeke wan erê bike, lê tiştê bi serê wan hat weke tiştê ku bi serê Kurdên bakurê Kurdistanê di serdema ” Ataturk ” de hat ku ji bo avakirina komara Tirkî Ataturk ew weke êzingê bi kar anîn, her wiha doza wan jî piştî peymana ” Lozanê” di sala 1923`an de zîvirî aloziyeke navxweyî. Piştî serkeftina şoreşa ” Şîî” ya Islamî û bidestxistina deshilatdariyê, ” Xumeynî” ferman da artêş û Pasvanên Şoreşê ku berxwdana Kurdan û çi kesê li dijî rêjîmê serî hilde tune bike, bi sedan mirov zindankirin û bi dehan hatin kuştin.



Ramangêrê navnetewî” **Ebdela Ocelan**” di derbarê vê de wilo dibêje[14]:"... şoreş di destpêkê de mîna Şoreşên Fransî, Rûs û Anatolyayê xwedî naverokeke neteweyî û demokratîk bû. Xwe disipart hevgirtineke berfireh a hêzên neteweyî û demokratîk. Ev hevgirtina neteweyî û demokratîk a ji piştgiriya komînîstan, ummetgirên Şîî û di serî de Kurd ji beşên din ên gelên welatparêz ên Îranî pêkhatî, xwediyên rastî yên serketinê bûn. Lê belê ulemaya Şîî û zumreya bazirgan a çîna navîn ku ji aliyê dîrokî û civakî ve di warê rêûresma rêveberiyê de bi hêz bûn, di demeke kin de hegemonya xwe ava kirin. Hevgirtiyên xwe yên din bi awayekî bêrehm pelixandin. ”

Paşê “Ayetullah Xumeynî” rapirsîneke giştî li dar xist. Li gorî vê rapirsînê Îran bû “Komara Islamî” û di bin çavdêriya encumena şoreşê ya ku Xumeynî serkêşê wê yî herî bilin bû, ferwerî hat damezrandin. Paşê destûra welêt a ku gelek rêgezên wê ji teweriya ”Wilayetûlfeqîh” birine hate sazkirin, li gorî wê Xumeynî bû serkêşê “ Weliyûlfeqîh”`ê yekem û desthiladariya siyasî û olî ket destê ”Weliyûlfeqîh”, yan jî “ Şêwermendê bilind”. Li gorî teweriya wan ”Wilayetûlfeqîh” yasaya xwe ji “Îmamî Mêhdî” destine, ji ber wiha nabe biryarên wî bêne redkirin û li gorî destûrê xedî desrewatiyên berfireh in.

Li hemberî vê di qada çandî ya Îranê de dijberiyek derket. Di serî de tevgera” Rizgarkirina Îranê” ku li ser destê” Mehdî Bazirgan” serokê fêrwera demikî ya şoreşa Îranê ya ku di sala 1979`an de hatibû danezrandin û şepêla olî ya nerm. Van dijberan serweriya oldarên ” Şîî” li ser dezgehên dewletê bi taybetî li ser dezgehên ragihandin û dadmendiyê, nepejirandin. Li aliyekî din jî, daxwaza bikaranîna rêbazên nûjen di rêveberî û desthilatê de kirin, her wiha ”Weliyûlfeqîh” li hemberî rikberiya şepêla lîberal ya ku daxwaza “ Komara îran a domokratîk” ji dêvla “Komara îran a Islamî” ava bike, derket. Lê “Weliyûlfeqîh” ê ku tenê biryar di destê wî dene, peyva demokrasiyê nepejirand û ragihandin ku Îran komareke Islamî ye û pasdarên şoreşê damezrand. Bi vê yekê hemû dezgehên destûrî, dadmendî, cîbicîkarî, leşkerî û ewlehî ketin bin serweriya pasvanan de, her wiha siyaseta derve ya girêdayî ewlehiya bi riya “ Liqa Elqudis” a bi serpereştiya “Qasim Sulêman”, pêk bîne. Ji ber wilo em dibînin ku tu cûdahî ji hêla

[14] Manîfesto berga 5 – R 441.

birêvebirina dewletê di navbera serokomaran de, tune ye. Ji ber ku hemû bi hişmendiya "Wîlayetûlfeqîh" serweriyê dikin.

**Teweriya Wîlayetûlfeqîh[15]:**

Teweriya Wîlayetûlfeqîh cewherê tîreya Şîî ya Dozdehîmamî. Li gorî vê pêxember “Muhemmed” ji bo îmametiyê “ Elî Bin Ebîtalib” hilbijartibû û divê ev îmametî di dûndeya wî de berdewam bibe, destpêkê ji kurên Elî Hesen û Husên, ango bi awayekî zikmakî rêz bibin ku her Îmamek îmamê li pey xwe destnîşan dike ta bigihêje îmamê dozdehemîn” Mehdî”.

Teweriya Wîlayetûlfeqîh piştî derketina pirsgirêka nebûna paşmagirê imamê yazdehemîn” Îmam Hesen Eleskerî” yê ku di sala 873`an de mir, derket holê. Ev yek bû sedema ku cudabûn û nakokî di navbera Şîîyan de, derkeve. Oldnasên Şîî ev metirsî berçav derbas kirin û “ Muhamed Bin Hesen Eleskerî” bi nasnav “Mehdî” ji bo cîgeha îmametiyê, pêşniyar kirin. Li gorî devokên Şîiyan metirsî li ser jiyana wî hebû, ji ber wilo hate veşartin. Vê baweriyê tîreya Şîî ya ku niha tê naskirin zelal û eşkere kir. Her wiha li hemberî arîşeya bê paşmayek li pey mirina “ Hesen Elskerî”, nehişt tîreya Şîî”ji holê rabe. Êdî ji bo birêvebirina karûbarê vê tîreyê, cîgirek jê re hate erkdarkirin ku navê ”Cîgira taybet” li vê cîgehê hat kirin û "veşartina biçûk a Îmamê Mêhdî" li vê rewşê hat kirin. Ji bo çespatandina vî cîgir, divabû dozgerê cîgirtiyê; derhozekê yan jî belgeyekê pêşkêş bike ku pêwendiyên wî bi îmamê Mêhdî re hene. Êdî fetû û tefsîran ji wî bighîne bawermendan û dirav û malên Zekat û xenîmeyan ji wî re bibe. Dîroknasên Şîî, tenê navên çar cîgeran diyar dikin ku yê dawî “ Elî Bin Muhemmed Elsumerî” bû, ew jî di sala 940`î mir û tu kesê şûna xwe nîşan nekir. Vê yekê Şîî xistine astengiyeke nû, ji ber ku olnasên Şîî hebûna îmamtiyê“ Îmamê dadmend” yan jî cîgirê wî weke mercekî ji bo rêdana cîhadê, darizandin û rastiya lidarxistina nimêja înê, gerek kirin. Êdî qonaxa veşartina mezin dest pê kir û ramana cîgirtiya giştî ya olnasan li ser cêgirtiya taybet ya ku ji ber rewşa veşartina biçûk feriz kiribpêwîst bû, hat diyar kirin. Bê guman ev jî weke nerîn û icthada ji hêla olnasên Şîî hate derxistin.

[15] http://www. almaaref. org. Baxçeyên Şîniyan – Îran û Wîlayetûlfeqîh - Dr. Mistefa Ellebad.

Piştî damezrandina dewleta Sefewî, Şahên wan ji bo xurtkirina deshilata xwe li hemberî dijberan, kirasê olî li xwe kirin bi taybetî li hemberî girûpa ”qizil paş” yên ku serweriya wan gelekî di movikên dewletê de hebûn. ji bo vê yekê Şah “ Tehmasebê yekem kurê Ismaîlê Sefewî” di sala 1533`an de ji bo ku serdestiya xalanên xwe yên Tirkumen ên ji girûpa “ Qizil paş”[16] kêm bike, oldarê Şîî “Elî kurê Husênê Kerkî” yê bi nasnav “ lêpirsînerê duyem” ew kir şêwirmendê olî û nasnavê cîgirê “Îmamê Mêhdî” lê kir, ew jî li gorî olnasên Şîî. Weke nimûne: Oldarê Şîî “Mihemmed kurê Mekiyê Cizînî Elamilî” ( nasnava wî ji çiyayî Amil ê Libinanê hatiye- di sala 1472`an de miriye), cîgirtiya feqîtiya giştî ji Îmamê ”Mehdî”[17] erê kir ku dikare cêgiriya erkên dadmendî, siza û nimêja Înê ji dêvla Îmam, bike.

Bi vî awayî Şah yasaya olî ji deshilata xwe re qezenc kir û paşmayikên wî jî heman rêbazê şopandin. Vê yekê derfteke da ku saziyeke olî ya alîgirê deshilatdariyê, derkeve holê. Ew jî tevî nakokiyên di navbera kesên ku têkiliyan bi deshilatdarê re dipejirînin û kesên ku dibêjin ku li gorî feqîhên şiyê tenê wîlayet ji Îmamê Mehdî re ye û wekî dinn fetwe jê re divê. Tevî wilo jî, pêşketineke mezin li pêşiya ramana siyasî ya Şîîtiyê çêbû û rêç li pêşiya ramana Wîlayetûlfeqîh re vekir, her wiha hişt kesên oldar destwerdanê di desthilatdarî û siyasetê di serdema dewleta Qaçarî de bikin. Hin jêder dibêjin ku kesê yekem ê ku têgeha “Wîlayetûlfeqîh” bi kar anî “ Şêx Ehmedê Mihemed ê Mihdî yê Neraqî yê Kaşanî ” ( ji bajarê Kaşanê yê Îranî ye, di sala 1867`an an jî 1829`an de miriye), di pirtûka xwe ya bi nave “Bîranînên rojan ji bo zelalkirina rêgezên ehkaman de” bû[18]. Di vê pitrtûkê de daxwaz kir ku ji bo şîiyan divê Feqîh karûbarê rêveberiyê û derxistina Ehkaman bikin. Ev jî li gorî nerînên olnas” Mihemmed Cezînî Amilî” ye. Her wiha “Mîrza Ebûlqasim Ibnûlhesenê Cîlanî yê Qumî (di sala 1814 an de miriye)” ji olnasên navdar ên serdema Qcariyê bû, di pirtûka xwe ya bi navê “Erşadname” sultan xistin asta” Siha xwedê” û diyar kir

[16] http://www. almaaref. org. Baxçeyên Şîniyan – Îran û Wîlayetûlfeqîh - Dr. Mistefa Ellebad.

[17] http://www. almaaref. org. Baxçeyên Şîniyan – Îran û Wîlayetûlfeqîh - Dr. Mistefa Ellebad.

[18] http://www. almaaref. org. Baxçeyên Şîniyan – Îran û Wîlayetûlfeqîh - Dr. Mistefa Ellebad.

girêdaneke xurt  di navbera olnasên Şîî ên ku nasnavê “derwêş” li wan kir û sultanan ên ku nasnavê “Komika birûmet” li wan kir de, heye.

Weke mînak: Şêwermendê bilind “Mihemmed Hesen Şîrazî - 1891” fetweya tunekirina peymana tûtinê ya ku bi hevbeşiya Brîtanî re hatibû morkirin, derxist. Vê yekê hişt ku welat hemû li hember Şah “ Nasir El- dîn” rabe, di vê fetweyê de gotibû: Bikaranîna tûtinê heram e û bi karanîna wê weke ku yek şere Îmamê Mihdî dike. Teweriya Wîlayetûlfeqîh di serdema de li pêş ket. ”Xumeynî” zanista xwe ya olî ji encumena zanistî li bajarê Qom wergirtiye, her wiha piştî ku ji hêla Şah Mihammed Riza Behlewî di sala 1963`an de sirgûnî derveyî welat hate kirin, ramanên xwe li Necefa pîroz dan ser hev û komara Islamî ya Îranê li ser bingeha “Wîlayetûlfeqîh” damezirand, Bi vî awayî teweriya “ Wîlayetûlfeqîh” ya bêmerc(mutleq) li “Necefê” ne li “Qomê” hat afirandin û çi kesê xwedî” Zanist, zagon û dadmendî”; wîlayeta wî weke wîlayeta pêxember ve, her kes divê perestî û taeta wî bike û Feqîh bûn pêşmatên pêxemberan, bi vê yekê Wîlayetûlfeqîh bû xwedî pîrozkirineke olî û Weliyûlfeqîh di ser zagonê re hate girtin, vî tiştî hişt ku pergala desthilatdariyê nêzî desthilata sîyokratîkiyê bibe, ango Feqîh bi nave xwedê desthilatdariyê dike, êdî divê civakan tikiliyê bi Feqîhan re bike weke ku ji hêla xweda hatiye danîn, nabe kes li dij wî derkeve yan jî biryarên wî rexne bike, na be tu kes nêzî kar û xebatên wî bibin, ji ber ku pîroz in.


Kesên ku berevaniyê tewriya Wîlayetlfeqîh dikin, hewl didin ku bi Ayetên Quranê rastiya wê tekez bikin, mîna wê jî “ Ayeta 282 - Sûrat Elbeqera”, lê oldarên Sune, vê angaştê napejirînin û dibêjin ku wîlayet tenê ya pêxember û xweda ne, her wiha wîlayeta bawermendan li ser hev bêyî ku kategoriyekê ji wan we re destnîşan kirin, mînaka wê di Sûreta Elwbe de - Ayeta71 û di Sûreta El maîde - Ayeta 55-56 hatiye gotin.

Piştî şoreşa Islamî, teweriya Wîlayetûlfeqîh  bû girîngtirîn taybetmendiya pergala ramyarî ya Îranê û bû rengê dawî yê ku Islama ramyarî ya Şîî ji bo ku desthilatdariya xwe bidomîne, ew bi pêş xist.



Zagona Îranê, di destpêkê de, di benda Weliyûlfeqîhê dadwer de dibêje: ” li gorî domandina wîlayetûkemrî û îmamîtiyê, zagon rewşên guncav ji bo cîbicîkirina serkêşiya feqîhê ku hemû merc tê de peyda bibin û gel wî weke

rêbêrê xwe dipejirîne, amede dike (Rêvertî di destê olnasan de ye, ew ên ku li ser helal û heram emîndar in de ye). Bi vê yekê zagon hemû pergalan ji rêberdana peywirtiya xwe ya Islamî û resen, diparêze. Benda /5/`an ya xala /2/`an jî dibêje:" Bawerî bi Îmamtî û rêberiya domdar û bi rola wan di domdariya şoreşa ku Islamê afirandiye."

Benda /5/`an dibêje:"Di serdema veşartina îmamê Mihdî de, serkêşî û îmametiya gelê komara Îran a Islamî di destê Feqîhê dadmend yê xwedanas, pêşbînê serdemî û dilawerî de ye. Ew ê ku dikare rêvebertiyê bike û piraniya gel ew ji bo serkêşiyê pejirandin. Li gor madeya /107/`an, heke merc di feqîhekî pêk neye, rêveber ya jî encumena rêvebiriyê yên ku mercên bûrî di wan de peyda dibin, dê serkêşiyê bikin. Bi vê yekê saziya " Wliyûlfeqîh" yan jî " Şêwermendê bilind" di asta herî jor a qoçeya desthilatdariya Îranê cihê xwe digire, her wiha destrewatiyeke berfireh xistine destên xwe ku serweriyê li dezgehên Îranê û desthilatdariyên zagonsaz, dad, cîbicîkar, desthilata çaremîn(ragihandin) û ragihandina cîhadê bike, kiriye: Mînak : Xumeynî, yekem serokê komarê " Ebû Hesen benî Seder" di sala 1981`ê de dema êdanên wî nepejirandin ew ji kar avêt. Her wiha di sala 1988`an de nameyeke tund ji serokê berê Elî Xameneyî şand, ji ber ku li hember zagona kar ya ku Xumeynê û meclisa parastina zagonê pejerandibûn, derket.



Li gor benda 5`an ya zagona Îranê ya ku me anîbû ziman, dibe ku “Şêwermenê bilind” were dûrxistin, dema nikaribe bi peywirtiya xwe ya zagonî rabe, yan jî yek ji taybetmendiyên rêvebertiyê yên di bendên (5) û (129)`an winda bike yan jî bê xwiyakirin ku ev taybetmendî ji berê de li gel nîne, wê demê ev peywirtî radestî “ Encumena pisporan” dibe. Tê zanî ku hîn tu carî Şêwermenê bilind” nehatiye dûrxistin, jixwe tenê du kesan ev şûnkarî bi rêve biriye, ew jî xumeynî û ”Elî Xameneyî” [19]bûn. Bi vî awayî “ Weliyûlfeqîh” yan jî “ Şêwermenê bilind” heta hetayî di vê şûnkariyê de dimîne, ew jî ji hêla “ Encumena pisporan” tê hilbijartin û xwedî desthilateke bêsînor e.


**Dewleta Îranê:**

Li gorî benda yekem ya destûra” Îranê,”[20] û belgeyên fermî ên Netewên Yekbûyî navê dewletê ”Komara Islamî ya Îranî” ye, Îran endameke

[19] Elî Hisênî Xameneyî, di sala 1939 an li bajarê Meşhed jidayik bûye, rgeza xwe bi xelîfê Raşidî ”Elî Bin Abî Talib” girêdide, tevî teqeziya hin jêderan li ser regeza wî ya Azerî, hewldana kuştina wî di sala 1981 an bi destê ” Micadê Xelq, dema xutbeyek nimêja înê li Tehranê dida, hat kirin, di encamêda birîndar bû, reha destê wî ya rastê hat birîn.

[20] Destûra Îranê 1979 an.

Neteweyên Yekbûyî, Rêxistina Kongereya Islamî, Rêxistina hevkariya deryaya Xezrê(Qezwîn) û hin rêxistinên din e. Îran ji /31/ parêzgehan pêk tê, paytexta wê Tehran e, dirava wê ya fermî " Riyal" e û dabeşî /100 / dênarî dibe.

Etnîk û neteweyên tê de ev in" Fars, Kurd, Azerî, Turkmen, Baloç, Ereb, Gilak[21], Asûrî, Kaldan, Armenî, Cihû. Serjimareke teqez tune ye ku rêjeya neteweyên Îranê zelal bike. Li gorî hin Çavkaniyan, rêjeya neteweyên Îranê wilo ne; Fars (%61), Azerî (% 16), Kurd (%16), Baloç (%2), Tirk û Turkmen (% 2), (% 2) ji jimara şêniyê ya bi qasî (81 597 779) ne. Lê hin Çavkaniyên din, rêjeya neteweyên Îranê wilo didin diyarkirin; Farsan (%30-40), Azerî [22] (% 25-30), Ereb (% 8-10), Kurd (10 -12 %), Baloç (3-4 %), netewên din weke Asûrî, Turkmen, Armen û hwd (1%)[23] ne.


Li Îranê gelek ziman hene weke: Farsî, Kurdî, Azerî, Turkmenî, Baloçî, Erebî, Sîstanî, Qaşqayî, lorî, Benderî, Armenî, Asûrî, Kaldanî, Tatî, Medayî, Mazanderanî, Bextarî, Dîlî, Talîşî, Lekî, Kilkî û zimanên din. Piraniya gelê Îranê bi zimanê; Farsî, Kurdî, Erebî, Baloçî û Azerî diaxifin. Lê li gorî benda/15/`an, zimanê Farsî zimanê fermî ye. Ev bend wilo dibêje:" Ziman û nivîsa fermî û giştî ya gelê Îranê zimanê Farsî ye, divê hemû belge, nivîs û pirtûkên dibistanan bi zimanê Farsî bin, dibe ku zimanê herêmî û neteweyî di warê çapemenî, dezgehên ragihandina giştî û hînkirina wêjeya wan li kêleka zimanê Farsî li dibistanan de, were bikaranîn". Ji ber vê yekê zimanê Farsî dibe zimanê fermî û li gorî benda16`an a zagona Îranê; ji ber ku zimanê Erebî zimanê Quranê ye, di qonaxên seretayî, navîn û amadehî tê hînkirin.

---

[21] Îran. . kêmneteweên bê maf, daxwaz û aso. https://www. skynewsarabia. com

[22] Azer; Regezek e, hebûna wan bi giştî li bakurî rojavayî Îran û Azerbêcanê ye, her wiha li zozana Îranê jî hene, xwedî çandeke Îraî, Tirkî û Qoqazîn e, piraniya milêtê wê Misilmanên, hin ji wan xiristyanî û Baha'î ne, bi zimanê Azerî diaxifin, https://www. marefa. org

[23]Erdnîgariya Îranê; http://www. alalam. ir




Der barê olê, benda /12/`an a zagona Îranê dibêje:” Ola fermî ya Îranî, Islam e û tîreya Cehferî ya diwanzdehîn ye, ev bend hetahatayî neyê guhertin…. ”, lê destnîşan bi rêzgirtina tîreyên din ê Islam û olên din mîna “ Zeredeştî, Xirîstiyanî, Yahûdî, Mendanî û Yarsanî” [24] jî, lê danpêdan tenê bi ola “ kir. Her wiha hin olên din weke Zeredeştî, Xirîstiyanî û cihûtî, Mendayî û Yarsanî” hene. Li gor zagona Îranê ji wan sê ol tenê pejirandine, benda /13/`an ji destûrê dibêje “ Îraniyên Zeredeştî, Cihû û Xirîstiyan tenê kêmol in û danpêdan bi wan hatiye kirin, bi azadî dikarin nerîtên (dêlindêzên) xwe yên olî li dar bixin. Di zagona Îranî de di bin navê Xirîstiyanê de danpêdan bi hûrgelên weke”Armen, Asûr û Keldan” tê kirin. Di Bnda /64/`an hatiye:” Jimara parlamenterên encûmena şêwermend a Islamî /270/ parlamenter in, bi pirbûna serjimariyê her deh salan parlamenterekî ji bo /150, 000 / kesî li ser her naveke hilbijartinê pir dikin. Zeredeştî, Cihû, Asûrî her yek ji wan parlamenterekî hildibijêre û Kildan û Asûrî bi hev re parlamenterekî hildibijêrin û Armenên li bakur û başûr du parlamentan hildibijêrin, dema

[24] Ola mendayî, yan jî Sab'î e, oleke Ibahîmî ye, dibe kevntirîn ol, hebûna wan li Mêzobotamya û Filestînê bû, ta niha jî peyrewên vê olê li Îraq û Ahwazê hene, ew jî baweriyê bi xweda tînin.


serjimariya hûrgeliykî pir bibe, her deh salan parlamenterekî ji bo /150, 000/ kesî pir dikin. Zagon karûbarên girêdayî  hilbijartinan destnîşan dike.





Der barê jimara şêniyê, serjimêriya dawî di sala 2014`an Îranê hate kirin ku jimara şênîên gihişte /78 143 644/ milyon kesî [25], Di sala 2016`an serjimariya Îranê pir bûye, der barê wê  serokê Navenda Serjimêriya Îranê wilo got:" Li gor serjimariya 2016`an jimara şêniya Îranê gihişt /79 260 270/ milyon kesî ku bi rêjeya /1. 24%/ pirbûne. …. hejmara nêran /40 498 442/ û hejmara mêyan /39 427 828/ milyon kes e [26].

[25] https://ar. actualitix. com/country/irn/ar-iran-population-by-country. php

[26] Navenda serjimariyê; http://www. alalam. ir/news/1937600




Pergala deshilatdariya Îranê Teokratîk[27], serokatî û parlementerî ye. Qoçeya desthilata Îranê bi vî awayî ye:

[27] Teokratîk: Tê wateya hukmê kahînan, yanjî hukmê olî. https://www. almaany. com




Wek me anî ziman", Weliyolfeqîh" yan jî rêber ku cihê wî di qoçeya desthilata komara Islamî ya Îranî de li qata herî jor e û ew weke Rêberê rewanî û miftiyê dewletê yê herî bilind e, xwedî desthilatdariyek berfireh e, her kesek di nava dewletê de, leşker yan jî sivîl be, divê alîgirê wî be û li gorî fermanên wî tev bigere, ji ber ku ew nûnerê îmamê Mehdî ye. Ew jî Şîî ji bo pêkanîna dadmendiyê bendewarê wî ne. Di benda /5/`an ya zagona Îranê de hatiye : " Di serdema veşartina îmamê Mehdî de, destlatdarî û îmameta umetê ya komara Îran a Islamî, di destê Feqîhê dadmend û dilawer de ye. Feqîhê ku piraniya gel ji bo rêbertiyê ew bijartiye. Dema Feqîhek vê piraniyê bi dest nexe, rêber an jî encûmena rêbertiyê ya ji Feqîhên ku mercên borî pêk tînin, bi vê berpirsyariyê rabin, ew jî li gorî benda /107/`an e.

Benda /110/`an, peywertî û destrewatiya rêbertiyê wilo diyar dike:

**1-**Endamên encûmena parastina zagonê yên feqîh, erkdar dike.
**2-**Berpirsyarê dadwer ê herî bilind, erkdar dike.
**3-**Serkêşiya giştî ya hêzên çekdar li gorî van erkan dike:
a.Destnîşankirin û jikaravêtina serokerkanê artêşê.
b.Destnîşankirin û jikaravêtina serkêşê giştî yê hêza pasdarê şoreşa Islamî.

c.Avakirina encumena berevaniya bilind ya niştimanî, ew jî ji /7/ endaman pêk tê:

-Serokkomar.

-Serokşaryar

-Serokerkanê Artêşê

-Serkêşê giştî yê hêza pasdarê şoreşa Islamî.

-Destnîşankirin du endamên şêwermend.

ç. Bi pêşniyara encumena berevaniya bilind, fermandarên her sê hêzan; tên destnîşankirin.

d. Bi pêşnyara encumena berevaniya bilind; ceng, lihevhatin û seferberî tê ragihandina.

**4-**Pejrandina serokkomar, piştî ku ji hêla gel ve were hilbijartin.
**5-**Ji erka serkkomartiyê avêtin, ew jî piştî berjewendiyên welêt û bi biryara dadgeha bilin ku bi erka xwe yê zagonî ranabe yan jî piştî nerîna encumena şîwirmend ya Islamî ku kêrhatina wî ya ramyarî tune ye.
**6-**Di çarçoveya pîvanên Islamî de û piştî pêşniyara dadgeha bilind, lêborînkirin yan jî sivikirina cizayên sûckeran.

Ji ber vê yekê, Weliyûlfeqşh xwedî destrewatiyeke berfireh e, dihêle ku di karûbarê ferweriyê û jiyana civakî, ramyarî, leşkerî û aborî ya civaka Îranî, destwerdanê bike.



Ala Komara Islamî Ya Îranê

Der barê ala Îranê, di benda/18/`an de hat destnîşankirin: Ala Îranê ji rêngan " kesk, sor, spî û sembola komara Islamî " Elahûekber" pêk tê. Ji sê milkêşên rast pêk tê, kesk li jor, spî li navê û sor li binî ye. Di navîka milkêşa spî peyva " Elahûekber" mîna teşeya gula giyamiskê (zembeq) heye û 11 caran navê " Elahûekber li goşeya xwarê ya milkêşa kesk û ya jor yai milkêşa sor" hatiye nivîsandin.

Li ser ala Îranê navê xweda 22 carî hatiye nivîsandin, ew jî nîşana hijimara bankirina vê durişmeyê ji aliyê serhildêran ve dijî rêjîma Şah û ji bo bîranîna damezrandina şoreşa Islamî ye. [28.]

Şepêlên ramyariyê yên li Îranê sê ne, ew jî ev in:

▪Şepêla Kevneparêz(Muhafazkar) [29] ya ku bi awayekî bêsînor girêdayî "Weliyûlfeqîh" e. Daxwaza avakirina statuyeke Şîî ya cîhanî, qezenckirina çekê navokî, destesrkirina cîhana Suneyê, tunekirina Îsraîlê û mendelekirina doza Kurdî û hwd, dike. Girîngtirîn partiya wê ” Partiya komarê ya Islamî”ye, li ser xwesteka Xumeynî, li ser destê” Haşimî Refsencanî, Elî Xameneyî, Mûsa Erdebîlî, Ayetûlah Mihemmed Bihiştî û hwd di sala 1979`an de hate damezrandin, her wiha li ser daxwaza Xumeynî di sala 1987`an de, hate pûçkirin. Piştî şoreşê bi tenê ev paryî hetibû dabezrandin, piştî wê heta sala 1995`an tu partî nehatin damezrandin. Ev partî dibine ku erka şoreşa Islamî ew e ku li ser bingeha îdyolojiya Xumeynî Misilman û tevahiyê mirovahiyê rizgar bike. Partiyeke bi navê” Hizbûla ya Îranî”[30] di sala 1995`an de hat damezrandin, piştgirtiya xwe ji Pasvanê Şoreşê digire, piraniya endamên wê ji milîsên Basîc in, yan jî ji kevneşervanên şerê Îran û Îraqê bûn, roleke wê ya girîng di çewisandina serhildanên ên dijî rêjîma Îranê hebû. Partiyeke din bi navê” Partiya Itilafa Îranî” ku bi alîkariya Xumeynî di sala 1962`an de hatiye damezrandin, ji Itîlafa Bazar, Komeleya Oldarên Şervan û Komeleya Mamosteyên Hewza Qum ya zanistî, pêk tê. Ev her sê sêgoşeya hêza rêjîma Îranî pêk tînin. Her wiha hin partiyên din jî hene.

▪Şepêla vesazîparêz(Raformxwaz) ya ku li gorî şepêla kevneparêz, bi nermbûnê tê saloxdan û jê re dibe weke rikbereke nerm. Daxwaza demokrasî, şerê gendeliyê, aboriyeke vekirî bi tevahiya cîhanê re, dike. Her wiha dixwaz dike ku Îranê bi dewletên din re, dûrî tevlihviyên siyasî bikeve bê ku cewhera pergala ”wîlayetûlfeqîh” were binpêkirin. Girîngtirîn partiya vê şepêlê; partiya ”Itîdal û tewesuh( حزب اعتدال و توسعه), ya ku di sala 1999`an de hatiye damezrandin, Hesen Ruhanî şêwermendê vê partitê ye, her wiha Fatîma Rafsancanî keça Haşimî Rafsancanî jî piştgiriya vê partiyê

---

28 Flag of Iran- https://www. britannica. com/topic/flag-of-Iran

29 Şepêlên siyasî li Îranê التيارات السياسية في إيران . أبناء الثورة والمعارضة http://www. aljazeera. ne

30 http://www. aljazeera. net

dike. Ev partî ji şepêla kevneparêz û çepgiran cuda ye, xwedî Îdyolojiyek Islamî Şîî ye, piştgiriya pergala ” wîlayetûlfeqîh” û ”Komeleya oldarnasên mucahid” (انجمن علمای دینی مجاهدی) dike.”Mehdî Karrobî, Muhammed Xatemî û Alî Akbar Mohteşemî” ji endamên wê yên giring in. Ev rêxistin doza çakkirina pirsgirêkên civakî û siyasî dike, ew jî bi dûrxistina rola tîrenan di desthilatdariyê de û piştgiriya serokwezîrê berê û berbijêrê serokatiyê di sala 2009`an de ê têkçûyî ”Mîr Husên Mûsewî”, dike. Her wiha ji vê şepêlê jî Partiya Kadroyên avakirinê ya ku Haşimî Rafsancanî dema serokkomae bû di sala 1995`an de, damezrand.

▪Rikberiya Îranî xwedî Îdyolojiyeke berevajî rêbaza” wîlayetûlfeqîh” e, alîgirên wê ji hemû gelên Îranê; ji hêzên ramyarî û nateweyî ”Azerî, Ereb, Kurd, Turkemen û Belûç” û Sune hene ku hin ji wan xwedî hêzên çekdar in û şerê rêjîma Îranê dikin. Girêngtirîn siloganên wan demokrasî, mafê çandî û rakirina pergala”wîlayetûlfeqîh” in. Hin ji wan jî doza xweserî yan jî cudakirinê ji Îranê dikin, ji aliyê xwe ve Îranê bi tundî li hember wan, radiweste.

**Siyseta Îranê**:

Ferweriya Îranê di riya şareyariya derve siyaseta xwe dişopîne û cîbicî dike, ev siyaset ji hêla van navendên ku li ser desthiladariya Îranê serdest in, tê nirxandin, hûnandin û şopandin:

1-Şûnkara serkêşiyê ”Şêwermendê bilind” : Di Komara Islamî ya Îranî de desthilatdariya herî bilind e, têgeha”Wîlayetûlfeqîh” li xwe dinimîne, li gorî zagona Îranê ragihandina şer, aştî, cîhad û ji erkkişandina serokkomar, ji erkên wê ne.

2-Serokkomar.

3-Encumena şareyaran.

4-Encumena ewlehiya neteweyî, ev jî serokkomar serkêşiya wê dike, jêdera siyseta derve ye û çavdêriya wê dike.

5-Encumena şêwirmend: Encumeneke zgonsaz û çavdêr e.

6-Encumena parastina destûrê: Erka wê biryarên Encumena şêwirmend bi rêgezên Islamî û desûeê re, guncan dike û çavdêriyê li karûbarên encumena şêwirmend dike.

7-komkara Vekolîna Berjewendiya Rejîmê : Nakokiyêyên di navbera encumena parastina destûrê û ecumena şêwirmend de, çareser dike. Hemû endamên wê ji hêla Şêwirmendê Bilind têne erkdarkirin.

8-Encumena Hosteyên (Pisporên) Rêbertiyê:
Erkên vê encumenê ev in: Erkdarkirin, jikaravêtin, diyarkirina destrewatî û çavdêriya karê rêberê şoreşa Islamî "şêwirmendê bilind" in. Ew jî ji 86 endaman pêk tê ku bi hilbijartineke gelerî û rasterastkirî û her 8 salan tê bijartin.

9-Şaryariya Derve: Her tiştên ku ji encumenên derbasbûyî derdikevin, pêk tine û dişopîne.

Şoreşa Islamî tundraw bû û hemû hêza xwe ji bo hilweşandina rijîma Şah bi kar anî. Lê xwesteka serwerî û belavkirinê weke armanca sereke, kete şûna avakirina Îraneke asa û bêalî û guhdankirina pêşketina rewşa hundirîn. Tevî ku benda 152`an ya destûra Îranê wiha nivîsiye:" Siyaseta derve ya Komara Îranê ya Islamî, bi tu awayî zordariyê ne bike û ne jî bikeve bin bandora wê, serxwebûn û yekîtiya welêt biparêze, mafên hemû Misilmanan biparêze, nede pey hêzên serdest û bi welatên derdorê re bi aştiyane têkiliyan bike, bingeh digire. "

Siyseta Îranê, piştî pergala Wîlayetûlfeqîhê; bi sê guhertinên bingehîn re derbasbû. Qonaxa yekem qonaxa avakirina dewleta nû, tevlîbûna şerê kendavê yê yekem li dijî dijmên wê yê bingehîn Sedam Huseyn û tunekirina dijberên ku berê hevalên wê bûn. Qonaxa duyem, qonaxa ku "Pasvanê Şoreşê "xwe di nava Şîiyên cîhanê de çand û belav kir. Ango qonaxa belavkirina ramana Xumeynî bi navê "belavkirina şoreşê". Armanca vê jî hebûneke Şîî li cîhanê çêkin ku Tehran navenda wê be. Ev qonax hemdema şerê kendavê yê duyem bû ya ku li hemberî dijminê wê yê sereke Sedam Huseyn bû. Qonaxa sêyem di despêka serdema 21`ê de dest pê kir ku siyaseta Îranê piştî hilwşandina rijîma Sedam Huseyn, xwe li ser herêmê gerek bike. Her wiha di 2003`an de beşdarî sazkirina Rêxistina "Hevkariya Deryaya Xezerê[31]" bû û hevbendiyên wê li hin welatiyên Ereban weke Iraq, Sûrî, Lubnan, Behrên, pêş ketin û hevpeymana navokî bi welatên mezin re, şane kir û di şerê li dijî sawkariyê de cih girt.

Di despêka sedema 21`ê de û bi bandora hin kesayetên çalakvan ên Islamîk weke Haşimî Refsencanî, Mihemed Xatemî û hwd li ser biryardayîna Îranê, diblomasiya Îranê dikarîbû biçekî têkiliyên Îranê bi cîhanê re çêke.

[31] Deryaya Xezerê: Jê re dibêjin Deryaya Qezwînê. (wergervan)

Weke: Îranê hewl da ku pirsgirêka sînorên di navbera Azirbêcan û Ermenistanê de çareser bike, Îranê piştî buyera 11` Rezberê di sala 2001`ê de destê wê bi awyekî nerasterast di rûxandina Rejîma Talîban û Sedam Huseyn de hebû û hevpeyman bi hin welatiyê ku tikiliya wê bi wan re nearam bû, çêkirin; weke vegerandina têkiliên wê bi Misrê re. Serkeftina herî balkêş bi welatiyên mezin re hevpeymana navokî (noklerî), şane kir. Vê hevpeymanê derfetek da Îranê ku wizeya(enerjî) navokî ji bo rewşên aştiyane bi kar bîne (piştî ku di destên hin weltan tenê de bû) û Îran dûrî lêdaneke leşkerî û dûrxistineke navnteweyî xist. Her wiha li dij sawkariyê ciheke giring girt û di danûstandinên civînên Cinêv û Asîtana de yên di navbera Rejêma Sûriyê û rikberiyê de ji rêjîma Sûriyê bû alîyekî misoger, her wiha roleke ramyarî û bibandor lîst.

Tevî wilo jî diblomasiya Îranê nikarîbû bi aweyeke stratejîk têkiliyên xwe bi hin welatên rojavayî û welatiyên Islamî yê Sunî çêke. Ev yek jî bi sedemên weke; belavkirina şoreşa Îranê, destwerdana Pasdarê Şoreşê di hundirên hin welatan de û derxistina tevliheviyan (ew jî bi berdanhev, lihevsorkrin û gurkirina hevrikiya tîreyî), rêgirtineke rasteqîn li pêşiya têkiliya wê bi gelek welatan re çê kir.

Mînak; biryarkujiya [32] ku Xumeynî di sala 1989`an de di derbarê nivîskarê hindî Selman Ruşdî de ê li Birîtanyayê derxist. Ew jî ji ber pirûka xwe ya bi navê " Ayetên Şetanî". Ev pirtûk bû sedem ku li Tehranê rewşên ramyarî yên tundraw gur bibin û nakokî bi Berîtanyayê re xurtir bibin, tevlî ku ev ne girêdayî mijara ewlehiya neteweyî ya Îranê ye. Her wiha Pasvanê Şoreşê hê sazkirin û piştgirya xwepêşandanên îdyolojîk ên dijî Emrîkayê dikin, mîna bûyerên ku di bîranîna destdayîna li ser balyozxaneya Emrîkayê ya ku di sala 1979`an de pêk hatinû, bîranîna roja Qudsê û hwd. Têkiliyên Îranê bi hin welatên herêmî re weke welatên Kendava Lor (Farisî), Pakistan û Azrbîcan, ne aram in. Her wiha bi gelên Iraq, Sûrî û Libnanê (ji bilî Şîa) jî ne aram in. Ji aliyê Tirkiyê ve tevlî lihevkirina wan li dij Kurdan, lê bicîkrina baregehên NATO`yê li Tirkiyê serêşiyê ji Îranê re çêdike. Ji aliyekî din ve têkiliyên Îranê bi Emrîka, Brîtanya, Israîl û hin welatên Ewrûpa pir ne nexweş in ku diblomasiya Îranê xist astengiyeke mezin û hişt ku pergala Wîlayetûlfeqîh xwe hişktir bike û dijminatiya xwe pirtir bike, li hemberî wê

32 Nexşeya partiyên Îranê 2016 https://arabiangcis. org

welatên rojavayî di serî de Emrîka dixwazin Îranê berbena (kontrol) bikin û bi Îranê re pilana dar û gêzerê bi kar bînin.

Armanca sereke ya desthilata Xumeynî ew bû ku îdyolojiya xwe ya nû li ser navê "belavkirina şoreşa Islamî" û bi behana piştgiriya bindestan bi destwerdana leşkerî ya di hundirê weltên herêmê de, belavî dervî Îranê bike. Ev tişt metirsiyeke mezin ji welatên herêmê derxist, bi taybet welatiyên ku Şîe tê de pir in, weke Behrênê. Îranê hewl da ku nakokiyan di nav van welatan de çêke, ew jî bi sorkirin û birêxistinkirina Şîiyên di van welatan de. "Elî Xaminyî" jî li ser heman rêbazê meşiya. Di dema dawî de pirojeya bi navê "Kevana Şîiyê" weke pirojeya belavkirina şoreşê; dikarîbû cihê xwe li Iraq, Libnan, Sûrî, Behrên û Yemenê çêke û di riya bikaranîna kom û çeteyên Şîî, welatên Îraq, Lubnan, Yemen û Sûriyê xiste bin destê xwe.

Van pirojeya hişt ku têkliyên Îran bi gel û welatên cîran re ne aram be. Li Afxanistanê têkiliyên wê bi tevgerên Islamî yên Sunî, komonîst û Tevgera Talban ne baş bûn, her wiha bi Pakistanê re jî, ya ku Îranê ew bi piştgiriya komên Sunî yên çekdar ên dijberî Îranê tewanbar dike, ne aram e, ji ber vê yekê Îran hewl dide ku têkiliên xwe bi Hindê re (dijmina sereke ya Bakistanê li herêm ku her du dewltine navokîne) xurt bike. Her wiha têkiliên wê bi Rejîma Sedam re jî ne aram bû, lê niha hemû hêz di bin destê wê de ne ji bilî Partiya Demokratîk a Kurdistanê PDK`ê, ya ku Tirkiyê û hin dewletên Sunî piştgirya wê dikin û têkiliyên wê bi Azirbêcanê re ne baş in, li milekî ji bi nêzîkatiya wê bi Emrîka û Israîlê re û li milekî din jî piştgiriya Azeriyên Îranê dike, têkiliyên Îranê bi cîran û dijminên xwe yê dîrokî Tirkiyê re tevî hebûna lihevkirinê li ser pirsgirêka Kurdî û aloziya Sûriyê, ne baş in. Der barê têkiliyên wê bi dewletên Kendava Lor ev têkilî digihêje asta dijminatiyeke bêsînor ku dewletên Kendavê stratejiyên xwe li ser bigeha beramber serweriya Îranê amade dike û beşeke mezin ji bodceya xwe li ser vê yekê xerç dike.

**Der barê Têkiliyên wê Bi Emrîkayê re:**

Berî ku Emrîka weke hêzekê li Rojhelata Navîn aşkere bibe, Firensa, Berîtaniya û Rûsiya Qeyserî li ser karûbarên aborî û ramyarî yên vê herêmê, serdest bûn. Ev reweşa piraniya dewletên RN; Îran jî di nava wan de, bû. Berîtaniya aboriya Îranê û bi taybet warê petrolê desteser kiribû, lê piştî

şerê duyem ê navneteweyî rewşa hêzan hete guhertin, Emrîka weke hêzeke mezin li cîhanê û RN derket holê û Emrîka desteserî warê aborî û ramyarî di nav de Îran jî, kiribû û ambargo li ser petrola Îranê danîbû, êdî aboriya Îranê kete astengiyeke mezin û rewşa wê ya ramyarî gihaşte aloziyekê mezin.

Şah Mihemed Rida Behlewî serweriya Îranê bi piştgiriya Emrîka û Berîtniyayê girt destê xwe. Ew jî di warê leşkerî û perwerdekirina Artêşa Îranê de alîkariya wê kirin, êdî Îran li RN û bi taybetî li herêma Kendavê bû hêzeke bibandor û bi navê "Asayîşa Kendavê" hate naskirin.

Di vê mijarê de Fîlosofê navneteweyî **Ebdela Ocelan** dibêje:". . . dewleta Îranê ya çend xanedan guhertin, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn mîna Komara Tirkiyê û Şahtiya Afgan di çarçoveya hesabên hegemonîk ên Ingilistanê de weke dewleteke netewe ya modern ji nû ve hat avakirin. . . "[33]. Piştî ku "Şoreşa Islamî" di sala 1979`an de li îranê bi ser ket û rêgezên wê ji hêla Xumeynî ve hate çespandin, hewl da ku serweriya Emrîka û Rojavayî li ser Îranê hilîne. Ji bo wilo hemû peymanên ku di dema Şah de hatibûn danîn, hatin pûçkirin. Ne wilo tenê jî, Îranê xwest ku serweriya Emrîkî li hemû welatên Ereban bi taybet li Iraq û Kendavê kêm bike, ew jî bikaranîna komên Şîî yên pê ve girêdayî bûn. Destpêkê Îranê ji bo ku têkliyên xwe bi welatên cîran bi taybetî di warê aborî de xurt bike, rêbaza cîranperwerî bi kar anî, lê ji ber serweriya Emrîka li van welatan hebû; nikarîbû van têkiliyan li gorî xwe bi kar bîne. Ji ber vê yekê rêbaza xwe guhert û rêbazeke din bi kar anî ku destekê bide komên Şîî û wan li dij rêjîmên desthilatdar bikar bîne, ew jî bi armanca wan rejîman hilwekşîne, weke Iraq, Yemen û gelek dewletên herêmê û hê li welatên weke Bahrên, Seûdiyê, Libnan û Sûriyê vê rêbazê bi kar tîne.

Dema ku peyrewên Xumeymî êrîşî balyozxaneya Emrîka ya li Tehranê kirin, nakokiyên di navbera Emrîka û Îranê de xurtir bûn. Di 4`ê Mijdara 1979`an de bi sedan xwendekarên Îranê êrîşê balyozxaneya Emrîkî ya li Tehranê kirin û 53 gerew ên Emrîkî[34] girtin. Ew jî ji bo şermezarkirina

[33] Menîfistoya Şaristaniya Demokratîk, Pirtûka Pêncem, Pirsgirêka Kurdî û Çareseriya Neteweeya Demokratîk (Parastina Kurdên Di Nav Qirkirina Çandî de), R (440), Ebdela Ocelan.

[34] Gereweke di nav lepê Xumeynî de – Robêrt Dirîfs û Têrî Lomark – Weşanxana "New Bincamîn Franklîn Haws".

destwerdana Emrîkî di hundirê Îranê de û ji bo Emrîka Şah radest Îraniyan bikfe. Ev alozî bi navê "Aloziya Gerewî" hat naskirin. Serokê Îranê yê berê Mehmûd Ehmedî Necat ji wan xwendekarên êrîşkar bû.

Di vê rewşa ne aram de, dema ku Îranê xwest şoreşa Şîî belav bike û Emrîka nahêle ku komareke din Şîî li herêmê li gorî "wîlayetûlfeqîh", çêbibe; Emrîka dijminatiya Iraq û Îranê ji xwe re bi kar anî û di şerê Kendavê yê yekem de ji bo ku şoreşa Îranê têk bibe; bi riya hevkarên xwe alîkariya leşkerî û aborî da rejîma Iraq. Ji ber vê yekê, tevî ku Îranê ji bo hilweşndina rejîma Sedam Hisên, şerê Kendavê yê duyemîn erê kir, lê tu nêzîkatî di navbera wan de çênebû. Her wiha ji ber destekdayîna Îranê ji hêzên dijberî hevkariyên Emrîkayê li herêmê, metirsiyên Îranê li ser Israîl û berjeyendiyên dewleteyên Rojavayî û pêkanîna siyasetekê li dij siyaseta Emrîka bi taybet pirsgirêka navokî ya Îranê, hê di navber wan de ne aramî serwer e. Di dema Corc Buş yê biçûk û Donald Trump, ev nearamî xurtir bû, lê di dema Obama de hinkî sivik bû ku bi Îranê re peymana navokî şanekir, tevî ku berdewamiya sizekirinên Emrîkî li ser Îranê man. Ji hêla xwe ve Îranê her dem bawer dike ku Emrîka her dem  hewl dide ku rijîma Îranê hilwşêne û desteser bike û vegerîne weke dema Şah û di herêmê de piştgiriya dijminên Îranê dike.

**Doseyaya Îranê ya Navokî:**

Dosya Îranê ya navokî deriyeke berfireh ji têkiliyên Îranê bi hêzên navneteweyî re vekir û ambargoya ku ji hêla glek welatan ve li ser hatibû danîn, şkand. Her wiha di riya wê re Îranê gelek sizayên ku li ser hatibûn birîn, rakir. Di vî alî de diblomasiya Îranê bi taybet ji hêla Şepêla Vesaazîparêz ve di dema "Mihemed Xatemî" û "Hesen Rohanî" roleke xurt lîst.

Ji dema şah ve Îranê dixwest wizeya navokî bi kar bîne û di sala 1967`an de ji Emrîka vejengeheke (reaktor) biçûk a navokî yê lêkolînê bi dest xist û her dem ji hêla Saziya Navneteweyî ya Wizeya Navokî dihat pişkinîn[35] û di şerê Kendavê yê yekem de ji hêla hêzên Iraqê ve hate bombebarankirin. Şerên Kendavê yên yekem û duyem hişt ku Îran pirojeya xwe ya navokî careke din nû bike û di sala 2002`an de ji hêla "Rêxistina Mucahidî Xekq" ve

[35] Hêz û derfetên leşkerî ya cîhana Islamî – Serhen Dr. Zekeriya Hisên.

hate eşkerekirin. Vê yekê hişt ku welatên navneteweyî xwe bikin yek ji bo Îranê pirojeya xwe ya navokî têxin bin çavdêriya Saziya Navneteweyî ya Wizeya Navokî û pirkirin û pîtandina yoranyomê rawestînin. Ew jî ji ber metirsî heye ku Îran dikaribe bombeke navokî peyda bike û metirsiyê li ser berjewendiyên Emrîka, Israîl, rejîmên Sunî û hêzên çep li herêmê çêke.

Ji ber vê yekê li ser qada navneteweyî bû dosiya herî giring û Encumena Ewlehiyê ya Navneteweyî sizayanê aborî yên mezin li ser Îranê bar kirin. Êdî Îran keteqirîzeke aborî, lê piştî ku Hesen Rohanî bû serokê Îranê, ji bo têkiliyan bi welatên cîhanê re xweş bike, rêbazeke nerm bi kar anî û hevdîtinên dijwar di navbera Şaryarê Derve yê Îranê Mihemed Cewad Zerîf û Şaryarê Derve yê Emrîka Con Kêrî di ferweriya Obama de bi rêve çû, ew jî bi çavdêriya Elmanya, Brîtanya, Çîn, Rûsya, Ferensa (Koma 5 + 1) û Yekîtiya Ewrûpa li Bjarê Lozanê ya Swîsre pêk hatin. Di encama vê hevdîtinan de Peymana Navokî ya Lozanê pêk hat û Îranê çalakiyên xwe yên navokî rawestandin. Ev peyman bi çavdêriya Saziya Navneteweyî ya Wizeya Navokî di meha Çile ya di 2016`an de pêk hat. Hêjayî gotinê ku di peymanê de protokoleke pêvek heye dibêje ku piştî 24 rojan ji erêkirina piraniyên ku peyman şane kirine, çavdêr dikarin derbasî her cihî bibin navendên leşkerî jî tê de. Bi vê peymanê sizayên ku bi sedma pêşxistina wizeya navokî li ser Îranê hatibûn barkirin, hatin hilanîn. Li gorî saloxgeriyên Emrîkayê, berî vê peymanê, Îranê bûjenên navokî peydakiribû ku dikarîbû di kêmî 3 mehan de çekeke navokî çêke, lê peymana navokî ew pûç kir[36]. Peymanê hişt ku Îranê pirojeya xwe ya navokî ya bikaranînên aştiyane weke bazirganî, tenduristî û pîşesazî bidomîne û li gorî pîvanên navneteweyî yên ji bo belavkirina çekên navokî bi sînor bike. Her wiha pirojeya Îran a rokêtên palistî, binpêkirina mafên mirovan û piştgiriya rêxistinên Şîî yên çekdar, nakeve nav peymanê de. Tevî wilo bi vê peymanê Îran aloziya aborî derbas nekir.

[36] Xalên giring ên hevpeymana navokî ya Îranî çi ne? . http://www. dw. com